# *Melayê Cizirî*

*Abdusamet Yîgît*

*Weşanên Han*

.
.
.
.

*Melayê cizîrî*

Weşanên SORAN e
.
1.Tîrmeha 2013
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan
HAN GRAFIK Verlag&Werbeagentur
Cranachstr. 62 – 12157 Berlin
Tel:0049(0)30 47 9870 52-53
Fax.0049(0)30 47 987054
.
ISBN 978-3-940997-34-6

Ku mirov bahse botanê bike, wê navê Melayê Cizîrî were bîra me. Lê ku mirov bahse Melayê Cizîrî kir jî, navê Kurdistanê tê bîra me. Ev hersê nav, weke ku hevdû bi hevdû dihênin ser ziman.

Lê ku em bahse Meleyê Cizîrî bike, divê ku mirov hinekî dîn jî pêde herê û bi têgihiştineka mazin bahse wî û navê wî bike. Li herêma botanê, kurdekî û ankû mirovekî ku navê Melayê Cizîrî ne bihîstî, weke ku heya wî ji dûnyê tûnayê jî tê dîtin. Melayê Cizîrî, keseyeteka ku keseyetîya wî bûya malê civate wî ya. Ji ber vê yekê, li vir, di serî de divê ku em bibêjin ku dema ku em hewl bidin ku Melayê Cizîrî fahm bikin, em hinekî hewl didin ku keseyetîya civate kurd ya dîrokî fahm bikin.

Ku mirov bahse dîrokê kir, wê pirr tişt û serborîyên ku mirov dikarê wan kifş bike û bêne ser ziman, wê hebin. Mirov wê. wan kifş bike. Melayê Cizîrî, yek ji wan kifşên me yên bi civate kurd re ya ku bi dîroka wê re. Dîroka civatekê, temenê wê jî ya. Dema ku em bahse mirovekî û temenê wî yê ku jîyayî bike jî, mirov bahse dîroka wî dike. Her wusa, divê ku mirov kifş bike û bibêje ku dema ku mirov bahse civatekê jî kir, her wusa bi dîroka wê re, weke ku mirov bahse mirovekî bi dîroka wê re bike, mirov bahse wê dike.

Dîrok, her timî, di dema xwe ya dawiyê ya ku dijî de, xwe bi hevgirtin(sentez)ekê dide ser ziman. Dema ku em li zimanê Melayê Cizîrî jî diner in, em weke ku hevgirtineka dîrokî bi dîroka civate wî re dibînin. Yekî, weke Melayê Cizîrî, bi hergotina wî re ku hinekî jî dîroka wî newê ser ziman, ji xwe nabê.

Melayê Cizîrî, ku em bahse dema wî bikin, di serî de, divê ku me hinekî pêşî, weke hevgirtinekê bitêgihiştinî divê ku em bahse wê dema wî bi wî re jî bikin. Di dema wî de, gelek zaneyên civatê ên mazin ên weke Mela Hisêne bateyî, Şêx Samedê Nacî(nêrîncî) û hwd jî ku dijîn, divê ku mirov bahse wan jî bike. Berî Melayê Cizîrî û dema wî, wê alimên weke Êlî Herîrî û ankû Elîyê Terîmaxî û hwd jî, wê hebin. Şêz Mihemedê Xuzilî, Şêx teymiyê Herranî, Mela Ahmedê Zivingî ku Feqiyê Teyran jî ew di jîyane xwe de dîtîya û jê pirr tişt fêrbûya jî, wê werin. Ev di dema Melayê Cizîrî de bûna. Lê Mirovên weke Şêx teymiyê Herranî jî berî wî bûna. Hizirna mazin, wan jî bi nivîskî li şûn xwe hiştina.

Lê melayê Cizîrî, hevgirtineka mazin bi zanî û zanebûnî bi xwe re da çê kirin ji hemûyan û dîrokê. Melayê Cizîrî, wilqasî xwe bizanebûna kirina wê sedema wê çi bû? Bi demê re, bêgûman wateyeka wê hebû. Ji ber vê yekê, pêwîsta ku em bi dema wî re û bi ast û rada pêşketina wê re

li Melayê Cizîrî binerin. Di vê temenê de, ku em lê ne nerin û hewl nedin fahm bikin, emê wî melayê Cizîrî ku ser 43´ê berheman û bi sadan helbest û ankû qasîda ku nivîsand jî, baş fahm nekin.

Yê min, dema ku em lê dihizirim bi mejiyê xwe û her gotina mazin û ya rast ku bo wî ku hewl bidin ku bi wê wî bênina ser ziman, ku ez dîbînim û ku piştre bi wê gotinê ku mîn wî hanî ser ziman bi wê gotinê û piştre ku ez li gotina xwe vegerîyam ku wê bixwênim, ez bixwe jî, wê gotina xwe wusa hîs dikim ku kêm dimêne ku wî bi tememî wî dihêne ser ziman. Ev hêst, temenê wê jî, awayê hizirkirin û hizrên melayê Cizirî ku em dixwênin û hizrên ku bi me re dide çêkirin wê hêsta kêmbûnê li ser gotinan re bi me re dide afirandin.

Melayê Cizîrî, zaneyekî civate xwe ê ku wî asta dema xwe bi têgihiştin û asta xwe ya ku wî bixwe hanî ser ziman re buhurandîya. Wî, demeka ku weke dema "ronasans"a rojava ku di wê demê de destpêka wê bû û piştre hin bi hin pêşket, di nava civate xwe jînkir û da jînkirin. Ya wî, dema ku em bahse wî bikin û jîyangerî û serborîya wî re, di serî de divê ku mirov bahse vê yekê bi wî re di serî de bike.

Melayê Cizîrî, li vir, hinekî jî, mazinatiya xwe bi hizirkirina xwe re dide dîyar kirin. Wî dîroka xwe xwe ya civatî bi hemû nirxên wî re fahm kiriya û hewldaye ku wan şîrove bike û bêne ser ziman. Her wusa, hemû rewşên jîyanî ku di wê demê de civat di nava xwe de dijî û ku destpêka wan gelek û gelekî berî wê demê bûya jî, wan jî dibîne û şîrove û wan dihêne ser ziman. Minaq û mijara herî li berçav bi gotina "newrozê" re bi wî re dihê dîtin û kifşkirin. Li vir, berî hertiştî divê ku mirov wê bi wî re bêne ser ziman. Weke nirxeka pîroz, Melayê Cizîrî jî, Newrozî dîtîya û base çejnatîya wê kirîya. Ev gotinên Melayê Cizîrî, wê newrozê, bi me ji devê wî û dema wî pirr baştir û xweşiktir bidina fahm kirin. *"Ev narê Sîqala dil e", "Da´îm li wê qala dil e", "Newroz û sersale dil e", "Weqtê hilêtim ew sîrac .." a.* Melayê Cizîrî, ev gotinên wî, hinekî jî evîna dil bi têgihiştinî û jîyanî dihênin ser ziman. Di wê demê de, tiştek û ankû cejneka ku civat dijî û di wê xwe de dixamilêne û hevdû bibîr dike, wî bahse wê kirîya. Ya ku bîrdike dil a. Ya ku bibîr dike jî dil a. Ya ku li bîr dike jî her wusa dil a.

Dil, weke derîyekê dîtinê ya. Dil, dinirxêne. Aqil jî, dîbîne. Bi dîtina aqil û bi nirxandina dil, wî gotinên xwe li hevdû badana û hunandina. Dema ku mirov bi çavê dil nerî û nirxand, hingî jî, divê ku mirov bizanibê ku di temenê wê de aqilek heya. Ew aqil jî, dibîne, fahm dike, têdigihijê û bi wê re êdî dinirxêne. Ev weke pêvajoyna pêşketina bi

nirxandinê û ankû dil in.

Hêst û raman, raman û hiş, hiş û jîyan, hevdû di hevdû de bi têgihiştin dikin û bi hevdû re dihênin ser ziman. Li ser wê û bi dîtina bi aqil a wê re jî, êdî hin bi hin têgihiştina bi aqil pêş dikeve. Li vir, ya ku em bi gotina "dil" ya melayê Cizîrî re kifş dikin jî ev a.

Melayê Cizîrî, gotina wî ya dil, di temenê xwe de hiş û hişmendiyê diparêzê. ´Zehre´ya Cizîrî, di dilberîya Feqiyê teyran de wê de bi hêstîyaîya bi aqilî ya Feqiyê teyran re xwe bide li rû. Her wusa, wê di wê hêsta pîroz ya bi ´mem û Zînê´ ya Ahmedê Xanî de jî xwe bêne ser ziman. Lê ´Zehreya Cizîrî´, heta ku em wê di temenê têgihiştinê de û bi têgihiştina wî bixwe re fahm nekin, wê aliyekî fahm kirina me ya bi wan ê piştre jî jî wê kêm bimêne. Ew bandûra ku bi serborîya mem û Zînê re ku li ser şêx Ahmedê Xanî bû, wê di dema xwe de li ser Melayê Cizîrî jî bibe. Ev gotinên melayê Cizîrî wê pirr baş dihênin ser ziman. *"mûyekê ez ji te nadim bi duşed Zîn û Şîrînan", "Çi dibît ger tu hesêb kî mî bi Ferhad û Memê"*. Asta têgihiştina xwe ya bi bawerî, her wusa bi wê mazinatîya ku bi wan di serê xwe de afirandîya dihêne ser ziman. Mem û Zîn, bi Melayyê Cizîrî re, weke astaka têgihiştinî ya. Ew ast û rada, bi bûya pîvan û têgihiştin. Ew pîvan jî bilind a. Li gorî wê, êdî asta xwe ya têgihiştin û bawerî dixwezê ku bêne ser ziman. Dema ku bi wê mînaqê dihêne ser ziman û ku mem û Zînê, navê wan weke pîvan di wê hevoka xwe ya pêşî de bicih dike, her wusa, êdî piştre wê asta xwe ya piştre ya mazin bi wê pîvan û astê dihêne ser ziman.

Di vê temenê de, ku em dihizir in, em di serî de, astaka mazin dibînin. Ew ast, bi têgihiştin û hiziratî(felsefe) wê re dihê ser ziman. Ku dema ku em bahse wê astê dikin, em ji wê re ji devê Cizîrî, navê mem û Zînê weke ast û pîvan dibînin. Pîrozkirin, bi jîyanê û têgihiştinîya wê re ku mirov biwî re kifş dike, êdî mirov bi awayekî rast û baştir, êdî wê rastîyê dibînêt û fahm dike.

Çi ji dil ku bi kul a, hêsteka mazin a ji wir a, afirîya ku têgihiştîya. Rastîya bizanî heya. Di wê de gotina mazin bi fahm heya. Dîtineka ku bi wê heya, ji wê bûya aqil û fahm a ku ji jîyanê ya. Nerîneka ku di bin de aqil merşa, nirxaka ku dimeşê li ser wê heta ku digihijê arşa.Lê ku ez biçi gotinê bibêjim, dîsa kêm dimênêt ku ew mazinatî bi gotinê were dîtinê ji me yê dilxweş re.

Gotin ku dihêne ser ziman, bi xwe re dide fahm kirin. Her gotin, weke ku Melayê Cizîrî dihêje û dide fahm kirin ku divê ku mirov bi wate wê re fahm bike. Piştre jî, bi wê re êdî divê ku mirov zanibê ku mirov wê

êdî ku wê gotinêi kûderê û çawa û biçi bikar bêne ser ziman. Hîyererşîya wate di hundurê gotinê de ji xwe re dike pêpelok û li ser dimeşêt, hinekî jî li vir, bi Melayê Cizîrî re, mirov wê pirr baş û qanc fahm dike. Melayê Cizîrî, li vir, bêhtirî, bi têgihiştinî dixwezê ku bi me bide fahm kirin. Ya ku mirov li vir hewl bide ku ji wê fahm bike, di serî de ev a.

Ji ber çi wî, bi berhemên xwe re kir ku bike helbestî jî? Ji ber ku wî dixwest ku bi mirov bide fahm kirin. Hewldanaka wî ya giring ku wî jî pirr giringî didayê de ev bû. Bi vê re, êdî wî xwe dihanî ser ziman. her têgihiştina ku wî di xwe de kifş dikir, wî bi zimanê civate xwe bigotin dikir û dide fahm dikir. Melayê Cizîrî ew baxewerîya civate xwe ya. Bi wê re jî, ji ber ku wî baxtewerîya civatîya xwe xwestîya. Li ser wê re, ya rast xwestîya ku bi wan bide fahm kirin. Li ser wê re, hizra xwe hanîya ser ziman. Hizra wî, di asta xwe ya têgihiştinî de mazin dihê ser ziman.

Wî, di dema xwe de, herêm bi herêm gerîya, Emê piştre werina ser wan ger û geştên wî. Emê wan jî bibînin. Lê li vir, bi gotinekê jî di temenê têgihiştina wî de bi gotinekê divê ku em bênina ser ziman. Ew jî, her wusa, ji ber ku ew bi başî û qancî were fahm kirin. Bi vê re, wê ew aliyê wê yê ku wî di wê temenê de û bi wê re di xwest ku mirov bide perwerde kirin, emê kifş bikin. Bi wê re jî, emê kifş bikin ku wî çawa giringî daye perwerdekirinê û bi wê re fahm kirinê ku mirov bi xwe re divê bike.

Jîyan, ku em bahse demên wê yên buhurî bikin, emê bi gotina dîrokê re bênina ser ziman. Lê ku em bahse roja me ya ku em têde dijîn jî bikin, emê bi gotina ´dema me ´ û ankû roja me re bênina ser ziman. Ev jî em dikarin jê re bibêjin ku nûroja me. Nûroja me, çawa dihê jîyîn, bi wê re û bi wê re çendî me di xwe de têgihiştin bi demîya wê re bi xwe re afirand, emê êdî bi wê re li sibaroja xwe jî biner in.

Dîrok, î ro û sibaroja me, li dûvhevdû bi pêş de diçin. Her wusa, bi wê re, hertimî, di temenê dîmenkirina nû de, wê hertimî li gorî demê têgihiştin bi wê re biafirê û pêşbikeve. Dîrok û î ro, bi hevdû re, xwe di afirandina wê dema ku bi gotina ´î ro´ re dihê ser ziman re bi wate dike di wê demê de. Li ser wê re, û bi wê afirandinê re, em li pêşaroja xwe jî diner in. Hinekî jî, bi gotina xwe re ya têgihiştinî û perwerdekirina xwe re Melayê Cizîrî, vê yekê bi me dide fahm kirin.

Ez, divê ku vê jî bibêjim, ku melayê Cizîrî, bi xwe re û bi dîroka xwe ya civate xwe re pirr bi têgihiştin bû. Wî serborî û dîroka dema berê, wî pirr baş zanîya. Li ser wê re, wî hanîya ser ziman. Bi wê re jî, wî kiriya ku bêne ser ziman.

Di nava civate kurd de, kurdekî ku destana ´Rûstemê Zal´ nizanibê tûna ya. Ji yekî piçûk bigra û heta ku digihijê yekî mazin. Ev yek û zanîn, weke nirxeka civatî jî dihê dîtîn û zanîn. Melayê Cizîrî ev yek dizanî. Li ser wê re jî, xwestîya ku ew hizrên xwe bêne ser ziman. Lê tiştekî pirr baş, em bi zimanê wî re baş fahm dikin. Ew jî, ew a ku dema ku wî hewldane ku bêne ser ziman û bide fahm kirin, gotinên di serê mirovên dinava xalkê de, kifşkirina û bi wan re hanîya ser ziman. Bi wê re jî, xwestîya ku baştir bide fahm kirin.

Em dikarin, çend gotinên ku wî di helbestên xwe de hanîna ser ziman li vir, bênina ser ziman. "... Rûstem(rûstemê zal) û Efrasîyab", " Min dest da Zu l-fîqar û duldul e", "Setwata Leyla yeqîn Mecnûn tepand", "Ma te ´umrê xudr û nûh û mulkê zu l-qerneyn", û hwd. Ev gotin, ji wan gotinên ku me naqandin in. Herkesekê ku destana rûstemê zal dizanî, ev rastî hemû jî dizanîn. Wateyaka van gotina ya ku pirr qayîm di serê her kurdî de heya. Bi teybetî, divê ku em bibêjim ku di gotina dawî de bêjeya "zulqerneyn" gotinaka ku bingihîn ku di serî de herkesekî de ji tişta ku bi îbretî bahse wê were kirin jê re tê bikarhanîn. Di hundurê gotina ´zulqerneyn´ de, gotina "qern" weke nefşekî buhurtî ya. Lê dema ku ev gotina ´qerne´ hat biharhanîn, hingî, bahse tiştekî ku jê îbret were girtin bahse wê dihê kirin. Kurdan, berê dema ku îskenderê Mekedonî hatibû kurdistanî û ku dema ku bi hezaran jii wan kuşt û welatê wan gileh(telan) kir, êdî jê re gotin ´zulqerneyn´ bikarhanîn û gotin "îskenderê zulqerneyn." Yê ku pêşî ev gotin bikarhanîna jî kurd in. Di çi awayê de gotina "qern" tê bikarhanîn`.? Ew qernê ku jê îbret were girtin, ji wê re tê bikarhanîn. Bi wê re jî, wê dihêne ser ziman.

Gotina dûyemin ya ku me hilbijart ya bi navê "... Rûstem(rûstemê zal) û Efrasîyab", gotinaka bi heman rengî ya. Mazinatîya Rûstemê Zal, bi şer û qûdreta wî re tê zanîn. Dema ku bahse rûstemê zal hat kirin, wê gotin, "bi mêranîya xwe weke rûstemê zal ba!" Ev gotin, weke gotina ku hertimî li ser devê xalkê ya. Yekî ku wê nizanê tûna ya. Lê Dema ku em bahse mêrenîya rûstemê zal bikin û bipirsin ku ka wî mêrenîya xwe li dijî çi û kê daye nîşandin, hingî emê navê "efrasîyab" bibîr bikin. Ji ber ku ti kurdê û ankû mirovê ku destena rûstemê zal zanibê û ankû bihîstibê, wê vê navê ´efrasîyab´ jî bibîhîzê, ji ber ku di hundurê wê destenê de ya. Di dema Rûstemê Zal de jîya ya. Di dema rûstemê zal de, rûstemê zal li dijî gelek keyan şer kir. Keyê Tûra jî efrasîyab bû û bi sihir û ankû efsûnên xwe yên xirab û neqanc re dihat zanîn. Rûstemê zal, diçe bi ser wî re û wî û wan sihrên wî yên xirab têk dibe. Ev jî, wê bi wê serkevtina Rûstemê

Zal re, wê di dema wî de bi navê wî û ji wî re bibe nav û deng û wê navê wî derkeve.

Yekî ku li civatekê ku rûnistiba û ji wê civate ev serborîya rûstemê zal û ankû ya Şahmaran ku ne bihîstiba û rabûba nebû. Ev, hertimî, vebêjinên civatî ên ku dihatina vegotin bûn. Di civate Mîrê Bota de bê û ankû di civate melayê Cizîrî de bê, ev dihatina vebêjin û li ser wan dihat axiftin. Piştî ku li ser wan dihat axiftin, wê piştre jî, êdî di hundurê wê vebêjinê de, ´ya qanc´ û ´ya xirab´ bi axiftinê jî bihata gotin. Ji xwe, ev vebêjîn hemû jî, bo ku mirov ya qanc çiya û ya xirab çiya fahm bike û û ji hevdû vaqatêne dihatina vegotin di civatan de.

Destana rûstemê zal, di dema gûtîyan û ankû dema hûrîyan de buhurtîya. Yanî, pirr kevna. Berî zayîna Îsa, wê bi du û ankû sê hezar salî ev werina jîn kirin.

Melayê Cizîrî, ev dîrokên demên berê, bi dîroka olê ya wan demên berê û ya dema xwe bixwe jî pirr rewakiriya û ji mirovan re hewldaye ku werêne ser ziman. Gotinên weke "ehrîmen", û hwd jî, ku di dema Medîya de weke navê birayê Aûra Mazda û bi xirabî tê zanîn jî têna ser ziman. Ahûra Mazda, qanciyî û Ehrîman Xirabîyê nimînêr dike. Bavê herdûyan jî Zerwan bûya. Wate Zerwan, fezeya giştî ku bêserûbin û bînî ya. Her wusa, di hundurê wê fezeyê û ankû dunya me de jî, ya qanc û xiran jevcûda xate wan hatîya xizkirin. Bi vî rengî nimînêrên wan xatan bi cudahî hatina afirandina weke ku li ser Ehrîmen re xirabî û li ser Ahûra Mazda re Qancî hatîya salixkirin.

Melayê Cizîrî, ev têgihiştinên demên berê ku weke kevneşopî jî di wê demê de di mejiyê mirov de hena, dîtîna û xwestîya ku hem wan di wê demê de ji nû ve salix bike û bi wate bike bi wate wan, û her wusa bi wê re jî xwestîya ku li ser wan re jî têgihiştina xwe bêne ser ziman û bi awayekî baş bide bitêgihiştin kirin. Ya ku di serî de, li vir, em bi melayê Cizîrî re fahm dikin ev a.

Melayê Cizîrî, wî, dîroka civate, dîroka herêmê û hemû xatên têgihiştin û hizrî ên bi dîromkê re jî fahm kirina û hewldaye ku wan bêne ser ziman. Bi wê re jî, wê xwestîya ku dîrokê bi mirov bi awayekî rast û baş bide fahm kirin. Melayê Cizîrî, têgihiştinîya wî ya dîrokî, her wusa, mirov dibîne û fahm dike ku li ser jîyanê re ku bêî ku qûtbûn û qatbûn bê xistin li navê û ku bi hev ve girêdayî li dûv hevdû ku werina ser ziman, wê xwestîya ku werêne ser ziman. Bi vî rengî, di wê temenê de jî, giringiyeka wî ya ku wî bi wê têgihiştina xwe ya têgihiştinî û dîrokî re ku daye civaknasiya civatî heya ku mirov bi hesanî ji wî û têgihiştina wî û

awayê hizirkirina wî fahm dike.

Melayê Cizîrî, ku em bahse wî hizirkirina wî bikin, di serî de divê ku em bahse wê têgihiştina wî ya zelal bikin ku di serê wî de. Wî hertimî xwestîya ku rastiy bibaşî bêne ser ziman. Di nava zanînê de, wî di serê xwe de, heta ku karîya ku herê di serê xwe de bi zanebûna xwe re kûr û dûr çûya. Ev jî, wî di dema xwe de, bi perwerdekirina xwe re buhurandîya. Wî, ne tenê ji deverkê û memosteyekî perwerdeya xwe hilda ya. Her wusa, wî ji gelek mirov û zaneyan û li gelek herêman zanîna xwe hildaya û xwe bi wê mazin kirîya. ..

---- ----

Piştî ku mirov mirov hinekî li ser têgihiştinê re nerî, mirov êdî dikarê hin bi hin bahse jîyanê bi wê re bike. Lê ew fahmkiriina pêşî ya bi têgihiştînî, wê êdî temenê hanîna me ya bi jîyanê re werêne ser ziman. Mirovekî ku weke melayê Cizîrî, di serî de divê ku mirov bibêje ku dema ku mirov bahse jîyane wî bike, divê ku mirov bi wê jîyane wî re dema wî bi ast û rada têgihiştin û pêşketina wê re jî bêne ser ziman, heta ku ew beş û bi rastî were fahm kirin.

Ew roja Cizirî dijî, hê ku navê Melayê Cizîrî ne hildayî, di wê dema xwe ya piçûkatîya xwe de, hê hîngî, bale mirovan çûbû bû bi ser wî de. Gotinaka ku bi gotinî di nava xalkê de dihat gotin û bi teybetî jî kurdan jî di nava xwe de bikarhanî hebû. Ew jî, ew bû ku weke gotinaka civatî ku digotin ku "mirov di hêka xwe de kifş a." Ev gotin, wate wê ew bû ku dema ku bahse yekî dihat kirin, li ser wî wê jîr û jîrewerîya wî re ku dihat ser ziman, li rewş û gavavêtina wî dihat lê nerîn û li gorî wê gotin ji wî re dihat gotin. Mirov, di dema ku piçûkatîya xwe de, çendî ku jîr a? Divê ku mirov bibêje ku mirovekî ku hê zaroya, mirov dikarê bibêje ku mejiyê wî ji yê yekî mazin bêhtir û zêdetirî di tevgerî û karkirinê de ya. Yanî, zêdetir û bêhtir dikarê bi aferîndêrîyeka mazin dikar fahm bike. Her fahmkirina di piçûkatiyê de, bi aferîndêrîya mirov dibêt. Lê mirov nikarê heman tiştî bo yekî mazin bibêjêt. Ji ber ku yê mazin, li ser dîtin, û biwê dîtinê re fahmkirin, têgihiştin û hwd re fahm dike. Yanî fêr û cerb temenê yê mazin a. Lê yê piçûk, mirov nikarê wê, bi tememî ji bo wî bibêje.

Melayê Cizîrî, bi navê wî yê ji dê û bavê ku Mihemed, weke mirovekî ku jîr û pirr biaqil hê ku di piçûkatîya xwe bale mirovên li dora dikişêne û dide li ser xwe. bi teybetî, Hê ku di piçûkatîya xwe de, wî bidest xwendinê kiriya. Piştre jî, êdî zû pêde çûya. Sînore yekî ku bidest xwandinê kiriba, li gorî fahma wî bû. Lê ew sînor dernediket ser heftsalîya mirov re. her mirovî, ku jin jî ba û mêr jî ba, heta ku hatiba

heftsalîya xwe, wê êdî bidest xwandina xwe kiriba. Lê zaroyên ku jîr ba, berî wê dema jîyane xwe bidest xwandinê dikir.

Di nava kurdan de, weke kevneşopîyekê, hertimî, ku keç jî bê û kûr jî bê, wê di piçûkatîya xwe, pêşî ji dê û bavê xwe bidest hildane zanînê bike. Bi wê re jî, êdî bi wê re wê dê û bavê wî fahmkirin ku ew hatîya dema xwandina xwe û êdî wê ew bê şandin li cem mamosta û ankû seyda.

Dema ku em bahse rewşa Mihemed bikin jî, divê ku em heman tiştî bo wî bi vî rengî ji bo destpêka wî bênina ser ziman. Wî jî, pêşî ji bavê xwe fêra xwe ya pêşî girtîya. Bavê wî, yekî ku xwanda bû û bi dehan salên xwe ku dabûbûna xwandinê jî bû. Bi wê re jî, divê ku em vê jî bibêjin ku mriovên weke bavê wî, ku li kûderê jî ban, wê hertimî, zarokna ku xwe di piçûkatîya xwe de digihandina cem wan û hin fêr ji wan digirtin bûn. Ev yek jî, weke kevneşopîyeka civatî ya ku nebê nedibû bû. Malbava Mihemed, malbateka ku digihişt male mîr bixwe jî. Bi teybetî ji aliyê dayika xwe ve, ev pirr baş li pêştir bû. Lê ji aliyê bav ve jî aşîr bûn û ji aşîra botîyan û ankû bohtîyan bûn. Ji wanotkî jî dihat gotin. Pirranîyan cengê aşîrê li dora Cîzîrê ku ne dûrî çemê Diclê disekinîn bû. Li wir, mal û zevî û gûndên wan pirr hebûn.

Mihemed jî, her wusa, malbate wî yeka wusa bû. Li herêmê, bi teybetî ku yekî bahse Cîzîra botan bikira, wê pêşî tişta ku bihata aqilê wî û bigota, ew bû ku ew cihên xwandinê û pirtûkxaneyên ku li lê bûn. Navê Cîzîra bota, bi vê yekê û rengê mazin bû. Navê Cîzîra bota di wê dema ku Mihemed de jî, bi navê "botanê" pirr dihat nasîn. Lê ku di dema ku dihat gotin botanê, herêmeka ku ji ber diclê ku bahse wê dihatkirin ku heta ku digihişt ber Kobanê, Qamişloka rengî û hwd. Di wê demê de jî, weke ku Mihemed bixwe jî dizanî û di serê wî de hebû û digot "îreme botanê" ew ji wê bû. Îreme botanê´, navê herêmeka mazin û her wusa, ku bi pêşketinekê ew ew dihanî ser ziman. Minaq, weke ku çawa ku tê gotin "gûlîstana xweşik" "baxê gûlan" û hwd, navê botanê jç, bi vê rengê bi xweşik ku di çîrokan de dihat gotin, dihat gotin ku "îreme botanê. Di çîrokên keçelok de ev yek pirr hatîya gotin. Çîrokên keçelok, dema ku bahse wan bike, divê ku em bi teybet bikin xat bikin û bahse wan bikin. Her zaroyê kurd, di wan şevên reş û tarî de, ku êdî çav hevdû ne didît, wê êdî di bin rohniya cireyê de zaro li dora dê û bav lev bicivin û ew jî, heta wê çaxê razana, wê ji wan bahse bike û çîrokên keçelok bibêje. Wê her guhdar, di dema ku li çîrokê hisand, wê carna di serê xwe de bibe, keçelok û şervanek, carna ku keçelok û xizanek ku ti tişt dimale wan de

tûneyî, carna weke rûstemê zal wê gurz di destê wî de hebe û weke ku di çîroka rûstemê zal de dihat gotin "ku wî ew gurzê xwe li çîya dixist çîya di hajijî." Bi wî rengî, dagerê mêrenîyê ew bû di serê her zaroyî de. Her zaro, di dema ku wê şevê bi çîrokê re razaha û kev xewnê de, wê wê êdî roja dî ku rabû ser xwe, wê êdî bûyîna şevê bi ta bikişêne ku bibe şev û çîrovekê guhdar bike. Ew cîhane çîrokan a biefsûn ku dema ku mirov ji tiştekî re digot ku "bibe!" û dêî ku dibû, wê xewn û xiyalê zarokan bixamilêne.

Ew çîrok, wê temenê pirs pirsîna zaroyan bê. Piştî ku roja din zaro rabû, wê pirs li ser pirsê di serî wan de hebin û ew jî wê wan pirsan an dê ankû bav hildina hemberê xwe û bidest pirsîna li wan bikin û heta ku wan bixzîkî bikin bi pirsînê. Li ber wan pirs pirsîna, gotinaka ku pirr bi nav û deng hebû ku di dihat gotin. Hertimî dê, karê wê pirr hebû û bi karê xwe dibazî ku bike. Vêca, bi wê re dema ku rastî wilqasî pirs pirsînê, êdî digot "te rihê min stand, dê ka min hinekî rehet berda ku ez karê xwe bikim." Lê ev jî ne dibû sedem ku ew bela xwe ji dayika xwe vekin.

Kare zaroka jî, carna lîstik, carna jî, ji mereqa xwe pir pirsîn bû. Lê ew pirs pirsîn jî, nekû bala ti kesekî ne dikişand. Bal dikişand. Lê car bi car, wan jî, yanî dê û bav û ankû hinek din ku li wan dihisandin, deng ne dikirin û li wan dinerin ku ka ew çawa dipirsin û li ser çi têgihiştinê û fahmkirnê dipirsin. Bi wê re, fahmkirina wan û ankû jîra wan jî dihat pîvandin.

Mihemed, yekî wusa ku pirr pirr dipirsî bû di piçûkatîya xwe de. Bi wê re, wî jî, bala bavê xwe pirr kişandibû. Ji ber wê yekê, êdî car bi car, gelek mirovên ku li dîwane bavê wî di rûniştin, ji wî re bo Mihemed digotin ku "ew kurê te, wê alimekî mazin ê bizane wê jê derkeve."

Mihemed, hê ku di piçûkatîya xwe de di wê temenê xwe yê piçûk de, wê balê dikioşêne. Hê ku piçûka, wê pêşî, bidest xwandinê bike. Di demek pirr kin de, wê fêrî nasîn û xwandina tîpan û kîtakirinê bike.

Dem ku hinekî têve diçê û ku ew jî hinekî mazin dibe. Ev sal, li dora salên 1578´an û hwd bûn. Di van salan de, mihemed, hê 6 û yan jî 7 salî bû. Di van salan de, wê hin bi hin êdî bidest xwandina xwe bike. Bavê wî, li berdestê wî gelek mirovên ku dixwandin jî hebûn.

De ne, divê ku em bibêjin ku bavê wî şêxekî ku mazin bû. Bi wê yekê, li dora wî, ji derwêşan bigra heta ku digihişt sofî û seydayan û hwd pirr hebûn û lev digihiştin li hevdû. Di rewşên weha de, divê ku mirov bibêje ku mirovên ku wusa xwedî mal û dergah, mirovna ku hertimî ji dora wan mirov qûtnedibûn bûn. Bi wê yekê, êdî wê hertimî di nava

civate de ban. Bi wê re jî, jîyane Mihemed jî, wê êdî di nava civate de bi buhurê. Li cem bavê xwe di rûnişt û kê çi dihanî ser ziman, wî jî lê dihisand û di aqilê xwe de digirt.

De ne, weke kevneşopîyekê bû ku hertimî di dema ku êvar ban ku civat li dar ket û ankû bi rojê kû civat li dar ketin, wê mazinan car bi car zaroyên xwe jî bixwe bihanîyan ku di nava civatê de li rex wan rûnihin û ji axiftinên mazinan ku dihat kirin ew jî tiştekî di serê xwe de jê bigrin. Ev yek, weke kevneşopîyek bû. Yekî ku ev nekiriba ku ku ew bixwe çûba civatan, hebû ku rexne jî lê hatiba kirin, ji ber ku wê ew ne dikir. Civat, bi vî rengî, ne tenê weke cihna levcivînê û bi hevdû re axiftinê bûn. Her wusa, weke cihna ku mirovan pirr tişt ji wan fêr jî dibûn bû. Bi vî rengî, karekî civatan ê pirr giring di nava jîyane civatî de hebû ku dihat li cih bi wê.

Mihemed, ew derfeta wî zêdetir hebû ku di nava civate rûnihê û guhdar bike. Piştre jî, ku di serê xwe de bigrê. Her wusa, divê ku mirov bibêje ku civatek tûna bû ku têde vegotinên weke vegotinên Şahmaran, Rûstemê zal, û hwd ku di wan de newina ser ziman. Weke van vegotinan bi dehan vegotinên din ên civatî ku civat bi civat li wan hatina gotin û li wan hatibûbûna guhdar kirin hebûn. Her wusa, Mêranîya Memê Alan, Serborîya ´Mem û Zînê´ û hwd jî ji van vegotinên ku êdî li ser wan re qasîda dihatina gotin bûn. Vegotina Ferhed û Şîrîn, leyla û Mecnûn jî, çend ji wan vegotin in.

Serborîya Mem û Zînê, berî dema Mihmed(melayê Cizîrî) jî bûbû. Berî wî jî jîya bû. Bandûra wê, li keseyetîya Mihemed bixwe jî pirr bûya. Ew vegotin, weke serborî û vegotinaka ku êdî bi qasîdeyî dihat vegotin. Êdî, ew vegotin bûbû astaka têgihiştinî di serê her mirovî de. Piştre, di dema ku Mihemed mazin dibê wê vê bandûra li ser xwe bi van gotinan bêne ser ziman. *"mûyekê ez ji te nadim bi duşed Zîn û Şîrînan", "Çi dibît ger tu hesêb kî mî bi Ferhad û Memê".* Ev gotin, wê piştre ji devê Mihemed derkevin û wê êdî wê asta wê bandûra li ser wî bênina ser ziman. Ji xwe, ew jî, di temeê pîvandin pû astakê de dihêne ser ziman.

Cîzîra Botan û ankû weke ku Mihemed digot "îreme botanê", wê di wê demê de pêşketinaka wusa mazin û pêşketî lê hebe ku dunya jê bipeyivê. Wê ji wê pêşketinê gotinan bibêjin. Ji xwe li kurdistanê, ew pêşketina wê, bi navê cîzîra bitanê re, wê bi nav û deng bû. Yekî ku navê cîzîra botan ne bihîsta bihîsta nebû. Cîzîra bota û ankû "baxçê gûla" û an jî kû "îreme botanê", hertimî bi xweşîkatî û têgihiştin di serê wê de hebû.

Navê wê jî, ku di hat bihîstinm bes dibû bo ku mirov wê bi zanebûna wê re bibîr bike.

Mihemed, wê li wir, mazin bibe. Ciîzra bota, ewder bû ku herkesekê dixwest ku bo ku xwe mazin pêş bixin ku dikirin ku xwe bigihênina li wir. Zaneyan, dizanîn ku hemû zanist û mirovên aqilmend û bizane, hertimî xwe li wir digrin. Ji ber wê yekê jî, ewder weke navendekê bû. Bi wî rengî jî, hertimî nav û dengê wê hebû. Ji ber vê yekê ya, ku navê botanê, bi zanebûnî bi nav û deng a. Di wê demê de jî, navê mîrê bota ê wê demê ku bi nav û deng û hebû Mîr **Îmadedîn** bûya.

Ev bi nav û dengî, pirr sedemên wê ên dîrokî, olî û têgihiştinî cuda bi cuda hena. Divê ku ez bibêjim ku heta wê demê jî, Tirba Nebî Nûh li wir a. Hê jî, ew tirb li wir a. Nebî Nûh, ji wir a.

Bi vê yekê, hertimî, ew destpêka ku bi olî dihat dest pê kirin ku pêşî bi melekê Tewîs û ankû êzdatîyê re destpê kir, piştre bi Cihûtîyê, Filehiyê û ankû mesihiyê û di asta dawî de bi misilmanetiyê re xwe domandîya. Di hemû pêşketin û serdem û demên pêşketinên wan de jî, ev herêm, weke herêmeka bi nirx ku ji wê xwe bi sûd kirin û temenê xwe ji wê dane avêtin.

Ji ber vê yekê, ne tenê ji herêma kurdistanê, her wusa ji herêmên din ên cihanê bixwe jî, mirovên ku hertimî dihatina wê herêmê wê heban. Wê herkesek, weke ku carekê di jîyane xwe de herê hacê, wê xwe bigihêne wir. Ne tenê kurdan ev dikir. Her wusa, herkesekê ev dikir.

Li wir, dergeha Cîzîra botan, bandûra wê, bi vê yekê jî, bixwe jî, hebû. Di dema Pêxemberê îslemiyetê, Hz. Mihemed bixwe jî, xwe gihandîya li wir. Piştî wî re, her xalîfeyên piştî wî re weke Omer û hwd, xwe gihandina wir li wir, bi rojan jîyane û xwestina ku wir bi başî fahm bikin û ji zanebûna wê sûd wergirin.

Ku weke Pêxemberekî navê wî hebû Yesaya, berî hatina Nebî îsa ku jîyabû, li wir mabû. Heta ku di hin vegotinna de tê gotin ku ew ji wir bû. Ji wir, heta k digihişt Şamê, xateka pêşketî hebû. Ji ber ku Ev xat, ji ber diclê û heta ku digihişt ber Firatê re diçû û ya ku ew xat dide pêşxistin jî, Diclê û Firat, ev herdû çemên kurdistanê û mesopotamyayî ên dîrokî bûn. Li ber çemê Firatê ku Li Herranê, ku navê herranê bixwe jî, weke navekê kurê Birehîm Xelîl tê zanîn a, li wir, di destpêka jîyane de tê bawer kirin ku Habîl û kabîl li wir jîya na.

Ev rewş û hê gelek rewşên din ên bi têgihiştin ên weke van, wê bina temen ji pêşketinên bi vî rengî hizrî û olî û hwd re. Bi wê re jî, wê dîrok, êdî bi wê re were nivîsandin. Mihemed, LI Cîzîra bota bû û bi wê re wî

ev dîroka hemû jî dibihîstin û dizanîn. Hertimî Ji ber ku dihatina vegotin li civatan û wî jî li wan dihisand.

Mihemed, wê piştre ku hinekî dem têve diçê, wê li Cizîra êdî bi tememî di serê xwe de xwe mazin bike. Wê têgihiştina xwe mazin bike. Dîrokê wê bixwêne û fêr bibe. Li wir, bi teybetî li Cizîra bota, ne tenê zane û fîlosofên kurd, her wusa ên herêmê jî ku hatina cîzîra bota, li wir ji ji wê zanebûna xwe tiştek bi nivîskî hiştina û çûna. Bi vî rengî, divê ku em bibêjin ku her zaneyê ku hatî û çûyî, li şûn xwe tiştek hiştîya bi zanebûna xwe re û piştre çûya. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku li Cîzîra bota, pirtûkxaneyeka mazin ya pirr mazin ku têde bi sed hezaran pirtûk û berhemên dîrokî hebûn li wir hebû. Mihemed, bi vê yekê, weke gelek zaroyên din ên di temenê wî de xwediyê derfeteka mazin bû ku li ser wê re xwe pêş bixe û mazin bike. Di wê temenê de, wî jî, ew dikir û di serê xwe de xwe mazin dikir. Heta ku jê tê, wî xwe daye xwandinê û fahm kirina mejûya berê dîrokê.

Bi vê rengê, heta ku Mihemed, tê û figihijê dema balixbûna xwe wê weke ku mirovan piştre ji bo wî digot, wê zanebûna li wir li cîzra bota wê ´xitim´ bike. Piştre jî, wê bi wê re bi sînor nemêne. Piştre, wê heta li dora 1590 û wan, wê li dergehên mazin ên navder ên li agirî, Dersimê û hwd jî wê bimêne. Li wanderan jî, wê pirr mazin bi zanebûnaka mazin ji wan jî bi salan wê bigrê. Dem bi dem, ji zaneyên mazin û alimên navder ên civatê, wê bi wan re û li cem wan bimêne û wê zanîna wan jî ji wan bigrê û wê xwe bêhtirî bizanebûna bike. Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku Mihemed, wê piştî mayina xwe ya li Agirî û Derismê, wê herêmê Heskîfê û li wir li cem şêx û dergeha wî, demeka dirêj wê bimêne. ..

Heskîf, weke cih û warekî pêşketî bû. Li wir, ew ava wê ya ku diherikî, pirr mazin bû. Kirmana li dora wê jî, ji gotina, bajar hemû kiribû nava xwe de. Li wir jî, bi sadan zanîn û mirovên zane hatina çûna. Di hundurê bajêr de jî, pirtûkexaneyaka wusa mazin hebû ku bi bi qama mirovan dihat gotin ku ser qama pênc mirovan re bû. Lê dirêjehîya wê ya ji serîyekê heta serîyê din jî, dihat gotin ku ne dihat dîtin. Yanî, yê ku çûba, serîyekî, wê serîyê bi zorê bidîta. Wilqasî dîrêj bû tişî pirtûk bû. Ji ber Rehayê, û heta ku digihişt, wir, hemû herêm di bin sehêt(kontrol)a Eyûbîyan de bû. Ya rastî, divê ku mirov bibêje ku Eyûbîyan heta ku digihişt şamê, wan kiribû bin kontrola xwe de.

Li wê herêmê, zaneyên wê "xatîbê Qasêmê heskîfî, Şêx teymiyê Herranî ku ji herranê bû lê heta wir jî bandûra wî hebû û pirtûkên wî li wan dergahna hemûyan bi dihatina xwandin bû. Birehîmê Têjî. Sofîyê

Hasanî, ku navê wan di aqilan de maya û di nava xalkê de dihên ser ziman in.

Eyûbîyan, piştî ku dema wan de jî, car bi car, hêrîşên komên Tirkmenan bûna li herêmê û şerê wan bi Eyûbîyan re bûya. Lê eyûbîyan, hemû bêbandûrkirina û ji herêmê dûrkirina. Piştre jî, ku misilmanetî herê kirina, êdî destûr hatîyan li hin komên wan ên aşîrî ku werin li wir bicihî bibîn. Lê hertimî Eyûbîyan, herêm di bin ewlakarîya xwe girtin û parastina. Nirxên herêmê, hertimî parastina. Mizgeft. minereyên mazin ên ku wir hatina çêkirin, hemû ji dema Eyûbîyan in.

Li wê herêmê, bi mizgevt û medreseyên ku hatina çêkirin re, eyûbîyan bi sadan medresa û mizgevt çêkirina di rexhevdû de û li wir, kirina ku pêşketinaka mazin bi xwandinê pêş bikeve. Dergeh û medreseyên li herêmê, pirranîyan wan jî, bi destê eyûbîyan bûna.

Mihemed, piştî ku Tê Agirî û ji wir jî tê Dersimê û piştre ku tê û xwe digihêne Heskifê, wê li wir demeka pirr dirêj bibîne û xwe pêş bixe. Di demeka kin de, wê bike ku bale hemû mirovên li dora wî li wir jî ku werina ser wî û ku ew di nava wan de derkeve li pêş bi fahm û zanîna xwe werê nasîn. Êdî bi wî rengî, ew wê pêşketina ka wusa mazin bi xwe re bide çê kirin ku êdî ew ne tenê weke ciwanekî ku balixbûyî û xwe bi zane kirîya. Ew, êdî weke zaneyekî li pêş a û êdî dikeve fêrkirina zaro û yên bin xwe re de jî. Bi wê yekê, ew derdikeve li pêş. Bi wê yekê, bawerîya li zanîna wî ya di serê wê de, wê pirr mazin derkeve li pêş.

Êdî, ew ne tenê weke mirovekî ku xwenda van lê dihat nerîn. Ji wê zêdetir, weke mirovekî aqilmend ku êdî dikarî mirovan jî perwerde bike lê dihat nerîn û ew derket li Pêş. Li ser wê rewşê, wê êdî bi tememî di asta seydayekî de wê lê were nerîn û êdî piştî wê re, wê bi armanca ceribandinê û parvekirina zanîna wî re, wê Mihemed, ji gotina Şêxê Heskîfê wê were şandin li Amedê li Medreseya wir ku demekê li rex seydeyê wir bisekinê û hem wir nas bike û hem jî êdî perwerde bike. Di aslê xwe de, di wê dema ku ew hatîya şandin li wir bi gotina Şêx, wê hingî weke alikarê seydeyê wir, wê çûba. Di wê demê de jî, li wir, Li Amedê Li medreseya wir, seydeyê bi navê Seyde Taha hebûya.

Melayê Cizîrî, piştî ku hatibû heskîfê, li wir, demeka dirêj mabû. Li wir, bi pirr alîm û zaneyên herêmê û ên li herêmê re rûniştibû û ji wan zanîna wan hisandibû û fêr bûbû. Bi wê yekê jî, wê xwe gihandibû astaka din ya zanebûnî.

Di wê demê de, Şêxê Heskîfê ku tê gotin navê Wî şêx Hisên bûya jî, di wê demê de, baleka xwe ya pirr mazin dabûbû ser Mihemed. Ew, di

dema levrûniştinê de, ew li cem xwe danîya rûniştandin. Bi wê yekê ew hanîya li berçav û bal bixwe jî kişandîya li ser wî. Bi wê jî, di wê demê de, weke yekê ji malê û ji dergehê, li wir maya û kara xwe kirîya.

De ne, di wê demê de, divê ku em bibêjin ku dergeha Xîzanê û medresa wê bixwe jî, pirr bi nav û deng bû. Li wir jî, pirr alîm û zaneyên mazin rûniştî hebûn. Navê wan û bi zanebûna wan, di nava xalkê û civatê de pirr hatîya bihîstin û bahse wan hatîya kirin. Bi vê yekê re, divê ku mirov bahse wê jî bike. Mihemed, piştî ku weke demekê li cem şêx li dergaha wî dimêne û heta ku di wê dema ku ew li wir dimêne de ku car bi car êdî wî bixwe li berçavan bidest dane xwandinê û perwerdekirinê ya mirovan jî kirîya. ..

Piştî ku Mihemed, demekê li wir bi vî rengî maya û êdî ku xwe daye herêkirin bi zanebûna xwe, piştre jî, wî berê xwe daye Amedê li Medresa wir ku li cem seydeyê wir hem alikarîya wî bike û hem jî li wir ku hinek tiştna ji wî jî fêr bibe.

De ne, Seyda Taha, ji seydeyekî zêdetir, weke şêxekî xwe dabûbû herêkirin û wî jî, weke şêxek ji mirovên ku bi sedemkê serî li wî didan dikarî ku ji wan nivîştan çêbike. Bi vî rengî, bahse wî dihat kirin. Heta ku dihat gotin ku "bêhna wî, weke ya şêxekê xort bû û şîfa têde hebû."

Ev gotin, di derbarê de pirr dihatina gotin. Bi vê yekê, navê wî jî bi zanebûna wî re pirr mazin derketîya. Ji aqilê wî, di nava civatan de pirr dihat axiftin. Bi wê re jî, pirr ji aqilê wî û hişmendîya wî bahs dihat kirin.

Ya rast jî, ew bû ku divê ku mirov bibêje ku ew pirr bizanebû. Di wê herêmê de, wilqasî bi nav û deng bûn, hêjayî wê ya ku divê ku mirov pirr li ser bisekinê. Heta ku dihat gotin ku qasra eyûbîyan bixwe jî, ew bi gelek şêxan re li cem azimandina û di nava civata xwe de jê zanebûna wî hisandina. Ji wî, hisandina ku ka ew çendî bi zanebûna. Ew herêm hemû jî, di bin sehêt(kontrol)a Eyûbîyan de bûn. Eyûbî, keyanîya kurdistanê ya giştî, weke ku avakiribûn û weke navend jî, wa di dema xwe de berfiratê navend girtibûn.

Li vir, ku mirov bahse berfiratê bike û bahse hinekî ji rewşên wê yên pîroz nekê jî, nabê. Ji xwe bahs nekirin û buhurtin jî, wê weke bêrêzîyekê ku ji me bixwe jî bê li wê pîrozî û nirxa dîrokî ya pirr pîroz û hêja. Birehîm Xelîl bixwe jî wir bûya. Li wir, male wî hebûya. Heta ku hatibû wê demê jî, Eyûbîyan, cih û war û male Birehîm Xelîl bi rastî kifşkiribûn û li wê vêderê mixgevftek ava kiribûn. Ji bo ku ew şîkefta ku di piçûkatîya xwe de ku Birehîm Xelîl têde maya bo ku ew bixwe jî were parastin, li ser wêderê mizgevt û medresa hatina çêkirin û her mirovê ku

li wir dixwand jî, ew pîroz dizanê û weke can û gîyane xwe ew diparast. Ev yek, weke tiştekî ku bêgûman bihata kirin bû.

Her wusa, weke Birehim Xelîl, berî wî, dihat bawer kirin bixwe jî ku bawê me Adam û dayike hawa bixwe jî li wir jîya na. Ev bawerî hebûya. Piştî wan re, Habîl û kabîl li wir, jîya na û ew serborîya di nava wan de li wir buhurîya û tirba Habîl bixwe jî li ber firatê li nêzî Harranê ya. Ev jî, dihat bawer kirin.

Eyûbîyan, di wê dema xwe de rêveberî û desthilatdarîyaka wan pîrozî û nirxan bixwe re dabûbûn avakiirn li kurdistanê. Bi wan nirxan da, ji wê mazinatîya xwe ya ku heyî ji wê jî hê maztir bûbûn. Bi wê re, li herêmê, hê bêhtirî mazinaîya wan hatibû dîtin. Firat, ew der, herêmeke teybet bû. Eyûbîyan, ew herêm hemû, kiribûbûn bin seêta xwe de. Şam jî, herwûsa, bahndûra wê hebû. Di derbarê wê de, bawerîya ku hebû, ku nebî îsa bixwe ku dema ku hat ser rûyê ardê cardin, wê li wir biheta. Mehdî ku hat ser rûyê ardê piştre, wê ew jî li wir bihata ser rûyê ardê.

Ev çend ji wan nirxên pîroz ku ji aliyê herkesekî ve dihat zanîn bûn. Herkesek jî, di serê xwe de di derbarê wan de û mejûya wan de xwedî zanîn û têgihiştin bû. Di vê temenê de, di dema ku mirov li civatê wê herêmê dirûnişt û li alim û zaneyên herêmê dihisand, her wusa wê bi awayekî vekirî, ew mejûya herêmê dihat ser ziman. Civatên wir ên zaneyan, ne kêmî yên alim û zaneyên li îreme botanê bûn. Civatê wan jî, weke van civatê li Cîzîra botanê, bi nirx û mazin bûn û di wan de jî, pirr zane dihat in û li wan dirûniştin.

De ne, dema ku mirov bahse civatên Cîzra bota bota bike, divê ku mirov bi teybetî û mazin bahsê bike. Ji her herêmên kurdistanê û herêmê giştî zane dihatina li wir, Pêxemberên ku hatina û çûna, yekî jî em nikarin bêjin ku ewder ne dîtina. Hemûyan jî, ewder dîtina. Cîzîra Bahse, ku weke bavê hemû pêxemberan jî dihat dîtin û nasîn Nebî Nûh li wir bû. Ew ji wir, bû. Warê Nebî Nûh bû. Her wusa bi wê re jî, ku dema ku bahse Wê herêmê dihat kirin, wê bi wê re Çîyayê Cudî ku weke çîyayekî pîroz a û navê wê di pirtûkên pîroz de jî di buhurê, Cîzîra bota li ber wê diket.

Vêca, dema ku em bahse zaneyekî weke Mihemed bi kin ku li Wêderê mazinbûyî û temenê xwe hildayî û ku piştre ku were herêmên din ên weke li ber Firatê, Heskîfê, Amedê, Xîzanê, herranê û hwd, ku li wanderan jî ji zane û alimê n van herêman jî zanîna ji wan guhdar bike û piştre xwe bi wê pêş bixe jî, ew jî, weke ku di nava xalkê de bo wî dihat gotin ku "wê mirov bifirêne." Gotina ´wê mirov bifirê´, di wate wê de,

serdestîya mirov bi zanîn û têgihiştina mirov re ku li jîyanê heyî dihêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov bibêje ku yên ku ev gotin ji wan re dihat bikarhanîn jî, ew weke mirovna ku serdestîya wan bi têgihiştin û zanîna wan re ku li jîyanê pirr heyî dihatina dîtin û şîrove kirin û li wan dihat nerîn.

Mirovê zane, mirovê ku bizanebûn dikarî li jîyane binerîya û ew bihanîya ser ziman bû. Her wusa, mirovê ku dikarê bi wate bikira bû. Hinekî jî, wate zanebûnê biwatekirin bû. Zanebûn, weke teybetmendiya mirov ya jîyanî ya.

Ji herêma botanê û heta ku digihişt herêmên ber firatê weke herêmên Reha, Herranê û hwd jî, herêmna ku bi zanebûn, navê wan bidîrokê re hebûn bûn. Ev herêmê, weke xatekê di nava wan de ku bêî ku mirov jevqût bike û jev cûda bêne ser ziman bi hevdû re hebûn. Bi vê yekê re, divê ku mirov bibêje ku bi hevdû re, wateyeka wan y herîkî ku ji nava rûpelên dîrokê derdiket hebû.

Mihemed, piştî ku Hatibû, Amedê cem Seyda Taha, êdî li wir demekê mabû. Lê dema ku ew hatibû wir, weke seydeyekî hatibû wir. Wî, hê li cem şêx, ew karkirina xwe ya weke seydekê dikir. Mirov didan xwandin û derdiket li pêşîya wan û mêj dikir.

Piştî ku hatibû wir, li wir, li civatê, wî ji gelek zaneyên li dorê gelek tişt fahmkiribû û fêrkiribû. Li wir, piştî ku hatibû Amedê, li wir, Şêx Birehîm ku bi aslê xwe ji herême Dersimê bû li wir rastî wî hatibû. Li wir, bihevdû re demeka dirîj mabûn û ji hevdû jî pirr tişt fêr bûbûn. Şêx Birehîm, Şêxekî ku ku dergeha wî li dersimê bû û li wir jî, navê wî pirr hebû. Ew jî, kurdekî elewî bû. Şêxekî elewî bû. Dîwane wî hebû. Pirr jî, bandûra wî hebû. Li wir, ew demek bû ku dima. Mihemed, dema ku bi wî re hat cem hevdû, biwî re ketina nava axiftinê de û bi rojan bi hevdû re axiftin û ji hevdû re gotina. Kê ji wan, çi dizanî di serê xwe de, di wê dema axiftinê de hanîya ser ziman ji yê din re. Bi wê yekê, di derbarê rastî û dîrokê jî, bi evdû, êdî bûna xwe xwediyê têgihiştinaka mazin. Elewîtî çi bû û çawa bû, nirxên wê û pîrozîyên wê çi bûn, Mihemed, hemû bi bêkêmesî ji wî fêrbûn. Şêx birehîm, hem şêx û hem jî pîrekî civate xwe bû. Di dergaha wî de, bi de hezaran berhem û pirtûkên kurdkî hebûn. Hemû, bi dîrokê bûn. Wî, di dema ku hatibû wir jî, bi wî re bi sadan sûwar û derwêşên wî hatibûn. Bi wê re jî, Şêx Birehîm, li ser sih(30) haspî ku hemû barê wan pirtûkên wî yên ku wî diwand û di civatan de ku li ber wî bûn û ku ji wan diaxift bûn hebûn bi wî re. Li cihê ku ew lê rûniştîbû, weke ku pirtûkxaneyek pêre hebû.

Mihemed, dema ku lê hisand, dîtibû û fahm kiribû ku ew çendî bi kurdkîyeka pirr xweşik û sipahî diaxift. Şêx Birehîm, piştre, dibê ku di serê Mihemed de ev yek û heyîderîya di derbarê zimanê wî de kifşkirî wî jî di xwe de kifşkiribê, di axiftina xwe de, bi carekê axiftinê têne ser xweşik axiftinê, De ne, xweşik û sipahî axiftin, ji nirxekî pîroz jî dihat dîtin. Mirovê ku bahse xweşîk axiftinê bike, wê di cih de navê êlî Herîrî bibîr bike. Şêx birehîm, giringî dide xweşik axiftin û levhanînê. Wî, hata ku digot ku "Yekî ku bi kurdkîya xwe xweşik neaxivê û bi wê dûya xwe bi kurdkîya xwe nekê, bila xwe ji me baş fahmkirî nehasibêne." Ev gotin, bi navê wî dihat gotin.

Şêx Birehim, kirmanckîyaka wî ya pirr xweşîk û xort hebû. Dihat gotin ku di dema ku ew diaxift, weke ku helbestê ji mirov re bi qasîdayî bixwêne li mirov dihat.

Di axiftin û hanîna ser ziman de, zimanê mirovv ê axiftinê wê rêya mirov ya hanîna me ya li ser ziman diafirêne. Ji ber vê yekê, divê ku mirov bibêje ku xweşik axiftin, di nava alim û zaneyan de jî, weke nirxekî pîroz lê hatîya nerîn. Xweşik axiftin û bi gotin kirin, tişta ku mirov wê dihêne ser ziman jî, hinekî wê xweşiktir jî dike. Bi wê re, hinekî dîn, mirov rastiyê baştir fahm dike.

Mihemed, di wê demê de ku weke demekê li cem Seyda taha dimêne, wê piştre bi Şêx Birehîm re wê demekê bi rêwîtî wê herîna Xîzan jî, li wir jî, wê çendekê bimên in. Li wir, li dergah û medreseya wir, zaneyên li hevdû digihiştin li hevdû û dixwandin, wê bi wan re jî rûnihin û wê ji wan jî pirr tiştan bi têgihiştin bi bihîzîn.

Xîzan, di wê demê de, weke mîrgeha mazin ya bi nav û deng bû. Mîr Qasîm li wir hebû û rêzanîyaka wî ya pirr mazin hebû. Navê wî jî, derketibû. De ne, heçîyê mîr a, divê ku mirov bibêje ku hinekî ji xwe bi ewla û bitifra ya. Ti mîr nîna ku ji xwe ne bi ewla û bi tifra ya.

Mihemed û Şêx Birehim, bi hevdû re piştî ku hatina wir, wê bo rûmeta wan, wê ew pirr baş û xweşik werina pêşwazî kirin û bo rûmeta wan, wê ew mîr, li qasra xwe jî û li dergeh û medreseyê jî, wan pirr xweşik û sipahî biazimêne. Wê, xatirê wan pirr baş û xweşik werê girtin.

Mihemd, li wir, rastî gelek alim û zaneyên mazin tê. ê, bi wan re li dîwane wan rûnihê û li wan bihisêne û hizrên wan ji wan bixwe jî bihîzê. Wê bi wê yekê, êdî wê demeka pirr xweşik û sipahî bi buhurênin. Mihemed, wê hingî, bi zanebûna xwe jî, weke ku çawa di dema ku ew li cem şêxê Heskîfê bû û ku bi zanebûna xwe derketibû li wir, wê hingî jî li wir, bi heman rengê wê derkeve li pêş û were nasîn. Ew, wê weke

alimekî bi zane wê were dîtin û nasîn. Têkîlî û gotina wî ya şêx Birehim ya xweş ku ji hevdû re jî, wê bike ku hê bêhtirî bal werina li ser wan. Di wê rewşê de, wê mihamed, têkilîya wî baştir derkeve li li pêş. Mihemed, ji Şêx Birehim, Dîroka, Medîya, Axamanîşan û heta ku digihişt dema Sasanîyan wê fêr bibe.
Mihemed, wê wusa lê were ku ew weke ku dîrokê rewa bike. Di wê demê de çi dibê û tê serê herêmê di wê demê de, ew hemûyan fêr dibe. Her wusa, li ser dema Manî bixwe jî, wî zanebûn girtîya û li ser hizirîya.

Mihemed, ev gotina wî, giringa ku di derbarê serwerîya wî ya dîrokkê de têgihiştinekê dide me. Weke vê gotinê gelek gotinên wî hena. Lê emê tenê vê hilbijêrên û bênina ser ziman. "Bendê Şapûrê te bin ta Xusro û Şapûr-î bî". Şapûr, giringiya wî ya ku ew bi wê dihat nasîn ew bû ku wî di dema xwe de, çend ku ola Manî herê nekiribê û bi tememî ne pejirendibê jî, destûrdayê de ku ew karibê xwe bêne ser ziman û birêxistin bike. Manî, di wê demê de pêşket û hizrên xwe li jîyane bicih kir. Şapûr, di xwest ku Manî wî derxe li pêş û pîroz bike. Lê Manî, ev nekir. Manî, xwe i desthilatdarîyê ve girêneda. Lê di rewşeka ku hevdû herêkirin de jî man. Dem ku piştre hat û gihişt dema Behremê yekem, êdî wê ew rewşa Manî wê were ji holê rakirin. Behrêmê yekem wê ji Manî bixwezê ku ew wî pîroz bike. Lê Manî wê herê nakê. Di dema Şapûr yekem de jî wî jî ev xwestibû. Lê Manî, ev nekiribû. Lê Şapûr, ev ne vergerandi bû dijberiyekê. Lê Behrem, ev yek, vergerend li Dijberîyê û Manî da girtin û avêt zindanê û bi roja lê êşkence da kirin ku heta Manî di bin êşkenceyan di zindanê de mir û çû ber dilovanîya xwe. Lê divê ku mirov di serî de bibêje ku ew çûyina bi ser Manî de, hê di dema Şapûrê Yekem de dest pê dike. Heta demekê Şapûr, bêdeng dimêne. Lê piştre diçê bi ser wî de. Hê ku Şapûr Saxe, wê Behrem derkeve li holê û wê herê bi ser Manî, Li gorî ku tê gotin jî, hemû çûyan biser Manî de Şapûr, da dest pê kirin heta bi kûştina wî û tenê Behrem, weke ya Şapûr kir. Yanî, weke ku di nava xalkê de jî tê gotin, "divê ku mirov herdûyan jî ji mirina Manî berpirsîyar bigirê." Ji ber vê yekê, hinek dibêjin "şapûr, Manî kuşt" û hinekî jî dibêjin "behrem, Manî kuşt"

Ev dîrokên demên berê ên berî dema hatina misilmanetiyê bûn. Lê di wê demê de jî serdestîya wan hebû. Ji nû ve şîrovekirina van dîrokan di çerçoveyeka ku bi têgihiştînîya demê ku were herê kirin de, dihat kirin. Bivî rengî, êdî şîrove pêş diket.

Mihemed, wê demekê bi hevdû re li wê rêwîtîya xwe ya li Xîzanê wê bimênin. Wê piştre jî, êdî ku li gorî ya dilê xwe têr dîtin bi mayîna xwe

ya bi zaneyên wêderê re, êdî piştre wê bi hevdû re vegerihina li Amedê li dergaha Seyda Taha. Lê hin gotinna din jî di vî warî de hena ku tên gotin ku "hê ku mihemed û Şêx Birehim li wir bûn, Şêxê Heskîfê bi serdanê tê Amedê, êdî di cih de dema ku ev tê bihîstin, êdî piştre Mihemed û Şêx Birehim û gelek mirov û zane û alimên din ên ku tevlî wan dibin, bi hevdû re tên ku werina wir." Piştî ku ew dikevina rê de êdî di demeka kin de dikin û xwe digihênina Amedê. Ku hatina wîr, êdî bi rastî jî dîtin ku wa şêx li wir a û hê neçûya(ne vegerîya ya).

Piştî ku ew hatin û vegerîyan li Amedê, wê piştre li wir, demekê bimênin. Wê li wir, êdî bi hevdû re, bimênin. De ne, divê ku mirov bibêje ku dema ku hatibû bihîstin ku şêxê Heskîfê hatîya Amedê, ji hewirdorê jî gelek alim û seydayên ku agahîyan wan jê çûbû bû, bi wir ve herîkîbûn û hatibûbûna li wir. Dema ku Mihemed û Şêx Birehim di vegerihin ku werina wir, êdî dibînin ku wa weke ku hemû cihan li wir levcivîya ya, wa ewder tişî mirov bûya ku ji gelek deveran hatina wir. Yanî, bi gotinaka din, ku em bibêjin ku

Mihemed û şêx Birehim, piştî ku gihiştina wir, êdî piştre ew jî tevlî wan zane û aliman bûn. Êdî bi hevdû re buhurtina li civate hevdû û bi hevdû re ketina axiftin û danûstandinê de. Di demek û rojeka wusa de ku ewqas zane bi carekê li deverekê levcivîyana, ma êdî bi derfeta ku wê axiftin û danûstandinên mazin ên bi mejûyê re newina kirin. ..

De ne, di wê demê de, bi şêx re jî ku hatibûn gelek derwîş û sofî hebûn. Her wusa, yên ji herêmê ku bihîstibûn, êdî ne sekinîbûn û di dicih de hatibûbûna wir. Gelek ji wan sofîyan, ku arbana wan di destê wan de ku di dema ku di rûniştin li dîwanê, êdî bi stirandinê hem li arbana xwe dixiştin û hem jî bi wê re êdî qasîda digotin. Ev jî, weke karekî ku hertimî ji sofîyan jî dihat pirsîn bû. Dema ku navê Sofî dihat gotin, wê arbana wî, û qasda gotina wî, di cih de biketa bîrê de.
Her qasîda jî ku dihat gotin, ji wê qasîdaya ku hatî gotin û ankû dihat gotin, wê mejûyek bihata fêrbûn. Bi dengê xweş gotin jî, weke aliyekî din ku bi teybetî divê ku mirov li ser bisekinê û bêne ser ziman a. Her sofî, bi dengê xwe re jî car bi car bi nav û deng bû. Ji ber vê yekê, dema ku li kûderê ba, ku dema ku bihata dîtin ku di civatê de sofî levcivîyan, êdî dihat gotin "êdî wê qasîda bibêjin û wê xweş bikin." Bi wê re jî, êdî herkesekî xwe li dora wan dide hevdû.

Piştî ku Kerwane Mihemed û şêx Birehim gihiştina wir, êdî hijimara mirovên li wir bigirseyî zêdetir bû. Ev zêdebûn li berçav jî, wusa dihat xuyakirin. Mihemed û Şêx Birehim, weke du stêrkên ku dibariqandin di

nava wanqas mirovan de hatin û tevlî wê girseya ku bo bi şêx re hatî û bo wî levcivîyayî li wir bûn.

Ku dema ku hatin û şêx Mihemed dît, pirr ji wê dîtina kêfxweş û dilxweş bû. Di cih de, bale xwe de ser wî û ew şêx birehim li nêzî xwe rûnand. Piştre jî, êdî Mihemed li wir, bêhtirî derket li berçav. Herkesekê li wir, alim, sofî, derwîş û hwd, hemûyan ew giringîya ku şêx di de Mihemed didîtin û kifşkirin. Êdî bi wê re, ew bêhtirî diket berçav û dihat nasîn. Bêhtirî, êdî bawerî bi wî dihat kirin. Di rewşên wusa de, meşrûtîya mirov binasîna mirov re di nava civatê hê bêhtirî derdikeve li pêş.

Di wê demê de, êdî li hevdû rûniştin û dem bi dem, heta derengîya şevê li hevdû rûniştî diman û bi hevdû re diaxiftin. Civat, ji xwe ku şêx di nav de, wê heta derengîya şêxê bimênêt. Heta ku şêx negotiba, dê êdî em rabin û herin û razihin, wê ti kesekî berî ev gotin bi lêv nekiriba û ji cihê xwe nerabûba ku ew civate heta kengî û çi waxtî j doma ba.

Li wir, di civatê de, wê heta derengîya demê û şevê wê hertimî li hevdû rûnihin û bi hevdû re biaxivin. Mihemed jî, di wê demê de derdikeve li Pêş. Di wê demê de, dema ku di nava civatê de ku şêx ji Mihemed dixwezê ku ka wê dema ku li wir maya û çûya Xizanî ku ka çi fêrbûya û di serê xwe de girtîya ku ji civatê bibêje ku ji wî dixwezê, êdî ew jî li ber civate li ser xwestek û gotina şêx êdî diaxivê û dihne ser zimanê. BI wê rengê, êdî herkesek jî dengî wî di bihîzê. Biwê re jî, êdî fahm dikin ku wî çendî zanebûn di serê xwe de girtîya. Herkesekê li lê dihisêne meşellekê bo wî ji dil dihênina ser ziman ji navê xwûdê.

Mihemed, wê di wê demê de, pirr derkeve li pêş. Divê ku em bibêjin ku ev dem wê ji bo wî bê pêvajoya nû û destpêka wê, êdî. Li ser wê re, êdî vi dema xwe ya nû de wê Mihemed, ne tenê weke seydeyekê wî, herwusa weke alimekî mazin ê ku êdî divê ku civat li gotina wî bihisêne wê derkeve li pêş û wê were herê kirin. Li wir, wê di nava wan aliman, zaneyan û mazinên civatê de, wê ew derkeve li pêş. Di wê demê de, ew li herêmê pirr mazin tê nasîn. Êdî, ew ne mirovekî ku wê weke seydeyekê ku li berdestê şêx bê û ankû li dergehê û anlû medreseyê tenê perwerdevanek bê.

Li wir, di wê dema ku hê şêxê Heskîfê li wir a, wê gelek alimên din jî li wir li hevdû bicivin û wê di nava wan de şêx gotina xwe bibêje ku divê ku ew êdî weke alimekî mazin were herêkirin.. Bi wê re jî, di wê demê de ku ew demek bû ku ji aliyê qasra Eyûbîyan ve dihat çêkirin û nekêmî medreseya Sor ya Cizîra bota ku di wê demê de hê jî Mîr dide çê kirin li ser navê navê xwe Mîr Seyfî, ji wê ne kêm piçûktir medresa li herêmê

Amedê li Sirrba hatibû çêkirin. Ev herêm, weke herêmeka navend hatibû hilbijartin ku bi hazaran xwandvanên ciwan ku lê diigihiştin hevdû û lê perwerde didît în. Şêx, di wê demê de, ji Mihemed dixwezê ku ew herê wir û wê herêmê hemûyî ew bide perwerde kirin. Şêx, bawerîya wî, bi Mihemed heya ku ew dikarê wîkarî bike. Di wê demê de, yên ku bi wî re zêde mabûn, Seyda Taha, Şêx Birehim û gelek alimên din jî, wê bawerîya şêx bi gotinên xwe yên ku li ser Mihemed di nava civatê de dihênin ser ziman piştrast dikin û wî bi maf dikin. Di wê de, êdî ew jî, ji wê gotina şêx gotina xwe dihênin ser ziman û dibêjin ku çendî rast û dicih de ya.

Piştre, li ser wê jî, hê ku şêx li wir, wê gelekî were axiftin. Ew jî, bo seyda Taha rûmetek bû ku li medresa wî û di dîwana wî de Mihemed bi wî rengî hatibû bi rûmet kirin. Ew, hinekî jî rûmet kirina wî bixwe jî bû.

Mihemed, hê ku li cem Şêx ku li Heskîfê bû, bidest rijandina hizrên xwe li ser rûpel kiribû. Wî hizrên xwe tên ku di nivîsandin hebûn. Di wê demê de jî, heya şêx bixwe jî ji vê yekê heya. Ji ber vê yekê, gelek caran, şêx bixwe jî, ji wî xwestibû ku ew ji wan hizrên xwe biaxivê û bêne ser ziman. Wî jî, heta ku dizanî û dikarî, dikir ku mazin û weke ku şêx dixwest ku werêne ser ziman.

Mihemed, li ser olê û dîrok û hizratîya olî pirr disekinî. Ew pirr baş fahm kiribû. Lê wî, hin hizrên xwe li ser şifakirinê û werzê(matamatik)ê jî rijandibûn li ser rûpel. Li ser Matamatik û stêrzanîyê, hin hizirkirinên wî yên kûr ku wî hê di wê demê de nivîsandibûn hebûn. Piştre jî, wê hizirkirina xwe nebirrê û bidomêne.

Bi wê re jî, dîrok wî pirr xwandîya. Wî dîrok, em dikarin bêjin ku bigiştî, hemû dîroka berî xwe hevgirtin(sentez)eka wî ya giştî û kûr derxistîya û li ser wê re di serê xwe de xwestîya ku li pêşîya xwe binerê. Bi wê yekê, ew êdî hatibû wê ast û radê ku ji her rewş û pirsê re bersivaka wî ya bi vac û aqilana hebû. Lê li vir, bi vir re girêdayî divê ku mirov vê jî bibêje, ku zimane wî pirr pêşketî bû. Navê Êlî Herîrî bi zimanê wî derketibû. Ji ber vê yekê bi navê Êlî herîrî di nava xalkê wele gotinaka xalkê bicih bûbû û dihat gotin ku "weke herîrî xweşik axift" û ankû "weke herîrî xweşik biaxiva." Her wusa, ev bi serdestîya mirov ya li zimanê re mirov dihat ser ziman. Mihemed jî, serdestîyeka wî ya pirr mazin û pirr zêde, li ser zimanê wê û têgihiştina wê afirî bû. Ji xwe, yekî ku bi hizirê û zane bê, divê ku weke karê pêşî, serdestîya wî li ziman hebe. Weke destpêka pêşketin û serdestbûna mirov li zanebûnê bi têgihiştinî, pêşî xwe bi serdestbûna mirov bi zimanê mirov re xwe dide

dîyar kirin. Ji ber vê yekê jî, mirovan ku li zimanê Mihemed, dinerîn, di dîtin ku ew çi mazin bi serdestîyekê li zimanê û piştre li têgihiştinê diaxivî. Di dema ku ew diaxift, ev yek, ji wî pirr baş dihat dîtin. Nîşanaka serdestbûna mirov li zanebûn û têgihiştina mirov, di ziman de xwe dide li der.

Mihemed jî, piştî ku şêx ew bi gotina xwe re derxistibû li pêş, êdî piştre jî, bal çûbûbana li ser. Ji xwe di civatan de mirov ji ber çi tê dayîn axiftin? Ji ber ku bê dîtin ku ka ew çendî serdestî zimanê xwe ya û çendî dikarê gotinên xwe yîn zanebûnê bi têgihiştin û hiş bêne ser ziman. Her wusa, her zaneyê civatê, wê pêşî li vê binerê. Ji ber vê yekê, di dema ku yekî axiftina xwe kir û ku yekî din ji civate ku ji axiftina wî gotinek girt û ew gotin weke pirs lê kir, ku wî ew gotin bi bersiv nekir, hingî ew nayî hasibandin ku ew serdestê wî zimanê xwe ya. Li gorî zanîna civatê, serdestîya ziman, di têgihiştinê re diçê. Serdestîya têgihiştinî jî bi ziman û gotinên mirov ên ku mirov wan bikardihêne bi wan û rengê wan dihê dîtin û kifşkirin.

Mihemed, ji van waran ve xwe pirr mazin kiribû. Wî zimanê xwe pirr baş kiribû û bitêgihiştin kiribû. Ku ew li civatê dirûnişt, ku yekî çi jê pirsîba, wê wî, ew bi bersivanda. Ew bi têgihiştin û ziman, serdestê zanebûna xwe ya ku wî hildabû li serê xwe bû.

Di vê ku mirov bibêje ku Mihemed, ziman bi hin teybetmendiyna hildaye li dest di serê xwe de. Di serî de, wî ziman û têgihişttin bi hevdû re dîtîya û bi hevdû re hanîya ser ziman. Her gotina ziman, wê weke têgihiştinekê kifşkiriya û hanîya ser ziman. Li ser wê re jî, li wê hizirîya ku çendî ku bi têgihiştinî kûr bû wê di derbarê gotin û zimanê xwe de jî kûr bibe. Bi wê re jî, wî her gotina ziman ya ku ew ketîya farqê û têgihiştina wê de, weke ancamaka wê têgihiştina xwe dîtîya û hanîya ser ziman. Bi vî rengî, wî ziman û têgihiştin bi hevdû ve ku ji navikê ve girêdayî dîtîya û wusa lê nêzîkatî kirîya.

Ziman û aqil, bi hevdû re girêdayî, dema ku em dihildina li dest, em dibînin ku Mihemed bi gotina "zane"bûnê re kê nêzîkatî kiriya. Di her berhemên wî de, wî Zanebûnaka pêşketî hanîya ser ziman. Lê tiştekî din jî, em bi wî re kifş dikin. Wî, her zanebûna xwe ya ku hanî ser ziman, piştre lê vegerîyaya û kirîya ku zanînekê di derbarê wê de jî bi xwe re bide çê kirin û wê zanîna xwe ji aliyekî din ve jî fahm bike. Ev yek, heta ku mirov ew zanebûna ku mirov afirandî ku mirov ne serdestê wê bê, mirov wê nikaribê bike. Lê dema ku em vê yekê bi Mihemed re dibînin,

êdî em divê bibêjin ku ew serdestîya wî bi wê zanebûna wî re pirr mazin hebûya.

Serdestîya li zanebûnê, weke serdestîya mirov ya li xwe û li jîyane xwe jî ji aliyê wî ve tê dîtin û ser ziman. Her wusa, divê ku mirov bibîne ku Mihemed, bi aqilê xwe Mazin bi vî rengî hizirîya û hanîya ser ziman.

Serdestîya li zanebûnê, weke aliyekî teybet, çendî ku em di nava zanebûna Mihemed de kûr dibin, em bi wî re kifş dikin. Weke alî û teybetmendiyeka wî ya sereka mirov wê kifş dike ku bi wî re derdikeve li pêş. BI vê yekê re, divê ku mirov vê jî bibêje ku wî her gotina xwe bijartîya bo ku zanebûna xwe bi mirovan bi başî bide fahmkirin û fêrkirin. Ew ji xwe, wê piştre êdî jîyane xwe bide fêrkirin û perwerdekirina mirovan. Piştî ku li ser gotina şêx ku ew hat hilbijartin û ku ew çû Sirrba, li wir êdî wî hem xwe di serê xwe de bi têgihiştina xwe kûr dikir û hem jî mirov perwerde dikir.

Mirov, ku wê giringî dayîna li ziman ku bi Mihemed re dibîne, Êlî Herîrî û ew herîrîya wî tê ber bîra me. Êlî Herîrî, bi wê ziman xweşî û xweşik levkirina gotinê xwe navdabû li herêmê. Her wusa, ew navdêrîya wî ji sînorê kurdistanê derbas kiribû û li herêmê belav bûbû. Di nava alim û zaneyan de yên ku zimanê wî ne dizanîn êdî nebû. Yekî ku xweşik dizanî ku levbêne, ew dihat tijbandin li Êlî Herîrî.

Mihemed jî, di dema xwe de zimanê xwe yê ku biaqil şiştî, hanî bû wê astê bi wê zanîn û têgihiştina xwe. Bi wê yekê, di dema ku ew di nava mirovan de êdî diaxift, her wusa, hema wusa mirov lê dihazinî û dixwest ku lê bihisêne. Hema mirov dixwest ku ew biaxivê û mirov jî lê bihisêne.

Ku mirov lê dihisand jî, wî mirov di serê xwe de bi gotinên xwe re dibir û dûr dibir. Mirov di serê mirov de, li ser wê vegotinîya xwe re ku bi pirr xweşikî levdihanî, mirov derdixist li li rêwîtîyê di mejiyê mirov de. Mirov, weke ku ji xwe dibir bi gotinê û xweşikgotinê.

Mihemed, bi vî rengî, bi wê xweşik axiftinê, dizanî ku her gotina ku wî digot, êdî di serê mirov de jî dimêne. Gotina xweşik, di mejî de cih digirê. Ev yek, ne tenê weke zanînekê bû. Her wusa, weke baweriyekê jî hebû di nava mirovan de û di serê wan de. Kî mirovî dikarî ku xweşik biaxifta û gotina xwe bigota? Ew mirovê ku bi zane diaxift. Wî mirovê ku bizane diaxift û zanebûn û têgihiştina wî di derbarê gotinên wî yên ku digotin de ku hebû û ku di zanî ku çi digot. De ne, weke gotinaka xalkê ya, ku di nava kurdan de hertimî hatîya gotin ku "ku mirov axift, divê ku mirov zanibê ku çi diaxivê û ji çi diaxivê." Ev gotin, weke gotinaka ku yekî ku ne bihîstî û nedizanî nebû.

Mihemed, çend gotinên wî yên weke destûr hena ku di nava xalkê de jî bi devkî ti carî ne hatina ji bîr kirin û tên ser ziman. Ew jî ew in ku "ji alimekî serdestîya zimanê wê civate xwe ..", "bi zanebûn hanîna ser ziman gotina xwe ..", " bi dane fahmkirinê", û hwd. Weke van gotinan gelek gotinên din jî, ku bi navê wî tên ser ziman hena. Lê divê ku mirov vê bi teybetî binî xatbike û bibêje ku Mihemed, giringîya mazin daye zimanê civate xwe. Weke ku çawa ku di nava kurdan de gotinaka heya tê gotin ku mirovekî ku pirr hij zaroya xwe dike "bi ser de dixurihê". Ew jî, her wusa bi ser zimanê xwe de xûriha ya. Wî pirr giringî dayê de. Di derbarê zimanê xwe de, ew li pêşîya pirranîya zaneyên dema xwe bûya. Nîşanaka vê yekê ya ku piştî wî re, hemû zaneyan jî ew zimanîxweşîya wî û têgihiştînîya wî ya ziman ku esas girtina. Zaneyekî weke Feqiyê teyran, wê piştre bibe heyranê wê zimanê wî û mazinatîya wî ya bi têgihiştina wî.

Zimanê mihemed, giringiyeka wê ya teybet heya. Di nava civatê de jî, ew bi wê zimanê xwe û têgihiştina xwe derketiya li pêş. Hê jî li herêma botanê, tê gotin ku "dema ku jinekê hevîrê hevîrt û herê hevîrê bi kêla tirka wî ve bike, wê hevîrê bi pijê û nanê wê jê çê bibe." Ev ji ber çi û bi çi têgihiştinê tê gotin? Bi wê têgihiştinê tê gotin ku ew pirr bizane bûya. Ji bo ku bal bikişênina ser wê zanebûna wî ev gotin dihê gotin.

Mihemed, piştî ku hatibû Sirrba jî, wê li wir, herî zzêde bi zanebûn û zimanê xwe derkeve li pêş. Li wir jî, êdî wê dîwane wî ava bibe. Wê Mihemed, êdî bi wî rengî li wir bi salan wê li wir bisekinê û wê mirovan li wir perwerde bike. Li wir jî, wê çend berhemên wî ên ku wî nivîsandibî wê hebin û piştî ku ew ji wir dûr dikeve, wê wan li wir li şûn xwe bihêle li wir.

Mihemed, wê bi salan li Sirrba bimêne. Wê li wir, mirovan perwerde bike. Li wir, wê di hundurê wê dema ku ew li wir dimê de, wê bihezaran xwandvan û faqiyên wê ên ku wî perwerdekirina wê bibin. Wê, gelek şagirt ji destê wî derkevin. Wê, ji zanebûna wî, weke ku ji ava kewserê vexwûn wê vexweûn û pê xwe mazin bikin.

Hemû zane û zanîna wan, ya ku heta w demê hatî û tê zanîn, Mihemed di wê hundurê wê demê de heya wî ji wan çê dibe. Her wusa, divê ku mirov bibêje ku Wê li Sirrba, Mihemed dibin destê wî de ku hem dixwêne û hem jî ji wan sûdgirê, wê pirtûkxaneyaka bi deh hezaran pirtûk wê ava bibe. Li wir, ew mayîna wî û serdema wî, weke mayîn û serdemeka mazin ya hem jîyane wî ya û hem jî ya pêşketina wîr ya destpêkê ya. Li wir, berî hingî jî, medresa hebû. Lê Di wê demê de qasra

Eyûbîyan, medresayaka ku nekêmî ya Medresaya Sor bi qadr û qiymet çêkirin û ava kirin. Di wê dema ku Li Cîzîra Botan Medreseya Sor hê çêkirina wê didoma, li wir jî medreseya wir ji aliyê qasraya Eyûbîyan ve dihata çê kirin. Ev çêkirina medreseyan ya bi zêde, sedemeke wê ya bi demê re hebû. Di wê demê de, her mizgevt û dergeha ku li tanîşta wê û ankû li anîşka wê medreseya ku têde xwandibê dibe ku tûne bê li wir yek dihat ava kirin. Êdî hîn bi hin, bi vî rengî zanîn û perwerdekirin, derdiket dervî dergahan jî.

Heta wê demê, zanîn di hundurê dergahên şêxan de bû. Lê piştre bi medreseyan re ev hat guhartin. Bi medreseyan re, pergaleka perwerdekirinê ya giştî bi teybet li kurdistanê ava kiribû. Di her medreseyê de, her mirovê kurd ku di dema ku pirtûka pîroz dixwand, wê bi di rengan bixwêne. Ev herdû reng weke dû pergalên xwandinê ên ku dijîyanê de bi sadsalan hatibûbûna rûniştandin jî. Awayek û rengek jê re "hicirkî" dihat gotin ku vi vê pergalê de kitakirin xwandinê hebû û bi wê re bikurdî xwandin û ji berkirin hebû. Ev weke aliyê pergalê ên bingihîn jî bû. Alîyê din jî, jê re "sirakî" dihat gotin û ev jî weke ku çawa ku î ro kûran bi erebkî dihat xwandin, wusa weke xwe dihat xwandin. Lê di rengê sirakî de, weke ku Çawa ku Di wê demê de Mela Hisêne Bateyî mewlûda kurdî di nivîsêne, her wusa bi deh hezaran pirtûk û berhem hatibûbûna nîvîsandin hebûn û dihantina xwandin. Mihemed bixwe jî, wî pirtûkên xwe bi vî rengî bi kurdî nivîsandina. Her wusa, wî pîrozîya zimanê xwe dîtîya û kifşkiriya.

Li kurdistanê, di wê demê de divê ku em bibêjin ku her medresaya ku hebû, di wê demê de ku têde hebû bi hezaran pirtûkan pirtûkxane hebûn. Lê Cîzîra botan ku bahse wê dihat kirin, dihat gotin ew bixwe weke pirtûkxaneyekê di hat şîrovekirin û salixkirin û dihat ser ziman.

Mihemed, wê di demê deme weke demeka dirêj li wir bimêne. Weke ku di nava aliman de jê tê gotin, "heta ku bi zanebûna xwe ya di serê xwe de dipijê, ew wê li wir wê li wir bê". Piştre jî, wê piştre, êdî wl bikeve serê wî de bi herê û serekî li Cîzîra bota bide. Lê di wê dema ku ew dihizirê ku êdî vegerihê Cizîra bota, berî wê hizirkirina wî jî, navê wî bixwe herêm bi herêm çûya û heta ku gihiştîya Cizîra bota bixwe jî. Ew li Cîzîra bota jî, di wê demê de weke yekî navdar jî lê heya wî bixwe jî hê jê nîn a.

Mihemed, piştre ku demek têve diçê, wê piştre kare xwe bike û çend seydayan li cihê xwe bide amede kirin û wê ji wan re jî bibêje ku ezê vegerima li vir cardin li nava wê û wê piştre bike ku bi kerwaneka ku bi

wî re xwe amedekirî bikeve rê de û herê Cîzîra bota. Lê ew berî ku herê Cizîra botan Nîyet û nêhta wî heya ku herê Xîzanê û ji wir jî pêşî herê heskîfê û êdî ji wir bikeve rê de û herêmê Cîzîra bota. ..

Mihemed, piştî ku ew karkirina xwe kir, wê piştre, êdî bi kerwanê bikeve ser rê de û herê Xîzanê. De ne, Dema ku ew herê xîzanê û ji wir jî cardin were Heskîfê. Ji ber ku rêya wî dûrtir dikeve. Lê ew ji xwe re nak xem. Lê li pêşîya wî jî, çend derwîşên ku bi rê ketina xwe gihandina cihê ku wê ew pêşî heriyê de, xwe gihandina wir û agahiya wî ya ku wê herê wir berî gihandina wir. Piştre jî, wê Mîrê Xizanê di cih de komek sûwar bide amede kirin û bişêne pêşîya wan ku rêwanîyê û berîwanîyî bi wan re bikin.

Mihemed, mirovekî ku êdî mazin bû. Ew li her derê weke alimekî mazinn dihat dîtin û pêşwazî kirin. Di rê de di wê demê de dema ku diçûn de, wê pirr bihizirê. Di wê demê de cizîra bota ketibû bîra wî de. Ew jî, di rêwîtîya xwe de hem dimeşî û hem jî di serê xwe de dihizirî. Hiş û hizra wî li ser Cîzîra bota û wan demên wî yên berê ên li wir bû. Î ro, vêca, wî bi çavekî bi zanetir li wan demên xwe dinerî û li wan dihizirî.

Ew di serê xwe de mazin bûbû. Di ser xwe de, pirr bi pêş de çûbû bû. Ew, hê di wê dema xwe ku ne zêde pîra lê ku bi zanebûna xwe êdî nawserî xwe ya re, hebû. Yên ku lê dinerin û lê dihizirin jî, bi wê rengê û awayê li wî dihizirin û ew dihanîn ser ziman. Mihemed, ew ne pîr bû lê bi zanebûna xwe piirr pîr û kal bû. Ew, weke yekî deh hezar salî bû. Tê gotin ku Şahmaran Deh hezar jîya. Şahmaran di serê xwe de, xwediyê zanîna gerdûnê hemûyî bû. Şahmaran di zanî ku di demên bubuhurî de çi hatîya jîn kirin û çawa hatîya jînkirin. Lê dihat gotin ku ew dizanê ku wê di demên pêş de jî çi were û bijî û çawa wê bijî jî, wê dizanî di serê xwe de. Ew, weke li dervî demê û li ser hemû demên ku hatina û çûna û yên ku wê werin û herin re jî bû.Mihemed, di serê xwe de, xwe wusa hîs dikir. Zanîna wî, ew kûr û dûr dibir. Hertimî jî, ew dihizirî û dide hizirandin. Biwê hizikriirnê re, êdî ew jî di serê xwe de, dihizirî û weke ku êdî heya wî ji dervî wî tûneyî lê dihat. Yanî têkiliya wî ji dervî wê re qût dibû. Bi wê rengî, yên ku lê dinerin jî, bi rehetî kifş dikirin ku ew di serê xwe de çûya û ne li wir û wê demê ya, ka ew di serê xwe de nûha li kûderê ya. ..

----- -----

Dema ku mirov bahse jîyanê bike, mirov wê di serî de, li wê bihizirê û bihiş bike. Bi wê bihişkirinê re jî, emê nirxandina wê bi aqilê xwe bikin. Her hişkirin, bo jîyanê nirxandineka têgihiştinî jî ya. Bi wê re jî, dema ku

mirov lê dinerî, mirov fahm dike. Lê her têgihiştin, ji wê jîyane ku jê afirîya jî, piştî ku afirî û pêde, êdî weke têgihiştina ku ne tenê di derbarê wê de ya, her wusa têgihiştineka ku bi wê dihê fahmkirina jî.

Mihemed, demên xwe yên mazin bi aqil buhurand. BI wê re jî li ser aqil re û li ser têgihiştinê dîtin û nnerîn di serê xwe de da afirandin. Mihemed, di wê dema xwe de hê weke ku mirov di kurdî de dibêje ku ´hê di bihare xwe ya de ya´, di wê temenê de bidest kifşkirinên mazin bi hizrî û di serê xwe de kir.

Ku dem tê ve diçû û di buhurt, MIhemed jî, di hizirî di serê xwe de kurd dibû. Piştî ku ew ketibûbûna ser Rê de ku herina Xîzanê, û pêde, êdî piştre di rê de, çend ku alim û zaneyên ku di rex wî de ku di rê de dimeşîn hebûn û car bi car bi gotinî jî bê ji dev bi hevdû re diaxiftin jî, lê dîsa di serî de weke ku ne li wir, di serê xwe de ku çûyî devereka dûr û bihizrî rûdêna wî dihat li berçav

Mihemed, di serê xwe de dihizirî. Di wê demê de, çendî ku ew di serê xwe de dihizirî, bêhtirî tişt û mîşt dihatina hişê wî û diketina bîra wî de. Bi wê re jî, êdî wî jî, bêhtirî di serê xwe de xwe dide hizirkirina li ser wan. Di destpêkê de, Cîzîra bota hatibû hişê wî û ew li ser wê û demên xwe yên berê dihizirî. Lê çend ku ew di nava hizran de di serê xwe de pêde diçû jî, her wusa êdî bi wê re gelek tişt û rewşe û kirinên ku wî jînkirina û an kû wî dîtina û hatina berbîra di serê wî de zîndî dibûn û ew jî li li ser wan dihizirî. Mihemed, di wê demê de, weke ku ew bûbû fezeyek di serê xwe de û tiştên ku buhurî bi jîyandinê di ber hişê wî re di buhurt û wî jî ew bi bîr dikirin.

Gelek tişt wî bixwe jîn kiribûn. Lê dema ku mirov bi hizrî, bi salan xwe dabê xwandinê û di renêg Mihemed de xwandibê jî, hingî jî, ew xwandinên mirov di reng û temenê hin serborîyna de derdikevina ber mirov. Di wê demê de jî, hinekî jî, weke ku rewşeka bi vî rengî bi Mihemed re di serî wê de bi wî re hebû. Mijarên aqilî û têgihiştinî ên ku mirov di vê ku li ser wan bihizirê jî, ew jî, ji xwe aliyekî din ku mejiyê mirov hertimî mijul dibe bi wan re. Carna ku mirov ne di farqê de jî û ku mirov weke ku ne di hizirkirinê de jî bê, wê mejiyê me, bihizirê li ser mijaran ku em ne di farqê de jî bin. Ya ku mirov li vir, hinekî jî, bi teybetî bêne ser ziman ev a

Mihemed û kerwana bi wî re, piştî demeka dirêj, bi vî rengê dihêne nêzî Xîzanê, li wir jî, lê berî ku bigihijina wir bixwe jî, di rê de ew mirov û sûwarên ku Mîr şandibûbûna pêşîya wan di rê de digihijina wan û êdî ew bi hevdû re li gorî dilê xwe dimeşîn û tên. Heta ku di rê de, di dema

ku tên jî, rastî çend komên koçeran jî tên û li wan jî disekinên û li bênê konê wan weke demekê li hevdû jî dirûnihin û dixwûn û divexwûn û piştre ku hinekî jî xwe rehet kirin û sawalên xwe avdan, wê piştre dikevina ser rêya xwe de ku êdî herin.

Mihemed, di wan deman de jî, dema ku li hevdû disekinîn û li hevdû dirûnihin bi koçeran re, ji wan yên ku navê wî bihîstina û ew bi wê bihîstinê ku êdî weke ku nasdikin derdikevin. Êdî, dema ku ev herdû dibiînin, bi rêzdarîyaka pirr mazin êdî li hevdû xwedî derdikevin. Mihemed, bi gotina xwe ya xweş, hertimî, ku di gotina xwe ya pêşî ya ku got de, dilê mirov li xwe kelegermî dikir. Ew xosletê wî hebû. Dengê wê, hinekî stûr bû lê ne wilqas zêde stûr bû. Ku dema ku diaxift jî, sivik diaxift. zû dihizirî û hinekî jî zû jî diaxift. Ji xwe, weke xoslet û teybetmendiyeka kirmancîya botîyan jî bû ku hinekî gotinên xwe zû digotin û zû diaxiftin. Di kirmanciya botîyan de, ew teybetmendiya hevgirtin(sentez)kirina gotina jî hebû. Bi wê re jî, carna bi dengekî ji dêla ku gotinek bi hat gotin, dikarîn ku du û di hin rewşna de pirtir gotinan jî bi dengekî bigotan.

Mihemed jî, di dema ku ew li nava civatê dirûnihê, ev aliyê wî yê axiftinê pirr baş û xweşik derdikeve li pêş. Lê ku di wê temenê zû hizirkirin û axiftinê de ku gotinên xwe hewl dide ku hêdîka bibêje jî, hingî rewşeka din ya pirr xweşik bi deng re derdiket li holê.

Ji bo ku mirov karibê, di ziman de bi gotinan re hevgirtinê bide çêkirin, divê ku mirov serwer û serdestê ziman û gotinên zimên û kirdeya gotinan a ku gotin bi wan hatîya salixkirî jî bê. Ji vê aliyê ve, ev teybetmendiyna ku di temenê çêkirina hevgirtinê gotinan de na di dema axiftinê de.

Hinekî serdestîya mirov a li ziman, ku di dem a mirov li mijaraka ku ew care pêşî bê ku mirov lê hisand û ankû ku mirov bi tememî lê ne hisandibê jî, mirov wê piştre karibê li ser wê rewşa ku li ser tê axiftin serwerîyê bi têgihiştinê di serê xwe de li ser bide çê kirin. Hinekî jî, li vir serdestîya li gotinan û li kirdeya wan ya hundurîn, wê derfetê bi wê re didêt mirov ku mirov wê êdî bike.

Mihemed, ji van aliyan ve bêkêmesî bû. Ew zêdebûnên wî hebûn lê lêmesîyên wî tûna bûn. Ji ber ku ew serdestê zimanê xwe bû, êdî wî di cih de dikarî serdestîya xwe li pirr rewş û vegotin û ankû rewşên di hatina vegotin di civatan de dide çê kirin. Ew, bi vê yekê, xwediyê serwerî û serdestîyeka keseyetî ya li rewşan bû.

Piştî ku demek dirêj li ser ketina wan ya ji cem konan re, êdî bi hevdû re tevde ku zêde êdî demeka wilo zêde dirêj bi ser ve naçê tên û digihijina Xîzanê. Di dema ku ew tên adahma xîzanê lê ku ew hê ne ketina navendê de, mîr bi xwe bi gelek mirovên li dora wan wan pêşwazî dike. Piştî ku mîr wan pêşwazî kir, piştre êdî bi hevdû re ji dêla ku herîna qasrê diçina mizgevtê û li wir pêşî mêjên xwe dikin û piştre hinekî jî li hevdû dirûnihin û bêhna xwe diberdin û piştre jî, êdî bi hevdû re li ser keremkirin û xwestina mîr di buhurîna li qasrê ku li wir ji bo wan cihekî pirr xweş û xweşik hatîya amede kirin.

Ku ew hatina wir, li wir jî, çendî mirovên zane û alim û derwîş û sofî hebûn, li wir li wan levdigihijina li hevdû. Bi wan re li qasrê bi civatî dirûnihin. Mihemed, navê wî derketîya. Ew yekî ku bi zane ya û di nava alim û zaneyan de êdî ji wî dihê axivîn.

Li qasrê, piştî ku li hevdû dirûnihin, êdî bi hevdû re bidest axiftinê dikin. Di nava civatê de, weke yên mazin gelek mirovên nawserî xwe hena. Her wusa, gelek zane û alimên herêmî jî hena. Ew jî, li wir li wan civîna. BI wan re, li civatê rûniştî na.

Mihemed û kerwane pêre, herî zêde ya li berçav bû. Ew mihvan bûn. Lê herî zêde, Mihemed li berçav bû. Ew mirovê ku wilqasî navê wî derketî bi zanebûna wî re hê wilqasî ne mazin a jî. Dema ku li rûdêna wî dihê nerîn, weke rohniyeka geş li mirov tê. Herkesek, bale wî li ser wî ya. Herkesek li wî dinerê. Mihemed jî, li dora xwe û li mirovên li dora xwe dinerê. Ew jî, bi çavî û nerînî dixwezê ku wan nas bike di mejiyê xwe de.

Mihemed, di wê demê de, dema ku rûniştî bûn, li cihekî ku ne dûrî cihê ku dayimî mîr lê dirûnişt lê rûniştî bû. Ji wir jî, êdî ew bêhtirî li berçav bû. Ew bêhtirî, nerîn û çavê mirovan diçû li ser wî. Mihemed, Bi vê yekê, pirr li berçav bû. Hinekan jî, tenê ku bo ku mereqa xwe bi buhurênin, hema wilo bi bêdengî tenê awirên xwe dabûbûn li ser wî û lê dinerîn.

Wusa, weke demeke dirêj ku heta ku dibê derengîya şevê wê li hevdû li civate hevdû rûnihin bi hevdû re biaxivin. Gotinek ji wî û gotinek ji yê din, wê axiftina xwe bênina heta derengîya şevê. Lê Ew rêwî bûn û hinekî jî wastîyayî bûn. Lê ew jî, weke ku hatibû ji bîr kirin. Herkesekî, xwe li bayê axiftinê û gotinê berda bû. Di axiftinê gih derwîş bi gotinên beytên xwe yên xweş û xweşik diketina dewrê de û digotin û gih jî sofîyan di rahişta arbana xwe bi wan dengê xwe yên xweş û xweşik qasîda ji dora xwe re ji civatê re digotin. Bi vî rengî, rewşeka wan ya pirr xweşik bi civatî afirîbû. Herkesek jî, di wê rewşê de û di gotinê de germ

bûbû. Ji ber wê germbûnê jî, ti kesekê ne dixwest ku bibe yê ku wê rewşe xwe xira bike bi dengê xwe. Ji ber wê jî, êdî herkesek bi bêdengî dima û xwe li bayê gotinê û civatê û domandina wê diberda.

Mihemed jî, car bi car diaxift û dema ku ew diaxift jî kin ne diaxift. Wî li ser mijarekê wê bidest gotin gotinê bike û heta ku wî ya di serê xwe de li ser wê mijarê hemû bi sereka bihanîya ser ziman, diaxift. Ev jî, dibû sedema ku ew pirr dirêj biaxivê. Ma kî wê rabê bêje mihemed ku tû dirêj axiftî. Ji xwe, herkesek hatibû li wî bihisêne. Herkesek jî, ji gotina wî û dengê wî pirr xweş bû. Dengê wî yê bi gotinê û di axiftinê de jî, li mirov wusa dihat ku weke ku wî helbest ji wan re bidil û ji dil dixwand.

Ku rewş hat nîvê şevê, êdî herkesekî bi xwe re farq kir ku êdî dem hatîya û dereng bûya. Lê ti kesekî ne dikir ku gotinê bibêje. Herkesek, çavên wan li ser mîr û Mihemed bûn. Ku gotiba, tenê mîr dikarî di wê rewşê de gotinê bibêje. Lê wusa dihat dîtin û xuyakirin ku li Mîr jî xweş dihat di wê rewşê de, bi gotin bûn û hisandin. JI ber ku hemû zaneyên civate wî di serê xwe de bi zanîna xwe germbûna û êdî di nav de kûr çûna.Her ku dihênin ser ziman jî, pirr xweşik û tiştên xweş dihênin ser ziman.

Piştre ku dem hinekî bi ser derengî ve jî çû, êdî hinekî weke ku bêdengbûn çêbû. Mihemed jî û mîr jî bêdeng bûn. Li ser wê, êdî mîr bibîr xist ku êdî dem bûyar dereng. Ji xwe, berî hingî, cihên ku wê Mihemed, û yên ku pêre hatina wê li kûderê bimênin ew hatiya amedekirin û cihê wan hatîya rayîxistin jî. Piştre, Mîr, dema ku bi bîr xist, piştre çend mirovên ên ên nawserî xwe axiftin û gotin ku ´mêhvan nû ji rêwîtîyê hatina divê ku xwe rehet bikin.´ Li ser wê jî, êdî hin bi hin, hizra belavbûna civat di nava wan de bicih bû. Piştre jî, li ser pêşî gavavêtina mîr, êdî yên din jî gav avêtin û herkesek êdî kare xwe kir ku rabê û herê. Mihvan jî piştre ku civatê xatir xwest û şevbaşî kişand û belav bû û piştre, êdî ew jî çûna ser nivînên xwe ên ku mîr ji wan re dabûbûn amede kirin. Lê Mihemed, dema ku ew çû ser nivînên xwe bixwe jî, ew xew ne ket çavên wî de û wî hinekî dî xwe şîyar hîşt û hinekî hizirî û xwand. Piştre ku wî jî hîs kir ku hinekî wastandin pêre rûda, êdî wî xwe li ser nivînan dirêj kir. Lê piştre ku zêde dem têv neçû, dengê banga sibehê hat û êdî ew jî rabû ser xwe û êdî çû ku herê kare xwe bike û destmêj bigrê bo mêjê.

Mihemed, di wê demê de jî bidest nivîsandinê kiribû. Tûrikekî wî yê ku wî dayimê bi xwe re digirt hebû. Di wî de jî, gelek nivîsên wî yên ku wî nivîsandibûn hebûn.

Mihemed û kerwane pêre wê demeka dirêj li wir bimêne. Piştre jî, ku weke ku li wan hat ku têra xwe mana, wê piştre kare xwe bikin herina bi ber Heskîfê ve. Piştre jî ji wir wê çûban Botanê.

Mihemed û kerwane wî, wê piştre ku demeka dirêj li wir dimênin û êdî ew jî hîs dikin ku êdî divê ku ew herin, êdî wê li civatê dihênin ser ziman. Mihemed, wê bixwe dihêne rojevê. Lê dema ku ew dihêne ser ziman, weke ku xamginîyek di dilê hemû mirovên li dora wî de çêdibêt. Lê ma ka wê çi bikin.? ew jî rêwî bûn.. Wê li wir, demekê maban û piştre çûban Heskîfê. Mîr jî, û yên li dorê jî ew yek dizanîn. Lê ji ber ku hingî li hevdû germ bûn, êdî ew jî weke ku ji bîr kiribûn di wê demê de. Weke ku ne di hiş û aqilê di ti kesekî de bû. Ji xwe, weke ku êdî herkesek li malê, êdî tevdigerîyan û bi wî rengê, hevdû bawer ji kiribûn. Mihemed, piştî ku wan bahse çûyin kir, êdî roja din, mîr, xwest ku amedekarîya pirr mazin ji bo wan were kirin. Bo bi wan re werê şandin û weke hin dîyaryna ku ji şêx re werina şandin, ser sih(30) haspî hûremûr dan amede kirin ku bi wan re bişênin. Mîr, gelek mirov jî dane amede kirin ku heta ku ew herina cihê ku wê herinê de ku bi wan herin. Piştre ku zêde demek dirj têve neçû, êdî dema rêwîtîyê hat. Piştre êdî ku ew roj û kêlîk hat, herkesek jî tê û li ber hevdû disekinê û xatir ji hevdû dixwezê.

Piştî ku xatir ji hevdû dixwezin, piştre êdî mîr, çend sûwaran weke pêşeng dişêne ku herin û agahîya hatina wan di pêşîya wan de bibin. Piştre jî, ew dikevina rê de.

Li heskîfê, Mîrê wir, xwe weke "melik" dihanî ser ziman û herkesekî jî ew wusa dizanî. Ew ne tenê weke mîrekî bû. Ji wê zêdetir, weke xanadakê bû. Eyûbîyan, li wir, rêveberîyeka ku dikarî xwe bigihanda herêmên din jî dabûbû ava kirin. Lê hemû tişt di bin dest û kontrola wan de bû.

Piştî bi demekê re ku ew dikevina rê de û pêşeng dikevina rê de di pêşîya wan de êdî piştre ne bi gelekî re wê pêşen bigihijina Heskîfê û wê agahîya hatina Mihemed û kerwane bi wî re bidin. Piştre jî, wê êdî Melîkê Heskîfê bixwe jî, wê di cih de çend sûwarîyan bide derxistin ku di cih de herin û xwe bigihênina wan û bi wan re werin. Weke ku çawa ku Mîrê Xizanê kir, melikê Heskîfê jî kir. Heskîf, cihekî ku weke pirr mazin bû. BI sadana malên ku ji latan hatibûbûna çêkirin lê hebûn. her wusa, sûk û cihên têre çûyin û hatinê bi xweşikatî hatibûbûna çê kirin. Pirtûkxaneyeka wê ya mazin hebû ku ji cihanê pirr pirtûk têde hebûn.

Kerwane Mihemed û yên pêre, wê piştî gihiştina kome pêşeng ya ku mîr şandibû, piştre ne bi gelekî re wê ew jî bigihijina wir, Ku ew jî

gihiştina li wir, wê êdî gele mirov wê werina û wan pêşwazî bikin. Şêx jî li dergehê ya û êdî ji pîrbûna xwe nikarê zêde rabê ser xwe ku li ser bi gerihê. Yanî, ew êdî bûya komek hastû.

Mihemed û ew, ku ew jî hatin û gihiştin, êdî ku gihiştina yên ku hatin ku wan pêşwazî bikin û ku gihiştina hevdû û ku dest dane hevdû û piştre, êdî dane rex hevdû bi hevdû re ketina rê de ku herina dergehê li cem şêx.

Ku ew hatin û çûna dergahê û ku Şêx bixwe jî, Mihemed dît, weke ku ji nû ve gîyan werîyê de lê hat û dilxweş û kêfxweş bû. Di cih de, dema ku çavên şêx bi wî ket, ew xwest li cem xwe. Mihemed jî, piştî ku Şêx Ew xwest li cem xwe, êdî wî jî di cih de dem winda nekir û di cih de çû û li cem şêx bi xwe rûnişt. Di wê demê de, dilê Mihemed jî li ser hevdû zû bi zû diavêt. Weke ku dilberîyek bi wî re jî hebû. Berî vê carê, care pêşî, ew gelekî bi hevdû re mabûn. BI vê yekê, êdî weke ku bîra hevdû bikin jî li wan hatibû.

Şêx piştî ku ew dîr, pirr dilxweş û kêfxweş bû. Lê Mihemed jî, weke ku hatibû malê lê hatibû. Ew jî di dilê xwe de gihiştibû heman xweşîyê. Piştî ku ew li hevdû rûniştin, êdî weke demekê ew li hevdû rûniştî man û bi hevdû re danûstandin û axiftin.

Mihemed û şêx, di wê demê de weke demeka dirêj li hevdû rûniştî man. Li dora wan jî, bi dehan derwîş, sofî û seyda hebûn. BI wan re jî, gelek mirovên din jî hebûn. Wan jî li wir li wan dihisand. Geleka ji wan Mihemed nas dikir. Lê geleka jî nas nedikir.

Di wê demê de, ji gelek herêmên din, mirovên ku hatibûbûna serdane şêx hebûn. Ji piştî ku hatibû bihîstîn ku şêx hinekî nexweş ketîya, êdî ji qasra eyûbîyan jî gelek alim hatibûn wir û ew jî hê li wir bûn.

Li wir mihemed û Şêx, êdî gihiştibûbûna li hevdû. Êdî wî jî bi hevdû re bûn. Dibêt ku ew care dawî bû ku wê Mihemed û şêx hevdû bidîtîna.

Mihemed, piştî ku ew û kerwane ku pêre ku hatibûn û gihiştibûbûna wir, êdî di cih de tevlî jîyane wir bûbûn. Mihemed, piştî ku Şêx Ew xwestibû li cem xwe êdî ew jî çûbû bû û li cem şêx rûniştîbû. Ji hingî ve, ew li cem şêx rûnîştîya û ne rabûya ser xwe. Çavên mirovên li dorê jî li ser wî û şêc herdûyan in. Lê Mihemed, divê ku mirov bibêje ku ew bixwe jî dihizirê.

Şêx, wê carê bala xwe dide ser Mihemed. Lê dinerê. Jê û ji hal û tevgerên wî fahm dike ku ew guharî ya. Di tevger û gavavêtin û axiftina xwe de pirr biheyîder a. Ew yek, ji bale û heya şêx narevê. Mirovên din ên li dorê, ji xwe pirr ji wan jî ne yên berê ku Mihemed ew dîtina. Lê pirranîya wan jî ew in. Gelek ji wan jî, pîr û nawserî xwe na. Di dema ku Berê

Mihemed li wir bû, Ew jî li vir bûn. Lê nûha jî, li wir in lê bi farqekê. Ew farq jî, her wusa ew bû ku hinekî di nava salan de çûbû bûn û êdî hinekî pîr jî bûbûn. Kalbûnê, bi wan re xwe dabû der.

Mihemed jî, ne ew mihemedê berê ê ciwan ku xwûn di rayên wî de zû diçû û dihat. Ew jî, bûya mirovekî naserî xwe. Weke ku wan mirovan, hemûyan cihê temenê xwe yê dema berê ji Mihemed re hiştibû û ew buhurtibûbûna li temenekî dîn ê pîrbûnê û kal bû bûn. Mihemed jî, hinekî nawserî xwe bûbû û bi ber wî temenê wan yê berê ku ew têdebûn ve çûbû bû. Rewş, hinekî bi vî rengî li berçav bû. Herkesek jî, ne tenê mihemed, Her wusa, mirovên din ên li dorê jî, dema ku gotina xwe digotin, di deng û leze gotin gotina wan de, weke ku giranbûnek hebû. Mihemed jî, ne weke berê ku di dema ciwanîya xwe de bû. Ew jî, hinekî mazin bûbû bû. Gihiştibûbû temenekî din. Li ser wî temenî re, êdî di nava civate de, wî jî cih bi cih gotinên digotin. Di dema ku wî gotinên digotin, pirr mirovên ku ji berê ve wî nas kirin, wusa bi hizir û hazn ku çavên xwe li wî raq kiribûn, li wî nerin. Weke ku bibêjin. ´meyizêne, ew cûwan çûya û li cihê wî alim û zaneyekî mazin hatîya û bicih bûya.´

Ku mirov di nava salan de çû, mirov hin bi hin, weke ku pêşîyên me gotibûn, em dunyê hê baştir hizir dikirin û fahm dikin. Hinekî dî bêhtirî heya mirov ji dunyê çêdibe. Hinekî dî bêhtirî mirov dûnyê fahm dike. Her dem û rewşa ku mirov ew jîya, ew di serê mirov de weke hişekê û têgihiştinekê jî heya.

Mihemed jî, pirr buhurandibû. Ew, êdî ne tenê mirovekî ku ji rêzê bû. Wî, dunya û hewirdora xwe şîrove dikir û bi aqil jî dihanî ser ziman. BI aqilê xwe jî, rê şanî mirovan dide. Ev yekî, wusa bû. Zimanekî wî yê "fesih" jî hebû. Di gotinên xwe de bi fahm û serketî bû. Têgihiştina wî li pêş bû. Pêşî dihizirî û gotina xwe diserê xwe de safî û zelal dikir ku ka wê li ser çi û çawa biaxivê û piştre bidest axiftinê dikir. weke ku pêşîyan digot, wî," li paşî û pêşîya gotina xwe hizir dikir û piştre dikir.".

Dem jî diherikî. Dem, weke pêşîyê me gotina, weke xwe namêne. Hertimî di herikînekê de ya û ku çû û buhurt jî wê ji me û ji dema pirr tiştan jî bi xwe re bibe.´

Di wê demê de, Şêx û gelek alimên din ên li dorê, bi hevdû re ketibûbûna danûstandinê de. Mihemed jî, vê carê bi wan re ketibû nava danûstandinê. Vê carê, ew jî, weke yek ji wan, bi wan re di nava danûstandinê de bû. Bi wê re, wî jî gotina xwe dipîva û piştre digot. Gotina xwe bi zanebûn digot. Yê ku li gotina wî dihisand, di zanê ku ew ciwanê berê êdî mazin bûya û êdî bizane bûya û gotinên xwe bi zanebûn

li her hemû alim û zaneyan dibêje. Berî hertiştî, weke ku pêşîyan gotiya, ´divê ku mirov karibê gotina bi zane bibêhe.´ Wî, êdî karîbû ku wê gotina bizane bibêje. Farqê vê naqlê ku ew li wir bû û farqe naqla din ku ew li wir bû, ev bû. Bi temen, dem û zanebûnê û girtina wê re ew farq hebû.

De ne, dema ku çend zane li hevdû rûniştin û gotin ji hevdû re li ber hevdû gotin, wê ew êdî wê gotina hevdû ya ku li hevdû gotina, wê bipîvîn û fahm bikin. Piştre jî, wê li ser wê re gotinê ji hevdû re bibêjin û aqilê hevdû bi wê fahm bikin. Wan jî, di wê demê de wusa dikir. Piştî ku Mirovên li civate û ku Mihemed jî di nav de ku bi hevdû re bidest axiftinê kiribûn, pêşî şêx jî di nav de bû. Lê ku axiftin û danûstandin ku hinekî dî dirêj çûbû bû, êdî şêx weke ku hinekî bêdeng mabû û hey û bale xwe dabûbû ser Mihemed û lê dinerî û li gotînên wî dihizirî. Bi aşqekê li wî dinerî. Kêfa wî jî, weke ku dihat dema ku Mihemed wusa bi gotin û bizane didît.

Wê rewşê heta demeka deren domand. Piştre ku demand, Piştre, êdî civat jev belav bû û Mihemed û Şêx Hinekî dîn li hevdû man. Wan jî, bi hevdû re, hinek gotinên din ji hevdû re kirin. Lê piştre, wan jî wilo zêde ne domand. Ji ber ku şêx weke ku hinekî ne baş bû.

Mihemed, piştî ku şêx hinekî xwe dirêj kir, êdî wî jî çû û li konçikekê rûnişt û bidest hizirkirin û xwandina xwe kir. Ew jî di ser xwe de, êdî çû û ku ka çû kûderê.

Wusa demekê domand. Mihemed, di serê xwe de, pirr tişt di hizir in. Diserê wî de, gelek tiştên ku ew li ser bihizirê hebûn. Mihemed, li ser demên berê dihizirî. Weke ku bîrkirinek pêre rûda bû bû. Ev yek, weke ku pêre xwe dide li der. Lê Mihemed, weke ku ne di wê rewşê de jî bê, dikir ku li xwe neyêne der ku ew ketîya bîrkirinê de. Wî dikir ku rewşeka ku bi vî rengî ji rûdêna wî were xwestin, weke ku ne dixwest ku rewşeka bi wî rengî ji rûdêna wî were xwandin. Bi wê yekê, weke ku hinekî li berxwe dide.

Mihemed, vê carê li Çem Şêx Zêde mena. Lê berî ku ew ji herin jî, şêx ketibû ber zikiretan de. Êdî piştre ne bi gelekî re Şêx jî çûbû ber dilovaniya xwe. Êdî Mihemed jî, heta ku çilê şêx derneket, ew jî ji wir nevaqatîya. Piştî ku çilê şêx derket, êdî ew jî ji wir vaqatîya.

Wê carê, dema ku Mihemed, ji wir cûda bû, êdî rastûrast, bi kerwaneke ku Melik jî çend sûwarî kiribûbûna rex wê de, ketibûbûna ser rê de ku werina Cizîra Bota.

Mihemed, ew gelek sal bûn ku ew ji Cîzîra bota derketibû. Li gele deveran gerîya bû. Çûbû bû, gelek deveran. Li wan deveran mabû bû. Li

wanderan bi heyvan û salan mabû bû. Lê piştre, piştî wanqas salan ku ew gerî, dîsa xwûdayê wî, rêya wî bi Cîzîra bota ve kir.

Mihemed, piştî ku ew ketina rê de, êdî piştre, demeka dirêj, ew di rê de dimênin. Li ser rê jî, wê rêya wan bi gelek deveran bikeve. Wê li gelek deveran bi kerwana xwe re wê bibe mêhvan. Bi vî rengî, ew wê demeka dirêj, vê carê di rê de bimênin. Hinekî jî, ew wê rêya xwe dûr û dirêj bikin. Bi wê re jî, wê bi demê re derengtir bixin.

Mihemed, piştî ku çû Cîzîra Bota û piştre jî, wê ji Cîzîra bota li herêmê û li hewirdora wê wê gerênên wî bibîn. Lê di vê vegerîna xwe de jî wî, gerek weke wan ger û geştên xwe yên ku wê piştre bikira, kiribû.

Mihmed, piştî ku hat û gihişt nêzî Cizîra bota, weke ku çawa ku çûbû bû Xîzanê û piştre hatibû Heskîfê û hwd, ku berî agahîya hatîna wî gihiştîbû Cizîra bota û qasre Mîrê Bota bixwe jî. Di wê dema ku agahî gihişt wir, êdî weke ku li bendê bin, mîr bi gelek mirovên li dora xwe de, lê li ser rê wan pêşwazî dike.

De ne, heçîka mîrê bota ya, bi nav û qûdret û şerefe wî re pirr bi nav û deng a. Ew bi hesanî ji qasra ji nava civate xwe ya ku herdayimî li dar a dernekeve û naçê ti deran. Lê ku ew rabû û çû ji navê, hingî jî dihê zanîn ku ew tiştekî pirr mazin, i qadir û qiymet û hêjaya ku heta ku mîrê bota bixwe jî ji cihê xwe dirabê û diçê û hê ku li dervî Cîzîra bota lê di nava tixûbê Cîzîra bota de, wî pêşwazî dike. Ev yek, êdî wê bê nav û deng. ..

Mihemed, dema ku ew hatin li ber ketina nava bajêr de rastî mîr û koma mirovan a li dora wî hatin û û piştre berê xwe dane hevdû. De ne, hê ku ji dema bavê mîr di domîya, çêkirina avahîya mazin ya Medreseya Sor didoma. Di dema mîrê wê demê de, kevirê dawiyê hatibû lê xistin û bi dawî kirin. Pirr jî xweşik hatibû, çê kirin.

Dema ku gihiştina hevdû, êdî hevdû nas kirin. Piştre silev dane hevdû û çûna dest û rûyê hevdû. Piştre jî, Mîr û Mihemed bi hevdû re dane rex hevdû û ketina pêşîya civatê de bi hevdû re berê xwe dane biber qasrê de. Lê Mihemed, gotibû ku em pêşî herina Mizgevtê û piştre herin. Piştre, herkesekî ev herê kiribû.

Di dema ku dihat, hem dihatin û hem jî bi hevdû re diaxiftin. Mihemed, bi çavekî ku di bin awirên xwe re li dora xwe dinerî û di xwest ku ka piştî wî re çi guharîn bûya. Lê li aliyê din jî, heya wî li dora wî û li mîr bû û li axiftina wan û ya bi wan re bû.

Weke demekê, bi axiftinê, hatin û gihiştina ber mizgevtê. Lê di wê demê de gihiştina ber medresaya Sor jî. Mihemed, Medreseya Sor, pirr heya wî çû ser wê. Piştre bi tememî heya xwe da ser. Di wê dema ku

Mihemed bi tememî heya xwe da li ser, heya mîr û mirovên li dorê jî hatina ser Mihemed û lê nerîn. Lê Mihemed, weke ku xwe winda bike lê hat ji kêf û aşqa. Pirr kêfa wî hat. Di wê demê de, Mihemed, weke demeke dirêj, lê dinerî, Bi nerînê re jî dimeşîn. Dema ku hatina dehma deriyê wê yê ku têre bikevina hundur de, êdî dîtin ku wa mirov dikevinê û derdikevin. Mihemed, pirr kêfa wî hatibû. Ku wî Medreseya Sor dît û ku bi meşînê û nerîn ku hatina ber deve dêrî, li wir sekinî bûn. Mîr jî, û hemû mirovên din jî, bêdeng heya wan li mîr û Mihemed bû. Lê heya mîr jî, li Mihemed bû. Mihemed, di wê demê de ku berê xwe da mîr û pêşî gotiyê de, "Mîrê min rehme li dê û bavê te, te pirr xweşîk çêkiriya. Ev berhema te ya ku te çêkir. Ji dema bavê te ve ya. Lê mîrê min, çend kevirên wê kêm in, ew jî li min dikevin ku ez wan dênima ser hevdû. "

Mihemed, wusa got, êdî mîr jî rehme li miriyên wî kir û spasî bo wê dilxweşî û gotinên wî yên xweş kir. Lê tiştek di serê mîr de weke pirsekê ma. Ew jî, ew bû ku dema ku Mihemed axift, wî gotibû, "çend, kevir mana, ew jî li min dikevin ku ez wan dênima ser hevdû." Li kûdera wê, wî ev kevir dîtibûn ku ne li ser hevdû. Piştî ku bi hevdû re ketina hundur de. Mîr cih ji Mihemed re berda ku ew pêşî herê. Lê piştî ku ew buhurtîna hundur. Mîr, di cih de, ji çend mirovên li dora xwe re got, "herîn, bigerin, ewder kûdera ku çend kevir mana ne li ser hevdû, bibînin û win ne dênina ser hevdû û werina ji min re bêjin, êdî werin û bidestê xwe dênima ser hevdû." Piştî ku mîr jî, wusa got, êdî cih de, bi dehan mirov, ketina lêgerînê de ku bibînin ku ka weke ku Mihemed gotî ku ka li kûderê ew çend kevir kêm mana.

Piştre jî, ku dipêşîyê de Mîr û Mihemed bi hevdû re ketina hundur û pêşî mêj û dûaya xwe kirin û piştre di hundurê Medrseyê de di wê cihê ku weke dîwan**ê** ya, û pirr mazin a, li wir, bi hevdû re rûniştin in. Ewder, pirr mazin bû. Pirr jî vekirî bû. Gelek stûn hebûn ku di navê de ku ew li ser lingan digirtin weke ramz.

Piştî ku li hevdû rûniştîn, êdî bi hevdû re bidest axiftinê kirin. Li ser pirr tişt û rewşan axiftin. Gelekî jî, ji demên berê axiftin û ji hevdû re hanîn ser ziman. Yê wan jî, gelek tiştên wan ên ku wê wan ji hevdû re bigota û ku gotiban hebûn. Ji ber vê yekê, çendî ku axiftiban jî, wê xilas nebûban ew tiştên ku wan ji hevdû re bigotan. Mîr jî weke yekî serek li pêş bû û diaxift. Lê di kevîya mejiyê wî de jî ku li ser dihizirî ew gotina Mihemed hebû. Wî jî, ji Mihemed, ne pirsî bû û tenê ji gelek mirovan re gotibû ku herîn û wê kêmesîyê bib**înin**. Mihemed jî û Mîr jî, di wê demê yên ku zêde diaxiftin bûn. Lê bi wan re gelek mirovên ku kal û ku gotina

wan pirr giran bû jî hebûn li wir û ew jî bi wan re diaxiftin. Pirranîya mirovên din ên bi wan re jî xwe dabûbûna hisandina li wan.

Danûstandin û axiftinên wan, weke demeke dirîj bi hevdû re domand. Mîr, di wê demê de bi axiftinên dirêj ne diaxift. her dem û care ku diaxift, wî axiftina kin digirt û kin dibirrî. Ev yek, weke ku bale Mihemed jî û mirovên li Dorê jî kişand. Lê wan jî, tiştek ne de li der. Mihemed jî, ev yek bi mîr re farq kir. Wî, farq ku mîr, weke ku di serî wê de tiştek heya û bi wê ne rehet a. Her wusa, mirovên li dora wî jî, ev yek farq kirin. Lê yekî jî ji wan, di xwe de ne dît ku wê ji mîr bipirsin ku ka çî ya id serî wî de. Ji xwe di nava rewşeka bi wî rengî ku mirov diaxivin, axiftina wan birrîn û pirrin, ne ji bo mîr dibû rêz û hûrmet û ne jî ji bo yê ku bipirsê. Yekî ji wan mirovên gotingiran, ku bixwesta ku bipirsîya jî, divîya bû ku li bendê demeka baş ku derfet di wê de ji bo pirsînê heba. Di wê demê de, di dema ku civatê de li ser tiştekî were axiftin û yek rabê di cih de gotinê bike û tiştekî ku ne di çerçova mijara ku diaxivin de ku bipirsê û mijarê û axiftina jev belav bike, ev wê bê bêrêzîyek li ber hemûyan. Wê ev bêrêzî, ne tenê li ber mîr ba. Wê li ber hemûyan ba. Di civatan de û di dema axiftinê de, wê çawa gav were avêtin, ew jî tore û kevneşopîyên civatîyê bûn. Civat, gelek kevneşopî û destûrên weke kevneşopî, ku ti carî pêl wan nayê kirin bo wê hena. Ev, kevneşopî jî, hanîna wan li cih, bo civatê weke rêz û rûmeteka. Di civate de, di dema ku lê hat rûniştin, biqasî li yên ku di li hevdû ku rûniştî na ku li zanebûna hevdû bi heyîder in û hevdû dişopênin, her wusa biqasî wê, cihê ku civat lê rûniştîya, ew kevneşopîyên wê çendî tên li cih jî, ew jî di berçav tê buhurandin.

Civate mîran, û ankû civate ku lê mîr rûniştî na, her wusa ev yek, weke destûreka civatê ya zêr a ku li berçav dihê girtin a. Ji ber vê yekê, herdemê bahse civatên qasra mîr dihê kirin. Ne tenê, ji ber ku ew mîr û serokê civatê ya. Her wusa, van aliyan jî, li berçav digrin. Di her civate de, vê ev yek wusa bê.

Dema ku yek çû civate mîr, wê hertimî jê were pirsîn ku ka ew çawa li civate wî hat pêşwazî kirin. Bi wê re jî, ku kêmesîyek hatibê kirin û ku wî dîtibê, ew ku di kîjan civatê de vêşarî bimêne jî, wê di civate mîr û ya qasra wî de, vêşarî nemêne.

Vêca ku yekî weke mîrê bota bê, her wusa ev yek, hê zêdetir, divê ku em bibêjin ku wê li pêş û li berçav bê. Civate mîrê botan, hertimî li dar a. Ji ti aliyê, kêmesî têde tûna na. Ew, bi her aliyê ve di nêzîkatîya xwe, bê kêmesî tevdigerihê.

Ev yek, her wusa, li kurdistanê bi navê mîrê bota re, weke rûmeta wî, herkesek wê dizanê û li pêş a. Yekî ku navê civate mîrê botan ne bihîstî tûna ya. Mîrê bota, her wusa, divê ku em bibêjin ku weke keyê kurdistanê bi wê kevneşopî û destûrên xwe yên kevneşopî re heya.

Car bi car, bahse ´pîremîd´ên misrê´ tên kirin. Mazinahîya wan di dema firwûnan de çûbû û çiqasî bi nav û deng in î ro, ew pirr baş tê zanîn. Giringiya wan pîremîdan, li kurdistanê, ti carî dernekeve li ser wê wê kevneşopîya mîrê bota re.

Di wê demê de, û di demên berê de jî, Cîzîra bota, giirngiya wê hertimî hebûya. Heta ku ez divê ku ez bibêjim ku di dema Gûtîyan de ku weke kalkên kurdan tên zanîn û berî zayîna Îsa ser du hezar salan re jîyane, ev der ji xwe re kirina weke paytaxt. Evder, ji bo wan, weke navendeka giring bû. Piştre ku bi sadsalan, ew serdestîya xwe li herêmê didina domandin jî, ew giringîya wê hertimî xwe û hebûna xwe dide parastin. Mîrê Botan, ew giringî, dîtîya û fahm kiriya. Her kurd û ankû her mirovê herêmê jî, wê bi giringiyê bi navê mîrî û nava civate wî jî dizanin. ..

Mîr û Mihemed û mirovên li dora wan, ku li hundur li hevdû rûnihştî bi hevdû re diaxivin. Civate wan li dar a. Bi wê re jî, ew jî di nava axiftinê de germ bûna. Lê tevî ew germbûn bûya jî, mîr, ne rehet a. Ew yek, ji rewş û tevgerên wî dihê dîtin û xûyakirin. Wî çend mirov şandin li hewirdorê ku binerin ku ka li kuderê kêmesî maya. Li kuderê kevir li ser hevdû nîn in, ku bibînin. Mîr, ji aliyekîkî ve, weke ku çavê wî li devê dêrî jî ya. ku yek ji wan ket hundur de, ew jî wê biheta wê wate ku wan dîtîya û kifşkiriya ku ka kûder têde kêmesî heya. Lê heya wê kêlîkê, ji mirovên ku wî şandibûn jî, yek jî ji wan ne hatibû û ne ketibû hindûr de. **Ew** jî li bendê bû ku wê yek bi heta û jê re bigota ku ka kûderê têde kêmesî heya**.** ..

Ew demek dirêj bû ku Mihemed, mîr û mirovên bi wan re ku li hevdû rûniştîbûn û bi hevdû re diaxiftin. Pirranîya mirovên li weke ku xwe di nava axiftinê de windakiribûn li wan hatibû. Bi wî rengî, ew jî dijîn. Mihemed jî, diaxift. Mihemed, lê heya wî çûbû bû ser mîr û wî ew rewşa bi mîr re kifşkiribû. Lê wî, tiştek ne de li der. Piştre weke ku tiştekî neyî, wî xwe dabûbû axiftina xwe ya bi mirovên li dora xwe re. Mîr jî, car bi car diaxift. Lê her carê jî, wî axiftina kort digirt. Zêde, dirêj ne dikir. Ji ber ku hinekî jî, hişê wî weke ku ne li wir bû.

Bi wê re wê, weke demeke buhurt. Deng ji yên li derve ku wê hatiban û agahî gihaniban mîr ne hat. Mîr jî, bi wî re, çend ku çend ku dem di buhurt, wî ew ne rehetîya xwe biawayekî vekirî bêhtirî weke ku dide li

der. Li dora wî, gelek mirov hebûn ku di axiftin. Mihemed jî, di wê demê de diaxift û yê ku herî zêde hey li ser bûn.

Ku dem wusa hinekî din jî di buhurê, êdî piştre di mirov bihevdû re dikevina hundur de. Herdû jî, mîr wan kifş dike. Herdû mirovên ku ketibûbûna hundur de, yên ku mîr şandibûn ku herin bigerihin ku ka li kûderê kêmasî maya. Ew hatibûbûna li hundur. Bêgûman, nûha wan dîtibû ku ka kêmesî li kudûrê ya. Mîr jî, ev yek di serê wî de buhurt. Mîr jî, ev yek hizir kir. Lê mîr, di wê demê de deynekir. Lê mirovên ku hatin û li hundur rûniştin, çûn û li nêzî mîr rûnişt in. Lê xwe zêde nêzî mîr nekirin. Di wê demê de, nikaribûn ku herin û li ber gihê mîr bisekin in di guhê wî de gotinê bibêjin. Ji xwe ev yek, ne li gorî şop û kevneşopîya civatê jî bû. Weke bêrêzîyekê ba. Ji ber vê yekê û ji ber ku wan jî, ev yek dizanî, êdî ev yek nekirin. Çûn û tenê di cihê xwe de rûniştin û weke ku li bendê dem û ankû firsandeka ku karibin gotinê bigihênina mîr sekinîn. Bi wî rengî, demek buhurt. ..

Mîr jî, mereq dikir di cihê xwe de ku ka wan li kûdêr kifşkiriya ku ka li kûderê kêmesî hatîya dîtin. Ji ber vê yekê, ew jî ne rehet. Bi vî rengî, hema bêja heta demeka ku nêzî rabûna civatê man. Di wê dema dawiyê de jî, mîr weke ku hêvî dikir ku wê firsandek dîtiban ku ji wî re bihata gotin.

Lê di wê demê de jî, mîr ew firsand ne dît. Piştre ku dem hat ber rabûnê, êdî di pêşengîya mîr û Mihemed de bi hevdû re rabûn. Di dema ku rabûn de, mirovê ku hatibû, di rex wî de sekinî bû û piştre bi çend peyvan rewş regihand li Mîr ku "me ti ti der û dever, bi kêmesî ne dît." Lê ev yek, êdî hê bêhtirî bi mîr re bû sedema nexweşbûnekî bi wî re.

Piştre bi hevdû re rabûn û çûn û mêjên xwe kirin û karên xwe bergê bi dawî kirin, êdî mîr herkesek da dora xwe bi hevdû re hatina qasra mîrê bota ku bi nav û deng. Ku hatina qsrê, êdî bi pêşwazîyeka pirr ji dil û xweşik ew hatina pêşwazî kirin. Piştre bi hevdû re buhurtina li hundur û çûna cihê ku wê lê rûniştiban. Lê hê jî, ew ne rehetîya mîr ji rûyê wî jî dihat xwandin. Lê yekî jî heta wê kêlîkê, di xwe de ne dîtibû ku sedema w bipirsê. Pirranîya mirovên li dorê jî ew yek pêre kifşkirin. Li qasrê jî ku rûniştin û civate xwe li dar xistin. Piştre, êdî ku hinekî rûniştin, êdî cih de xwarin hat bi ber wan. Çend mirovên ku sûxretî dikirin, di cih de sofre li ber van vekirin û danîn.

Piştre jî, xwarina wan hat û bi hevdû re ku xwarin bi tememî hat danîn ser sofrê, êdî bi hevdû re li ser dane keremkirinê a ji aliyê mîr ve, êdî bi hevdû re xwe li dora sofrê dane hevdû û civandin û bi hevdû re

bidest xwarina xwe kirin. Li ser xwarinê jî car bi car deng dihat in. Ku ji mîr ba û ji Mihemed ba û an jî ji hinek mirovên din ba, deng dihat û diaxiftin. Lê zêde ne di axiftin. Piştî ku xwarina xwe xwarin, êdî wê axiftin bi hevdû re û bi rehetî. Demek ku zêde ne dirêj ku têve çû, êdî xwarina xwe bi efîyetî xwarin û bidawî kirin û piştre ku xwarina xwe xwarin êdî xwe ji ser sofrê bi şûn ve vekişandin û êdî sofra jî ji aliyê çend mirovên ku sofre danîbûn ve hat berhevkirin û hilandin.. Piştî ku sofra hat hildan û ku hê bi zêeyî axiftina wan dest pê nekirî, hin bi hin yek bi yek gotin di berhevdû de dikirin û û di gotin. Mihemed jî di wê navberê de çend gotin gotin ji axiftinên ku bûn. Lê hê wusa zêde bi axiftinî civate wan dest pê nekiribû. Lê êdî ku li ber bidest axiftinê bûn û ku hê dest pê kiribûn, Mihemed êdî ji dêla herkesek li dorê ji mîr pirsî ku ka ji ber çi weke ku hinekî ne rehet a, ka di serî wî de çi heya ku li ser dihizirê.
Di wê demê de, mîr jî, êdî li ser pirsînê ya di serê xwe de rastûrast got ji Mihemed û mirovên dora xwe re û Mîr weha û bi van gotinan dawî li axiftina xwe hanî;

" .. Seydeyê min, dema ku di dema ku em diketin meresê de tê got ku Pir xweşik bûya û lê çend kevirên mana ew jî li min dikevin ku ez dênima ser hevdû. Piştî ku te ev got, min jî çend mirov di cih de şandina li hewirdorê ku kifş bikin ku ka li kudûrê ku ka ew kevir mana û ne hatina danîn li ser hevdû. Min ji yên ku min şandin re got ku ´dema ku we dît ku ewder kûdera, tenê kifş bikin û werina agahiyê bidin min û ji min re bêjin, ezê werim û bidestê xwe wêderê temem bikim. Vê seydeyê min, min çend mirov şandin û ew der ne dîtin, vêca deka tû ji min re bibêje ku ez herim û wan keviran dênima ser hevdû. .."

Ku mîr wusa got, êdî Mihemed hinekî sekinê bi bêdengî. Bi rengekîwusa bêdeng ma ku weke ku di xwest ku di serê xwe de gotinên xwe yên ku bibêje li hevdû bide hevdû. Mirovên li dorê hemû jî bêdeng bûn û tenê çavên wan li mîr û li Mihemed bû. Piştre, Mihemed, ne hişt ku zêde dem li ser wê bêdengîyê herê û bi buhurê û di cih de mafê gotinê girt û ji min re û ji mirovên dora xwe ev gotin hanîna ser ziman;

"Mîrê min, rast a, min ew gotin got. Lê min ne di wê wateya ku te fahmkirî de got. Ez divê ku bibêjin cardin rehma li hemû miriyên te û kalkên de ku ew wusa xwşik û sipahî temem kirîya. Lê mirê min, min di wate demê û aqil de ev gotina xwe gotîya. Vêca nûha ezê li ser wê çend gotinan ji tere û ji mirovên li dora me re bibêjim ku fahm bikin..."

"Ne tu dizanê ku ji demên bav û bavkalkên me ve ev der, hertimî bûya male zanîn û aqil. Ji ber deverên kurdistanê mirov tên vir û hinekî jê

digrin. Ev der, weke cihekî mazin ê pîroz a. Tenê ku ez bahse nirxên me yên weke Nebî Nûh bikim ku li vir in cih in û ji vir in, ezê bi rojan ji tere biaxivim. Lê ji ber ku tû hemû yên hazir û guhdar dikin vê dizanin, ez li ser wê nasekinim. Lê î ro, bi sed hezaran pirtûk û berhem li vir bicih in. Hemû vir û ên xwûdê na. .."

"Vêca ez werima ser wê gotina xwe, min di vê wateyê de got. Ev medresa, wê bi hezaran zaro û ciwan lê bixwênin. Êdî ez jî, ya ku li min dikeve tiştekî nû bi aqilê demê re têde bicih bikim. Di wê vê de min ev gotin got. .."

Ku di dawîya gotina xwe de Mihemed got ku "Êdî ez jî, ya ku li min dikeve tiştekî nû bi aqilê demê re têde bicih bikim. Di wê vê de min ev gotin got. .." ku Mihemed ev gotin got, êdî weke ku hat fahm kirin ku wî di çi wateyê de ew gotina xwe gotibû hatibû fahm kirin. Êdî, piştî wê bersiva Mihemed re, weke ku mîr jî, hinekî di xwe de rehet bûbû. Ya ku dihat li berçav di wî de ev bû. Weke ku bêhnekê ji dil û ji kûrehîya dilê xwe bikişêne lê hatibû. Piştre jî, hinekî jî, weke ku beşîşbûnekê rûdêna wî girtibû. Ew beşîşbûn, ji wê dilbûna wî û rehetbûna dilîya wî hatibû û li rûyê wî dabû.

De ne, carna, ku mirov ji tiştekî kêfxweş û dilxweş bû, beşîşbûn ji dil mirov re çê dibe. Beşîşbûn, nîşanaka xweşî û rehetîya dilê mirov a. Dil rehetî, bi mirov re ji wê dilxweşîyê beşîşbûnê dikarê bi mirov re bide çê kirin.

Piştre jî, êdî Mihemed, hinekî ji wê gotina xwe domandibû û ji zanînê axiftibû. Bahse zanînê kiribû. Bi teybetî li ser fahmbûnê û fahmkirina mirov sekinî bû. Mihemed, li ser vê yekê, di xwe de pirr dihizirî. Wî giringî û hêjabûn, pirr dide fahmkirinê. Mihemed, di vê temenê de, divê ku mirov bi teybetî li ser wî bisekinê. Ji ber ku ew bi teybetî, xwediyê nêzîkatîya teybet ya bi aqil û aqilane ya.

Li ser fahmkirinê û zû fahm kirinê û mirov wê çawa karibê di hiş xwe de bigrê, li ser wê jî, wî serî wastandîya. De ne, weke bawerîyekê ya, ku tê bawer kirin ku "kurd, zû bi zû tiştan ji bîr nakin." Ev gotin, weke gotinaka ku weke navê wan bi wan re hatîya ser ziman a.Mihemed jî yekî wusa bû. Wî jî, dikarî pirr di aqilê xwe bigrê. Mihemed, teybetmendiya wî ya ku piştre pirr jî ku xwe dabû li der bi wî re, ew bû ku wî pirr hij axiftinê dikir. Her wusa, li ser aqil û demên berê, pirr diaxiftin di temenê danûstandinê. Ew danûstandina ku dikir jî, hem gotinên xwe û hem jî gotinên yêm hemberê xwe jibîr nekir. Di hişê xwe de digirt. Biwê yekê, ew pirr hatibûbû nasîn.

Lê aliyekî wî yê pirr giring hebû. Ew jî, her wusa ew bû ku wî giringî dide fahm kirinê. Mihemed, di temenê hizirkirina xwe de hizir dikir û bawer dikir ku mirov bi awayekê rakendî ku ji dê û bav di buhurê li zaroyan, zanebûneka mirov ya bingihîn jî heya. Lê wî bawer dikir ku em, em çendî ku di jîyanê de dikarin ku bijîn û navarokê tişî bikin. Yanî, di temenê wê de dihanî ser ziman ku weke darêjkê bi mirov heya û mirov bi bi wan çerçoveyên zanî ên ku gihiştin me re, em dikarin pêş bikevin. Li gorî wî, navarok, mirov kengî dijî, wê tişî dike. Lê ev jî bi wî re hebû û wî digot ku "mirov ew darêjka ku heyî, divê ku herê bike ku wê rengekê wê jî hebê ku awa û şekl bide pêşketin û hizirkirina me." Ev gotin, li ser navê wî dihê ser ziman.

Mihemed, bi aqil, wê kifşkirîya.Li gorî wî, "aqilê mirov, ne çerçova jîyane mirov a, lê çerçova jîyane mirov wê ew çerçoveyê bide afirandin." Bi wê re jî, zanîn, weke raman û jîra navaroka wê ya ku mirov bi wê dijî dihêne ser ziman. Navarok, bi raman û jîrê ku bû, hingî wê bingehê gotina hişkirinê biafirêne."

Wî, gotinên aqil, ên weke ´rastteqînî´, ´raman´, ´hiş´, ´zanîn´ û hwd, weke gotinna bingîhîn ên ku divê ku mirov têkiliya nava wan kifş bike û bi wê re jî li jîyane binerê. Dîrok, wî bi têgihiştineka ku bi hev ve û hiyererşîkî didît. Her wusa bandûra tiştan li hevdû ku di dema têkilîyê û hwd **de bê, wî hewl daya ku li ser wan bisekinê**. ..

Mihemed, li ser aqil pirr disekinî. Wê aqil, weke rêyeka ku mirov dikarê bi wê re jîyane xwe û hewirdora xwe baş û qanc fahm bike didît. Bi wê re jî, wî di got ku "bo ku mirov di rêya rastteqîniyê de bimeşê û rast bimeşê jî, aqil ji mirov re pêwîsta." Mihemed, bawer dikir ku "aqil, hin bi hin pêde diçê û bi xwe re pêde dibê." Yanî, aqil pêş dikeve û bi xwe re mirov jî pêş dixe.

Di dema ku bahse dîrokê dikir jî, her wusa, di got ku "hemû di jîyane me de ya. Jîyan yek a." Bi gotina "jîyane yek a" jî, dixwest ku bibêje ku jîyane bi hev ve ya û ne qat bi qat a ku mirov jevcuda bêne ser ziman.

Aqil, hertimî, rêyeka ku mirov di wê de di jîyane de dimeşê ya. Bi we re jî, mirov ku di jîyane de pêde diçê ya. Jîyan, rastîyek a. Em jî, weke rastiyekê di wê rastiyê de na. Em, di wê de jîyîn. Yanî, bi gotinaka din "rastî di rastiyê de dijî."

Mihemed, wê demê di civate mîr de, demeka dirêj diaxivin û ji hevdû re dihênin ser ziman. Li ser gelek tiştan dihênin ser ziman. Ji wê dema ku Mihemed ji Cizîra Bota çûbû bû û heta wê kêlîkê, Mihemed li gelek deveran gerîya bû. ger û geşteka wî ya demdirêj bûbû. Piştre jî, weke ku

wî digot, êdî "xwûdê, rêya wî, cardin bi wir xistibû."

De ne, dema ku bahse Cizîra bota hat kirin, divê ku mirov bibêje ku li wir, di wê demê de jî, pirr zane hebûn ku ji pirr deveran hatibûn. Gelek zaneyên ji ku Kirmaşanê, Dînwerê, Xorasanê, Ûrmîyê, Hewlêrê û hwd hebûn. Heta ku Ji Erdebîlî û Baxdayê jî Zene û alimên ku hatibûbûna wir. Çend ku mezhebîtî hebû û hin cudabûn hebûn jî, mirov ne dikarî bibêje ku ew cuda bûn sedema çûyina cem hevdû bûn. Weke ku li Amedê bi Şêx birehim û hwd re. Li Erdebîlê bixwe jî, navenda tarîqate Zahîdîyan ku şêxên wê ên weke Seyfeddînê Erdebîlî bûn. Seyfeddînê Erdebîlî bixwe jî bi aslê xwe kurd bûna. Her wusa weke Seyfeddînê erdebîlî ku ji kîjan kokê bûn, Hallacê mensûr û piştre Nesîmî bixwe jî ji wê kokê bûn. Ew jî kurd bûn. Mihemed, ku bahse zindakirina Nesîmî dike van gotinan li dûv hevdû rêz dike. *"Nesîmê Sinbil û Sêvan/Seher da hebs û zindanê/Vebû qufla me bê mifte/Ziringînî ji quflê da/ ..*"

Pirsgirêka zindakirina Nesîmî, wusa xuya dike ku bandûra wê li zaneyên demê bixwe jî bûya. Li ser wê hanîna ser ziman. Mihemed, pirr li ser wê sekinîya û hanîya ser ziman. Her wusa, di civatan de jî, ew hanîna li ser ziman bûya.

Li vir, divê ku em vê bibêjin ku ew mezhebîtîya nava kurdan ku bi şîîtî û ankû elewîtîyê û şafîîtî û ankû sûnnîtîyê, weke ku piştre pêşdikeve, ne di temenê dijberîyê de bûya. Dikarîn herîna cem hevdû û nirxên hevdû ji hevdû fêr bibin û bihevdû bidina fahm kirin. Piştre, wê Mihemed, heya wî ji dîroka Hallacê mensûr û Nesîmî bixwe jî bibe. Wê li ser hizrên xwe bênina ser ziman. Mezhebîtî, biqasî ku em di nêzîkatîya Mihemed dibînin, ne di temenê dijerîyê de, her wusa di temenê cûhahîyeka olî ya pîroz de lê nêzîkatî dihê kirin.

Ku hinekî piştî dema Mihemed re wê were Feqiyê teyran bixwe jî, di dema xwe de sefer li Dînwerê û û wanderan kirîya. Bi wê yekê, ew bi wan herêman hemûyan jî gerîya ya. Li dergehên hevdû û civatên hevdû rûnîştina.

Mihemed, di dema wî de, gelek alim wê di dema wî de jî û berî dema wî wê werina Cizîra bota. Hertimî, ew çûyin hatin bûya. Piştre jî, ew domîya. Çend ku ne weke berê jî bê.

Li herêmê, teybetmendîya di nava kurdan de, ew a ku kevneşopî ji bo wan weke nirxna civatî pirr giring in û hertimî ahangekê di navbera nirxên xwe û wan de karîna ku bidina çê kirin. Ev, di demna bûya sedema nakokî û şer jî û di demna de bûya sedema ji holê rakirina nakokîyan bixwe jî. Lê di mijare civatî de, alikarîyeka mazin ji vê rewşê

û temenê bûya. Çend ku piştî ku şerê kerbelê bû û civate kurd, piştre bi şîî û aankû elewî û şafîî û ankû sûnnî û hwd bû qat jî bi demê re, lê dîsa ya ku li pêşîya wê qatbûnê weke perdeyekê hebûna xwe parast jî ew kevneşopî û destûrên wê ên civatî bûna.

Civat, bi vî rengî, çend ku bi mezhebî di navê de bi rengê elewî û şafîî û ankû sûnnî qatbûn bû jî, dîsa ew çûyina bi ser hevdû de bû. Ev yek û rwwş, ne tenê di vê rewşa elewîtî û şafîî û ankû sûnnîtiyê de wûsa bû. Her wusa, di rewşa kurdên misilman û êzîdî de jî ev rewş wûsa bûya û derketîya li pêş. Ji ber vê yekê, hertimî, divê ku mirov di hanîna ser ziman û fahmkirinê de cihekî giring bidina wan kevneşopîyên kurdan di hewldane fahm kirina dîrok û civat û civaknasîya wan de.

Her wusa, Ji roljhilatê kurdistanê bixwe jî ku herî zêde navê wî êli wir bicih bû. Şêx Evdûlqadirê geylanî bixwe jî, ji dergaha gêlanî bûya û koka wan jî weke ya Seyfeddînî Erdîbîlî kurd bûya. Herî zêde wê ne tenê di dema wî de û wê piştre jî, bandûra wî herî zêde li wê herêma botanê xwe bide li der. Di nava kurdên rojhilat ên elewî û şîî de jî bandûra wî mazin bûya û di nava ên şafîî û sûnnî de jî bandûra wî bi heman rengî mazin bûya. Ew bandûra wî, ti carî kêm nebû. Piştre jî, ew çû baxdadê û li wir ma heta dawîya jîyane xwe jî. Lê ew, bandûra wî, piştî wî re, weke ku bihizrên wî û nivîsên wî re zêdetir bû.

Ev têkilî, wê hertimî hebe. Wê hertimî çûyin li herêmên hevdû hebe. Lê piştre, tenê tiştek bû û bandûra xwe li vê rewşê kir. Ew jî, ew bû ku piştre wê li herdû aliyan jî, wê şerek li dijî kurdan bi desthilatdarî were meşandin û wê bandûra were kêm kirin. Wê êdî yên ku hin bi hin serdest bûn, weke ku li aliyê rojhilat weke sefewîyan, ku wê bi destê Mohammed Xodabendî ku wê seferên mazin li herêmên kurdan ên weke Şîrvan û hwd bike û wê bi hezaran di şûr de derbas bike. Li aliyê din jî, Wê hin bi hin Osmanî derketina dika dîrokê û ew jî, ku êdî hin bi hin hêzê dikina destê xwe de, wê heman tiştî bikin û wê gelek herêman di şûr de derbas bikin. Piştre wê rewşa olî, di temenê serdestîya van herdû aliyan a desthilatdarî de wê were kifşkirin û wê li olê û olzanîya olê bixwe jî were farzkirin û serdest kirin. Êdî, di vê temenê de, wê tenê ola wan hebe.

Ev rewş, bandûra wan herî zêde wê li kurdan bibe. Dîroka herêmê, divê ku mirov bi teybetî baş û qanc fahm bike. Mihemed, di dema xwe de serî li ser van rewşan wastandîya û li gorî xwe gihiştîya hin ancamna jî. Wî, ew redkirin û dijberîya li dijî hevdû, ne xwestîya ku bibîne û hilde li berçav. Wî, li ser rastteqînîya olê ya rast çi ya, xwestîya bi jîyane civatê re wê hilde li dest û li berçav.

Li vir, di serî de, divê ku ez ji vê demê Mihemed bibêjim ku bandûra pekrawankirina Hasan û Huseyin, pirr li Cîzîra bota û li dora wê hebû. Ji wê demekê gotinaka ku hebû. Ku dihat gotin, hertimê hêstir ji çavan dihatina barandin. Dihat gotin ku "serê wan hat jêkirin û bi pê kaşo leyîstin."

Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku çend ku bandûraka mazin li hevdû hebû jî, lê ew bandûr, bi nêzîkatîyaka aqilana û rast hatîya lê nêzîkkirin û ne hatîya hiştin ku bibe temenê dijberîyê di olê de. Heta ku weke baweriyekê jî pêşketîya ku "dijberîya di olê de weke gunahakê ya" hatîya dîtin û hatîya ser ziman. Bi vê rengê jî, nêzîkatî li hevdû hatîya kirin. Di olê de afirandina dijberî û ankû çêkirina wê, weke gunahakî mazin li ser navê yên ku çêkirina hatîya dîtin. Bivê rengê, ew mirov, weke "dervî ol" jî hatîya dîtin. Di wê temenê de lê nêzîkatî hatîya kirin, ku ev siltan jî bê.

Mihemed, di wê dema xwe de, dem baş fahm kiriya. Li vir, divê ku em vê jî bibêjin ku Mihemed, fahmkiriya ku dem weke dema aqil pêş dikeve û hemû tişt û kirin bi aqil û hiş tên dîtin û ser ziman. Di nava kirin û tiştan de lêgerîna vacê jî, weke aliyekî din ê ku divê ku mirov bi teybetî bin xat bike û bêne ser ziman a.

Di wê dema ku Mihemed, têde dijî, hin bi hin li rojava jî, di temenê "ji nû ve bûnekê" de weke ku labitandin heya. Hizrên Mirovên Kurê Rûşd(Îbnî Rûşd) û Kurê Sîna(Îbnî Sîna) hatina û hizirna mazin hanêna ser ziman. Hizrên wan, wê di wê demê de, li wê herêmê jî, wê weke ku ji nû ve werina kifşkirin. Şîroveyên wan ên di derbarê dîrokê, jîyanê û beşên hizir, raman û hiş û hwd de, wê bike ku ew temenê hizratîyeka hemdem bi xwe re bidina avêtin. Li Rojhilat, bi pêşketina osmaniyan re ji xwe ew temen ji holê rabû. Êdî meydan tenê bo pêşketinê ji rojava re ma.

Li Kurdistanê, Zaneyên weke Mihemed jî, ev yek dîdtin û bi wê re dem dixwandin. Di dîtin ku dem di çi rengî û awayê de pêşdikeve. Her wusa, bi çi şêwayê ku hizir were ser ziman, wê bersivê bide demê, ew jî li ser hizirîbûn bûya û hatîya kirin. Ya ku bi teybetî, em bi Mihemed re weke aliyekî wî yê pêşketî ku em kifş dikin jî ev bixwe ya.

Mihemed, divê ku mirov bi teybetî bibêje ku wî dem bi vî rengî baş xwandîya û li gorî wê dixwezê ku aqilmendiyekê bide nîşandin di nava civate xwe de. Li ser wê re wê bike ku hizrên xwe bi şêwayekî aqilî û bi vacê re bêne ser ziman. Di vê temenê de, wî, kirîya ku ´batinîtî´yê jî şîrove bike û di temenê aqiliyê de wê bi aqilmendiyekê bêne ser ziman. Ji ber ku wî bawer dikir ku di rêya rastteqîniyê de bi aqil, tiştek namêne ku

mirov xwe bigihêniyê de. Hizrên Kurê Sîna û hwd, ên weke ku "biaqil, mirov nikarê xwe bigihijêne hemû tiştî di jîyane de û ji ber vê jî divê ku mirov bi ya ku me bidest xistî re êdî xwe têr bibîne" jî, di wê demê de hin bi hin weke ku li ser wan re hizir dihatina ser ziman û êdî dihat bawer kirin ku aqil dikarê mirov bigihijêne ji ya ku em digihijêne hê bêhtirî jî.

Di demê de, êdî vê temenê de aqil dihên meşandin. Dema ku em bi aqil karibin xwe bigihijênina hertiştî, ev wê çaxê ji bo çi ya, çi vê dide kifşkirin, armanc çi ya û hwd. Ev pirsên ku êdî di temenê aqil û felsefetîya wê de ku wê êdî werina pirsîn bin û di çerçoveya wan de ku wê êdî teher werina afirandin.

Mihemed, vê yekê û rewşê dibîne. Nîqaşên ku tên kirin ji xwe di civatan de na û li ber wî na. Ew jî, wan dibîne û navaroka wan jî dibîne. Li ser wê re jî, êdî ew dike û dixwezê ku hê bêhtirî fahm bike û li ser wan navarokan re xwe bigihêne astaka hê bilindtir.

Di vê temenê de, li ser esas û teherîya aqilzanîyê, wê pêşketinek hin bi hin xwe bide nîşandin. Mihemed, hizrên Xallacî û Nesîmî jî dizanê. Wan jî di serê xwe de, şîrove dike. Hewl dide ku fahm bike û li gorî demê şîroveyeka rast û di cih de bi aqil bêne. Bo vê yekê jî, ew di temenekî aqilzanî de xwediyê nêzîkatî û hizraka mazin a. Gotina "zanînê" gotinaka wî ya bingihîn a. Gotina Mihemed û ankû Cizîrî ya ´zanînê´ bi teybetmendiya wê ya ku bi wî re ku mirov lê dihizirê, mirov divê ku bibêje ku ew di temenî teher, vac û hişbûnekê de bi têgihiştinî dihêne ser ziman.

Dem, demna aqil in. Êdî aqil pêş dikeve. Nirxandin, di wan de aqilzanî û vac lê tê lêgerîn. Di her civatê de, di dema ku axiftinek bû û ankû vebêjinek jî hat vegotin, hingî, wê li ser wê vebêjinê re bê û ankû li ser wê axiftinê re bê, biqasî hewldane fahmkirina wê, di wê de wê li levkirinekê jî were lêgerîn. Ev nêzîkatîya lêgerîna levkirinê ya di vebêjinê û ankû axiftinê de, mirov di asta têgihiştinê ya aqil de digihijêne astaka bilind de bi demê û aqilmendî û aqilzanîya demê re. Dema ku em van rastîyan bi demê re û bi teybetî Bi Mihemed re baş fahm nekin, emê wî jî birastî û baş û pak fahm nekin. Wî, rastî bi rastteqînî, hewl da ku bi aqil bêne ser ziman. Ji ber çi aqil heya? bersiva vê pirsê jî weke bersiveka ku lê tê lêgerîn a di mejîyan de. Weke bersivên ku ji vê pirsê re tên dayîn hena. Minaq, weke ku tê gotin ku "ji dema Nebî Nûh ve, ku dema ku dûnya bo xatirê wî ji nû ve xwûdê ava kir, hingî êdî aqil pêşxist û kir serê mirov de da ku êdî xelatî û şaşîyan nekê." Ev bersivaka bi dîrokêre ku dihat dayin bû. Ev tenê bersivek bû. Lê weke

ve bersivê, gelek bersivên din jî hena ku dihatin dayin. ..

Li vir, di serî de, weke pirs ku ka ´aqil ji ber çi ya´ û bersivkirina wê, hinekî jî, di vê temenê de aqilmendiyekê û pêşketina wê radixe li berçav. Di vê demê de, weke xelaka giring ya ku pêşketî û ku divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê û wê bêne ser ziman heya. Mihemed, her wusa, di vê temenê de, divê ku mirov li ser zanînê dihizirê. Wê di van salên xwe yên pêşî de ku diçê Cîzîra bota, wê berhema xwe ya ku "li ser zanîna ji mejiyê me" wê hilde li dest. Di dema ku î ro jî bahse Mihemed dihê kirin, di vê temenê de bahse berheme wî ya di vê temenê de dihê kirin. ..

Li vir, divê ku mirov bibêje ku ji vir mirov fahm dike ku Mihemed, li ser aqil, mazin hizirîya û afirandina wî bûya. Di wê dema xwe ya ku ew hê ji nû hatibû Cîzîra bota, wê di vî warî de karna wî yên ku wê piştre ji bo wî bina nav wê bi destê wî bibin. .. Mihemed, di wê êvara ku li civate Mîr de jî bû, piştî ku şîv xwaribûn û piştre ku hinekî ji xwe re di nava xwe de axiftin û piştre ku danûstandinên wan di nava wan de pirr germ bûbûn, êdî mijarên wan hemû bûbû bûn mijarên aqil ên di vê temenê de ku bahse aqil û pêşketina wê dikirin. Her wusa, her zanînên ku hizrên wan heyî, wan hizrên xwe dihanîn ser ziman. Kê çi ji kûderê û ji kê bihîstibû, ew dihanî ser ziman. Bi wê yekê re, êdî hin bi hin nîqaş germtir û gurrtir dibû. ..

Mihemed jî, di nava nîqaşan de germ bûbû. Ji xwe, ew yê ku di van waran de yê herî xwedî zanebûn bû di wê demê de û di nava nîqaşan de ku dikarî gotina xwe baştir bibêje. Li dora wî di wê heyemê de li civate mîr, gelek zane û rewşenbîrên civatê ku ji wir bûn û ji deverên dûr hatibûn, li wir bûn. Car bi car, di axiftinan de jî, didane ber hevdû.

Lê Mihemed, di wê heyeme de, weke mirovê ku herî zêde li berçav bû. Lê ew ew axiftina wî kort ya li ser wê gotina wî ya ku "çend kevir mana ew jî li min dikevin ku ez wan dênima ser hevdû", bi ew gotinên wî yên piştre ku ser vê wî gotibûn, bale mirovan hê bêhtirî dabûbû ser wî. Hê bêhtirî kiribû ku mirovên li dora wî li ser gotinên wî bihizir in.

Mihemed, bi wê rewşe û gotinên wî yên ku wî gotibûn re, weke ku nepenîyek bi wî re di serê mirovên li dora wî de afirî bi wî re. Ji ber vê yekê, êdî bêhtirî bal çûbû bû li ser wî.

Di wê demê û şevê de, heta derengîya şevê, wê Mihemed û ku mîr û gelek mirovên din ên li dorê, wê li hevdû rûnihin û wê biaxivin. Di wê rojê de, pirr axiftin kiribûn. Gelek axiftinên wan li ser zanîn û gotina zanînê bûn. Mihemed, gotina zanînê, di serê wî de, ne bin nepeniyê de bû. Wî zanîn, weke tiştekî giring didît. Bi wê re jî, dihanî ser ziman.

Gotinên weke ên "hiş", "zanîn", "rast", û hwd, çend ji wan gotinên ku wî di temenê fahmkirina wan de dikir ku gotinên xwe bibêje bûn.

Mihemed, pirr caran rastî gotina "aqil ji ber çi heya?" Hatîya. Wî bersiva daye. Wî aqil, weke pêwîstîyeka pêşketina mirov û fahmkirin a di jîyanê de dîtîya û lê nerîya û hanîya ser ziman. Gotinên weke "bo ku mirov di jîyane de rêya bibîne bi aqil", "Piştî tûfana dema nebî Nûh, xwûdê dûnya bona xatirê wî cardin avakir û aqil kir serê mirov de bo ku êdî xelatî û şaşîyan nekê.", "bo ku mirov pêşîya xwe baş bibîne aqil heya", "bi aqil, em dikarin rastîyê fahm bikin." "aqil û zanîn, ya ku mirov kirîya mirov a.", "jîyan, bi zanînê pêşketîya û hwd, çend ji wan gotinên dema wî û ku wî jî bilêvkirina bûn. Bi wê re jî, xwestîya ku aqilîyê pêşînîyarî mirov bike ku bi wê xwe rast bike û mazin bike.

Di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku Mihemed, giringî daye fahmê. Fahmkirin, weke aliyekî giring ê ku mirov bi jîyane û pêşketina wê re li ser bisekinê ya. Mihemed, pirr li ser sekinî ya. Li gorî Mihemed, "mirov mejiyê wî, bo fahmkirinê heya."

Di wê demê de jî, wî ev dihanîn ser ziman. Li ser zanînê, û bi teybetî gotina zanînê bi ya fahmê re disekinî. Ev giringiya wî ya ku wî dide ya zanînê û fahmkirinê, hinekî jî, weke ku ji pêşketina demê jî dihat. Dem. êdî di ast û radayaka xwe ya nû ya pêşketinê de bû. Aqil bi vac û lêgerîna di xwe de, derdikeve li pêş. Lê di aslê xwe de, her lêgerîna di aqil de, lêgerîna mirov bixwe jî ya ku mirov di serê xwe de bixwe re dikê ya.

Ev dema ku êdî aqil derdikeve pêş biwê re, êdî Mihemed jî, wê dibîne û dixwezê ku di wê temenê de nêz bibe. Ji nû ve şîrovekirina demên buhurî û pêşketina wan, û hizrên ku hatina ser ziman, wê weke aliyekî din ên dihê ser ziman bê. Bi wate kirina gavavêtina mirov bi qancî û xirabî, hinekî jî, vê teybetmendiya aqilî ya bi lêgerînê re dihêne li holê. Mirov, bi watekirin û fahmkirinê re aqilê xwe diafirêne.

Ev dema ku hatî êdî demeka aqil a. Mihemed, gelek zanyarên ku hatina Cîzîra bota, li wan jî dihisêne. Ew jî, hizrên xwe di nava civatê de dihênin ser ziman. Bi wê re jî, ji wê hanîna li ser ziman jî fahmkirinek di afirê. Bi wê re jî, Mihemed, hemû hiskirinên xwe û rewşên ku ew bixwe jî êdî dizanê, wan di serê xwe de dibê û dihêne û şîroveyê bi wê pêş dixe. Minaq, zindankirina Nesimî. Tişta ku hatî serê Hallacê Mensûr, ev ji wan tiştên ku divê ku werina bi wate kirin bûn. Lê bi wê re, divê ku mirov bibêje ku herî zêde di temenê nepenî û gotina nepenîyê de, batînîtî heya û di wê de jî, bawerîya ku mirov biaqilê xswe nikarê xwe bigihijêne hemû tiştî û rastiyê ku fahm bike. Ev jî weke pirseka hizrî û zanînî ku di serî de

dihê pirsîn û li bersiva wê dihê lêgerîn û dihê xwestin ku were bersivandin. Mirov, çima nikarê xwe bigihijêne hemû tiştî biaqilê xwe? Ev pirs, weke pirseka hizratî û ankû felsefîkî, di serê mirov de ya. Her zanyar û aqilmend û rewşenbîrên civatê li ser wê serî di wastenê û bi aqil û zanîna xwe dixwezê ku xwe bigihêne bersivekê ji wê re. ..

Mihemed jî, di wê çerçoveyê de di serê xwe de bi hizrekê ya. Ew jî, dihizirê. Lê ew vala nasekinê. Ew hertimî dihizirê. Ew bersivên ku berî wî, zanyarên ku hatina û çûna ku dane, wan jî dixwêne û li ser wan jî serî diwastêne. Wan jî, dike û dixwezê ku fahm bike. bi wê re jî, êdî li ser hemûyan re, pêşî di xwezê ku fahm bike ku zanyarên pêşîya gihiştina çi ancamê bi aqilê xwe. Piştre jî, ew dike ku êdî ew xwe bigihêne ancamakê di serê xwe de û bi xwe re.

Zanyar, karê wî bi aqil ve ya. Zanyar, di nava civate xwe de, divê ku hinekî mûtavazî bê û bi zimanê civate xwe bersivên rastî û dîrokî bidê wê. Ev yek, weke berpirsîyarîyeka dîrokî û rewîstî ya ku dikeve ser milê wî de ya. Mihemed, di farqê wê de bû. Wî ev jî dizanî. Ew xwediyê keseyetîyeka wusa ku bi zaro re dibû zaro û bi mazinan re dibû mazin. ..

Zanîn, bi zimanê civatê ku ji devê rewşenbîr hat ser ziman, wê hingî wate û giringiya wê bo civate wî hebê. Zanîn, bi jîyane civatê re pêşketina wê dibê. Dîrok, çand û kevneşopîya civatê diafirê. Ev jî, bikevneşopîyê re xwe bi jîyane civatê re dihênin ser ziman. kevneşopî, destûrên rêvebirênê ên jîyane civatê na. Çend ku civat dijî, wê di her demê de kevneşiopîyên nû ên demî wê bi afirêne. Ev yek, weke destûreka pêşketina jîyane civatî bixwe jî ya.

Mihemed, giringiya kevneşopîyê ji nava civate xwe dizanî. Li ser wê jî serî diwastand. Ev jî, weke aliyekî din ê ku wî dixwest ku fahm bike bû. Civat, çawa bi pêşve diçêt û çawa xwe diafirêne û pêşdixe, weke aliyna ku li ser dihatina hizirîn bûn. Kevneşopî, weke aliyekî giring ê bivan aliyan ve ku bi giringî li ser dihata hizirin bû.

Mihemed, di wê demê de, ev yek fahmkiribû. Lê Mihemed, tiştekî din jî pirr baş û qanc fahm kiribû. Ew jî her wusa, ew bû ku demeka aqil hin bi hin pêş diket û mirovên wê dema aqil wê çawa bin, li ser wê jî serî diwastand. Ji ber vê yekê, wî êdî giringî dide perwerdekirinê. Wî weke lingekê giring ê wê pêşketina civatî perwerde dîtîya û li ser sekinî ya. Bi wê yekê re êdî ew bixwe jî, wê bibe perwerdevanek heta dawîya jîyane xwe. ..

Di wê dema ku ew nû hatibû Cîzîra bota, di wê demê de, wî dîtîbû ku gelek guharîn piştî wî re bûya. Wî ev yek farq dikir. Gelek mirovên ku wî

nas dikirin, di wê demê de wî ew ne dîdît in. Gelek ji wan çûbûbûna ber dilovanîya xwe. Gelek jî ji wan, ne li wir bûn. Mihemed, di wê demê de, çend ku hatibû Cîzra bota jî, weke ku hatibû devereka nû lê hatibû. Wî jî, car bi car ew hîs û hêst bi xwe re dijîya û hîs dikir.

Lê Mihemed, êdî li Cizîra bota bû. Ew êdî li wir bû û wê demekê jî li wir ba. Di wê dema ku ew hatibû wir, gelek alimên ku ji başûr, rojhilat û rojavayê welêt hatibûbûna wir hebûn. her zanyar û rewşenbîrên ku dihatin jî, bêgûman wê xwe li civate mîr dababan li berçav. Ew jî, di wê demê li wir bûn. Mihemed, ew jî didîtin.

Di wê demê de, wê civate li qasra mîr, wê demeka ku nêzî berbanga sibehê ya mêjê wê bidomê. heta hingî jî, herkesekî, weke ku xwe di nav de winda kirî, bi hevdû re ketibûbûna nava nîqaş û danûstandinaka pirr germ de. Mihemed jî, wusa lê hatibû. Ew jî, ji dûr ve hatibû û gelek tiştên ku wî bigota û di serê wî de bûn hebûn.

Piştî ku dem hatibû ber derengîyê, êdî hin bi hin weke ku wastandin bi mejî re jî bi wan diket. Êdî weke destpêkê, nîqaş wusa zêde germ ne dimeşî. Mîr jî û Mihemed jî ev yek farq kiribû. Piştre jî, ji xwe ku zêde demeka dirêj bi ser ve neçû, êdî hin bi hin hizra rabûnê ket serîyan de û êdî bidest rabûnê kirin. Piştî ku bidest rabûnê hatkirin û herkesekî şevbaşî kişand ji yên li şûn xwe re û çûn, piştre jî Mihemed jî, çend ku Mîr cihê ku ew lê maba jî, kiu dabûbû amede kirin jî, wî jî xatir xwest. Lê dema ku wî xatir xwest, êdî mîr, hinekî weke ku ma şaş. Mîr, wusa bi şaşbûnê li Mihemed nerî û piştre bi bêhnekê êdî jê re got, "em dixwezin ku tû li vir bimêne, cihê de jî amede ya û ev der weke male te ya." Li ser vê gotinê. Mihemed jî, spasî kir û ji mîr re got ku "ez dixwezim ku herima medresê û hinekî bixwênim. Ji xwe, dem jî tê ber dema bangê." Ku Mihemed wusa got, êdî mîr jî zêde isrer nekir. Ji ber ku mîr kifşkiribû ku Mihemed di serê xwe de bîryara xwe dabûbû ku wê herê.

Lê wê demê de, Seydeyê wê demê ku navê wî Evdûla bû û jê re "faqa Evdûla" jî dihat gotin, bi wî re ma û wî jî gota Mihmed, ez jî bi te re me, ezê werim wir. Faqa Evdûla, dema ku wusa got, êdî Mihemed jî ne got na. Faqa Evdûla, bi temen jî bi gelek salan ji Mihemed maztir bû. Temenê wî mazin bû. Ew kal bû. Zanîna wî ya pirr mazin hebû. Herkesekê ku bahse wî dikir û navê wî dihildan jî, bi zanîna wî navê wî dihilda.

Piştre, ku Mihemed Sev başî ji Mîr re kişand û kir ku bikeve rê de û herê, Bi heman rengî Faqa Evdûla jî şevbaşî kişand û ket rex Mihemed de.

Bi hevdû re hatin ku werina mizgevtê. Mihemed, Nêhta wî ew bû ku çûba Medresê. Lê dema ku Faqa Evdûla, berî bi xwe re dabûbû wîr, êdî wî jî dengê xwe dernexistibû bi hev re di rex hevdû ku car bi car çend gotin jî ji hevdû re dikirin û biwî rengî meşîn û çûn bi ber mizgevtê ve. De ne. Mizgevt, mazin bû. Di hundurê wê de jî, medreseyeka piçûk hebû. Ew jî, her sibeh, wê zarok li wir lev bicivîyan û wê bixwandan û wê fêr ji Faqa Evdûla bigirtan. ..

Lê êdî medreseyaka mazin jî hebû. Wê li wir, bicivîyan. Li wir, bi hezaran bi carekê dikarî bi hevdû re bicivîyan. Li Cizîra bota, di wê demê de ser sê(3) hezar cihî re cihên ku li wan mirov lev dibû kom û dixwand hebûn. Mirov, li wan dirûniştin û dihizirin. Di serê xwe de, kûr û dûr diçûn. Weke cihna xwandin û lê rûniştin û hizirkirinê jî bûn. Mirov, ku li wan dirûnişt û diket hizran de, wê bikêlîkan rûniştî bima û wê bihizirê. Ji xwe, di wê hizirkirina wî de, êdî têkiliya wî weke ku ji dervî wî qût dibû. Êdî ew tenê bû di serê xwe de. Bi wê yekê û rengê, wê bi demên dirêj bima di rewşa xwe de ku dihizirî. Ji wanderan re, cihên hizirkrin û ´zikir´ jî dihat gotin.

Piştî ku Mihemed û Faqa Evdûla bi hevdû re hatin û gihiştina Mizgevtê, êdî li wir bihevdû re kare xwe kirin û destmêja xwe girtin û piştre bi hevdû re buhurtina li hundur. Di hundur de jî, beşa xwandinê û lê rûniştin û hizirkirinê hebû. Bi hevdû re buhurtina li wir û di rohniya çira´yê de rûniştin û bi hevdû re bidest axiftinê kirin. De ne, di dema xwe ya zaroktî û ciwanîyê de Mihemed jî li wir xwandîya û di wê demê de jî, yek ji wan seydayên ku ew perwerde dikirin û fêr didane wan di piçûkatîya wan de faqa Evdûla bû. Lê nûha, ew riha wî dirêj û sipî bûya. Êdî qaram, bi wî re zêde nemaya. Lê ew, xwediyê zanebûnaka ku pirr mazin ya di serê xwe de bû. Ew, weke pîrekî bû. lê weke rewşenbîrekî civatî jî bû. Kurmanciyeka wî ya wusa xort û xweşik hebû, ku mirov lê dihisand, mirov weke ku ji xwe dibir bi gotinên xwe yên ku wî lev dihanîn û digot.

Mihemed, di wê demê de dihiizirî. Car bi car, faqa Evdûla jî ji wir pirs dikirin. Carna jî li ser mijarna, wê wî axiftina xwe hinekî dirêj bigirta û gotin ji wî re li dûv hevdû bigota. Mihemed jî, hema wilo tenê li wî dihisand. De ne, dengê Faqa Evdûla jî zirev û xweş bû. Li mirov pirr xweş dihat. Bi wê zirevîyê ku wî deng ji hundur û ji kûrehîyekê derdixist û digot, ew dengê wî hingî li mirov pirr xweş dihat. Her gotina ku wî digot, bi wê yekê, di mejiyê mirov de dihişt. Wî, bi rengekî wusa gotina xwe digot ku dema ku mirov lê hisand, mirov bixwesta jî û ne xwesta jî,

dihişê mirov de dima. Dibêt ku ev teybetmendiya wî bi perwerdekiirina wî ya dayimî re pêşketibû. Ji ber ku ew bi salan bû ku wî mirov perwerde dikir. Gotina xwe ji wan re digot ku ew di serê xwe de bigrin.

Zimanê perwerdekirinê, hertimî teybetmendiyeka wê heya. Ew jî, herwusa ew ku gotinên bi zelalî werina gotin ku mirov karibê his bike û piştre li ser wê re ku karibê di hişê xwe de bigirê. De ne, rengê gotin gotinê, hertimî dike ku mirov gotinê di hişê xwe de bigrê. Ev yek, pirr giring a.

Mihemed, teybetmendiya wî ya sereka ew bû ku ew xwedîyê xêveka pirr xort bû ku dikarî ji hişê xwe de bigirê. Her wusa, ew teybetmendiya wî ya jiberkirinê jî pirr xort bû. Ku carekê lê hisand, wê care dûyemin, weke ku wî hiskirî wê karîba ku dûbare bikira. Ev jî, weke teybetmendiyeka ku di temenê pêşketina wî bixwe de jî bû. Jiberkirin, di xwandinê de, dema ku mirov wê hilde li dest, na tijbihê wê ji berkirina ku mirov çend gotina ku ji ber bike û wan dûbare bike. Her wusa, jiberkirina perwerdehî, hinekî di temenê wê de xêva mirov heya. Mirov, ku bi hiş zanîn di mejiyê xwe de girt, wê hingî, jiberkirina wê jî hesanî bê. Ankû,e m bi v rengî bibêjin ku wê êdî piştî wê bicihkirinê piştre weke wê hanîna wê ya li ser ziman wê baştir bibe. Hinekî jî, di vê temenê de divê ku mirov bibêje ku çendî ku xêv pêşketî bê û pêvejoyên wê yên pêşketinê hebin, wê êdî temenê wê pêşketinê wê biafirê.

Mihemed û faqa Evdûla, weke demekê wusa li hevdû dirûnihin bi hevdû re diaxvin. Heta ku dengê dema banga sibehê tê. Piştî ku dem hat û bangkiirin bû û piştre ku hin bi hin mirovan bi dest hatina li mêjê kirin êdî piştre Mihemed û faqa Evdûla jî derketina li pêş û tevlî nava mirovên ku hatin bûn. **Ji xwe wê faqa Evdûla li pêşîyê mêj bikira**. ..

Dem ku hinekî dîn jî buhurt, êdî mirovên ku wê heta wê demê wê hatiban hebûn. Piştre bi hevdû re, li hevdû dicîvîyan. Her mirovê ku dihat, wê pêşî destmêja xwe bigirta û piştre bi heta û li cihê xwe yê ku wê kê mêj bikira lê dirûnişt. Ku dema wî heba jî, wê berî mêjê sinetek bikira.

Mihemed, ji xwe ew amede bû. Ew jî, piştre hinekî hatibû û li rêzê sekinî bû. Çend mirovên ku pêşî hatibûn û nawserî xwe û kal jî bûn, li cem wî cihê xwegirtin. Berî hingî, çend gotin jî dibê qey bi hevdû re kiribûn. Lê êdî ku dem hatibû ber dawiyê û ku êdî wê mêj bikiran, êdî herkesek li rêzê bû.

Piştre dem hat û mêj kirin. Piştre ku mêjkirin û piştre hinekî din jî li hevdû rûniştin. Mihemed, piştî mêjê jî, li wir ma. Çendî pêşî nêht û xwesteka wî hebû ku çûba medresa sor jî, lê ew li wir mabû. Piştî mêjê,

êdî piştre ku fecrê vedabû û êdî roj jî derketibû û piştre êdî ku dem hatibû dema kirina taştê. Lê Faqa Evdûla Male wî bixwe jî, çend ku nêzî mizgevtê jî bû. Mihemed ew bi hev re çûbûna male birayê wî ku hinekî ji wan wirdetir bû. Li wir taştêya xwe sibehê kiribûn û piştre zêde nemabûn û di cih de vegerîyabûn Mizgevtê. Ji ber ku wê êdî zarok bihatan ku fêrên xwe bigirtina.

Zarok, pêşî ku dihat, wê pêşî, hinekî fêra xwe ya roja buhurî wê carek din bixwandan. Ew xwandina fêra roja buhurî ji roja nû ya ku hatibû re dibû dewr. Ew dibû dewra roja nû. Bi wê yekê, êdî weke ku zaroyan hemûyan weke ku dewra xwe xwand piştre wê êdî werina û li cem seydayê xwe jî, fêra xwe ya roja berê û ku di wê rojê weke dewr xwandina, wê li cem seyda jî carekê bixwênin û seyda êdî wê biryarê bide ku êdî ew fêr hatîya rewakirin û piştre êdî wê fêra nû bide. Her fêra nû, wê piştî rewakirina fêra berî wê, wê biheta dayîn.

Di wê dema ku êdî Mihemed û seyde bi hevdû re cardin hatibûbûna mizgevtê, Wê carê, teybetmendiyek hebû. Ew jî, ew bû ku Mihemed, tevlî fêrdayînê bûbû. Ev yek, weke demekê bale Faqa Evdûla kişand. Ji ber ku ew jî bi heman rengê di ber destê Faqa Evdûla de buhurtibû. Lê î ro, li rex wî, fêrê dide xwandevanên wî yên û ankû Faqihên nû. Faqa Evdûla, dema ku wê rewşê wusa dibîne, weke ku hinekî dihizirê. Dibêt ku demên wê yên berê ên ciwanîya wî hatibûbûna bîra wî. Piştre jî, di wan demên Mihemed li ber destê wî fêr girtibû. ma kî bi faqa Evdûla de nema bû. Weke Mihemed ku di wê demê de ew jî zane, alim û rewşenbîrekî civate xwe bû Seydeyî Zivîngî bixwe jî, di dema xwe de li cem Faqa Evdûla mabû bû. Ew jî, piştre, heta ku çûbû Serdêf, Werezûzê, Girêmîra, Aysere, û hwd, ku hin deverên din jî di nav van de cihan de bûn, seydeyê Zivîngî li wan mabû bû. Li van derên ku me navê wan hanî ser ziman, û çend cihên din jî, weke van cihan, li wan medreseyna mazin ên bi nav û deng li wan hebûn. Li gelek deverên din jî medresayên xwandinê hebûn. LÊ medreseyên xwandinê ên van cihan, teybetmendiyna wan ên sereka hebûn. Li wan, pirr zane diman. Zane û alimên demê, ên ku hinekî xwe pêşxistibûn û digerîyan li nava civatê, xwe digihandina van deveran jî.

Ev derên ku me navê wan hildan, bi çend cihên din ên giring re, ne tenê medresa li wan hebû. Dergehên Şêxtiyê jî li wan hebû. Ji ber vê yekê, êdî derwîş, sofî û hwd jî, xwe li wan digirtin û li dora wan didan civandin.

Bi vê yekê, evder, êdî weke cihna ku li wan êdî zane hizra xwe ya teybet ku bi êdî bi navê xwe bi afirêne bûn. Her wusa, êdî ew hizra xwe ku afirand û hanî ser ziman wê kariba ku bi zanyarna mazin ên rewşeênbîrên civatê re bi wan bikevê danûstandinê. Ji ber ku li vanderan, ev derfet hebû. Asta, van medreseyan jî li ser ya hemû medreseyên din re bû. Gelek aliman ku li medreseyên din mazin dibûn, wê heta ciwanîya xwe li medreseyên ku lê xwandina wê bixwandan û xwe pêşbixistan. Lê piştre, wê êdî weke ku ew medresa kitim û xitim kiribê, êdî wê ji wêderê herê û xwe bigihêne cihekî ji van cihan. Lê van deran, derfet hebû ku êdî xwe bigihanda zanyar û zanînên mazintir.

Cihên weke Serdêf û Ayserê, ne dûrî Cizîra bota bixwe jî bûn.Bi lingan wê çend kêlîk kişandiban ku heta ku xwe bigihandan wir. Ji vê nêzîkbûnê jî, weke ku mirov hilmek ji Cîzîra bota û wê zanîna wê dihilda li nava xwe. Bêhna Cizîra bota, hertimî bi zanebûnê derdiket.

Mirovê ku xwe li wê herêmê û li dora digirt jî, wê bêhnê weke ku hinek bêhn dikirin. Zanyarekê ku xwe dayî zanînê, ne bi derfet bû ku xwe ne gihêne cizîra bota. Ji ber ku Cizîra bota, weke navendaka ku lê û jê zanîn diafirî bû. Bi wê yekê, êdî divê ku mirov bibêje ku hertimî Cizîra botan, navê wê bi zanînê xwe nivîsandîya.

Mihemed, bi salan li derve mabû bû. Lê î ro, ew êdî li Cizîra bota bû. Wî jî, li cem seydayê xwe di nava xwendavanên wî yên nû de fêr dide. Muhaqqaq, faqa Evdûla jî dema ku ew di wê rewşê de didît, dilê wî jî pirr xweş û geş dibû. Kêfa wî dihat. Ku Mihemed, berhemek bê, wî ew di nivîsandina wê berhemê de karekî mazin ê bingihîn kiribû. Keda wî di wê de, pirr mazin hebû.

Mihemed û faqa Evdûla, heta ku zaroyên ku fêra xwe ya nû girtin li nava wan man û piştre ku zaroyan jî fêrên xwe girtin êdî hin bi hin ku dem jî bi ber nîvro ve diçû û dema firevînê êdî dihat. Ji bo zaroyan, dem û çaxê firevînê zû tê.

Piştre, zaro jî çûn. Lê çend faqa û serfaqa û hwd bi çend derwîş û sofîyan re li wir li hevdû rûniştî man. Piştre bi hevdû re ketina axiftinê de. BI hevdû re bidest axiftinê û danûstandinê kirin. Lê piştre zêde ne domandin û çûna Mdreseya sor. Li wir jî, di wê dema ku ew çûnê, hingî dîtin ku wa gelek faqihên mazin wê hena û lê rûniştî na û di xwênin û diaxivin bi hevdû re.

Piştî ku wan dît ku wa Mihemed û seyde û çend mirovên li dora wan hatin, êdî ji ber rêzdayina xwe ew jî li ber wan rabûna ser xwe. Bi wê yekê re, êdî ku ew çûn û li hundur rûniştin, êdî bi hevdû re axiftin. Di wê

demê de, êdî weke ku Mihemed hatibê male xwe lê hatibû û hinekî jî bêhna wî derketibû.

Piştre jî, hinekî din dem buhurt. Mihemed û mirovên bi pêre li ser xwandinê û zanînê û hildane wê axiftin. Faqa Evdûla, di vî warî de li pêş bû. Zanîna wî hebû. Di wê demê de, weke yekê mazin, dema ku li ser vê hat axiftin, pêşî cihê gotinê ji wî re hat hiştin. Ew hem mazin bû û hem jî weke seydeyê mazin jî bû. Bi wê yekê, rêzek û hûrmeteka mazin jî jê re hebû.Di wê demê de, ji wê rêz û hûrmetê, ti qisur ne dihat kêmkirin.

Mihemed, bi mirovên li dora xwe li wir, weke demekê ma û bi wan re da û stand. Demeke dirêj, ew bi hevdû de diaxivin. Li ser demênna buhurî ew bihevdû re diaxivin. Lê bi wê re jî, li ser dîrokê û olê û axiftibûn. BI wê re jî bahse zarokan kiribûn. Mihemed, di serî wî de, gelek dîtinên nû hebûn. Wî jî, li gorî wan, hizrên xwe dihanî ser ziman û dikir ku bi yên li dora xwe de bide parvekirin. Mihemed, li pirr cihan gerîya bû. Pirr cih û war dîtibû. Î ro jî, nûha li cizîra bota li Medreseya Sor bû. Êdî ew li wir bû û wê li wir êdî maba û bidest perwerdekirina zaroyan û ciwanan bikira. Lê diber re jî, wê hertimî ku derfet û firsand ji xwe re dît, wê nivîsandiba jî. Êdî, demeka nû fêrkirin û perwerdekirinê û her wusa bi nivîsandinê bo Mihemed wê li Medreseya Sor, weke alimekî mazin û seyda û ku weke ku wê ji vir û pêde ku jê re were gotin û bi wê were naskirin wê weke "Seydeyê Cizîrî", êdî wê derketiba li pêş. .. ---- -----

Dem di buhurê. her dem û roja ku buhurt, weke zanyarên civatan di civatan de dibêjin ku temen û ûmrê mirov diçê. Her roj, mirov rojekê din bi ber pîrbûn û kalbûna mirov ve dibêt. Her roj, çend ku mirov bi ber wê ve dibê, her wusa, hinekî jî, tiştekî bime dide fahm kirin û naskirin. Jîyanê bi me di de fahmkirin û naskirin. Jîyan çi ya? Jîyan, ne tenê jîyandina mirov a ku mirov dijî ya. Ji wê zêdetir, jînbûyînên mirov û hwd jî di nav de hena. .

Ku em bi bahse jîyanê bikin, divê ku em bahse dîrokeka mazin bi cihane xwe ya ku dijî re bike. Em pîr û kal dibin. Lê ma gelo ew cihane mê jî ku bijî ma ew jî pîr û kal nabê. Li gorî zanyarên civatê, bersiva wê jî, ew a ku ew jî pîr dibê. Ji ber ku jîyane, di her tiştî dijî. Bi wê re jî heya. Dema ku em jîyane salix dikin, hertişta ku me êdî salix kir û piştre ku em li wê salixkirina xwe divegerihin û lê dinerin, em weke ku di wê de kêmbûnek hebê bi wê re di jîyanê de mirov wê hîs dike. Ji ber ku jîyan, her timî ji ya ku em salix dikin ji wê zêdetir heya. Hîs û hêsta vê jî, wê bike ku hertimî em hertim wê kêmdîtinê bibînin.

Li Cizîra bota, ew demeka ku jîyan xwe didomêne. Herkesek bi kar û karê xwe diçê. Mihemed jî, Piştî ku hatibû Cizîra bota û pêde, êdî ew jî tevlî jîyane wê ya rojane bûbû û wî jî êdî xwe dide dîyar kirin. Ew li Medreseya Sor bicih bûbû. Wî, li wir, êdî perwerde kirin dikir û dinivîsand. **Bi wê re jî, wê xwe bi tememî dabûbû hizir û têgihiştin û bawerîya xwe ya pîroz**.
Mihemed, piştî ku ew hatibû Cizîra bota, bi ser wê hatina wî ve êdî hinbi hin dem di buhurt. Ew jî, êdî bi demê re li herêmê bi zanîna wî re hatibû nasîn. Alim, zanyar û alimên herêmê heman bêja giştkê wan, êdî navê Mihemed bi navê ´seydayê Cizîrî bihîstîibûn û bahse zanebûna wî dikirin.

Mihemed, di wê dema ku ew li wir mabû de, di hundurê demeka kin de, hin nivîsarên wî yên ku wî bi destê xwe hildabûn pênûsê jî wê bibin. Bi wê re jî, ew ew jî, werina dîtin û bihîstin. Li Wêderê û bi teybetî ku ewder Cizîra bota bê, dema ku tiştek hat nivîsîn û ankû bi nîvîskî hat dîtin û ankû afirîn, ku êdî heya zanyarên wir û alimên wir jê nebê ne dibû. Di cih de, di heyemek pirr kin de heya wan jê çê dibû. Ew êdî xwe digandinê de û dixwandin. Biwê re jî, ne tenê dixwandin, bi wê re, lê dinerîn û navaroka wê dixwestin ku fahm bikin û fêr bibin. Li ser wê re, ast û rada zanînê û yê ku nivîsandî ku bo ku wê fahm dikin, ew dihildan li dest. Lê divê ku em bibêjin ev jî aliyek bû. Lê herî zêde ji aliyê olî ve nivîsar, hertimî aliman xwe digihanda wan.

Mihemed, di wê demê de êdî hin bi hin li herêmê tê nasîn. Ji ber ku piştî ku nivîsarên wî hin bi hin derdikevin, êdî wê ew nivîsarên wî û ankû berhemên wî bi jiberkirinê bin û ankû bi nivîsandina nûshayaka din ya wê bê, ew dihat çêkirin û li medreseyên din jî dihat bicih kirin. Ev bi teybetî, bi destê zanyar û aliman dihat kirin. Bi vê yekê, êdî bi teybetî, di nava zanyar, alim û xwendavanan de bêhtirî ew bi navê xwe re dihat nasîn.

Mihemed, di wê demê li Cizîra bota bû. Di wê dema wî de, piştî ku di demeka pirr kin de çend berhemên wî dibin û diafirin ji wî, êdî wê gelek zanyar û alim, bi xwe êdî hewl bidina xwe, ku ne tenê xwe bigihênina berhemên wî, her wusa ku herina Cizîra bota û li medreseya Sor ku wî bixwe bibînin û ji wî bixwe jî zanîna wî guhar bikin û bibhîzîin. Ev yek, wê êdî piştre pêş bikeve. Mihemed, lê wê piştre hin bi hin dem bi dem zêdetir navê wî were bihîstin û wê were naskirin.
Mihemed di wê demê de teybetmendiya wî ya sereka ya ku ew zêde derdixist li pêş ew dema wî bû xwe û li gorî wê hizirkirina wî ya li gorî

wê a bi aqil bû. Awa û rengê hizirkirina wî, rengekî nû dide têgihiştina olî ya herêmê bixwe jî. BI teybetî, divê ku ez bibêjim ku li Cizîra bota ku zanyarek derkeve li pêş, wê ew derketina wî ya li pêş wate wê ya olî jî wê heba. Ewder, ji ber ku weke navendeka olî jî bû.

Mihemed, teybetmendiya wî ya sereke, ew bû ku wî hemû hizrên ku heta wê demê hatina ser ziman, weke ku şîroveyek wan jî li gorî bi aqil pêş dixist. Ya ku wî giringtir dikir ev bû. Wî, pêşketinên ku bûbûn li herêmê ên olî, desthilatdarî û hwd, bi hemû awayên xwe hildabûn li dest. Bi vê yekê, nêzîkatîya wî ya li mezhebên olî jî nû bû. Wî, mezhebîtî weke cudahî û ankû cihêrengîyekê didît û dihanî ser ziman. Her wusa jî lê dinerî. Bi wê yekê, wê yek li ser ya din re ne digirt û mazintir ne dikir. Biwê yekê, wî kiribû ku şîroveyeka mazin ya olî ya giştî ku dijberiyên olî û hwd jî ji nava mirovan derbixe dikir bi biafirêne. Ev diafirand jî.

Ya rastî ew bû ku li kurdistanê, teybetmendiyaka bi vî rengî ya pêşketina bi olê re jî hebû. Divê ku mirov bibêje ku ti carî, ol, di temenê nêzîkatîya desthilatdarî de derfet ne hatîya dayin ku were bikarhanîn û îstîsmarkirin. Ya ku oldarîya kurdistanê giringtir dikir jî ev bû. Oldarî, bi raman, hizir û têgihiştinê re bi baweriyê dihat jîn kirin. Bi vê yekê, nêzîkatîya safî û zelal ya bi mirov re hebû.

Her wusa, bi vir ve girêdayî divê ku ez bibêjim, bi rengekê ku ol û desthilatdarî û rêveberîya cuda lê hatîya nerîn, mirov awayekî pêşketinê dibînêt. Li kurdistanê, li ser kevneşopîyê re desthilatdarî û rêveberî pêşketîya. Ol jî, çend ku ji wê sûdgirtibê û pêşketibê jî, bi rengê ku pêş diket, rêveberîya bi nêzîkatîya cuda lê dinerîn. Hertimî, ew dihat parastin. Bi gotinaka din, em divê ku bibêjin ku li ser şêxtiyê re ol û li ser mîrtiyê re rêveberî pêşdiket. Şêx, bi dergeha bû. Mîr jî bi qasr bû. herdûyan, karê xwe dikir. Yekî, welat û civat û kevneşopî diparast û yê din jî ew dijî û pêş dixist bi demê re. Bi vê rengê, weke ku karekî ku levbeşkirî hebû dihê li berçav. Ev yek, bi dîrokê re bi xwezayî bûbû û pêşketibû.

Mihemed, vê yek dîtibû. LI ser vê re jî, êdî wî pergale civatî û ya rêveberîyê ya kurdistanê fahm kiribû. Mîr, ne diçû û li ser navê şêx gotina xwe ne digot. Her wusa, şêx jî, ne diçû û gotina xwe li şûna mîr nedida gotin. Lê herdûyan jî, gotinên wan, dem bi dem di temenê ku hevdû bi parêzên û hevdû di temenê têgihiştineka rast de ku rast bikin, bi hevdû re di temenê şêwirmendîtîyekê de û ku di wê şêwirmendiîtîyê de şêx li pêş bû, li rex hevdû di sekinîn. Civat jî, cihên wa ên tê de xwe dihanîn cem hevdû û gotina xwe ji hevdû re du di gotin. Ji ber ku civate mîr giring bû? Ji ber ku di vê temenê de gotina ku di civate wî de hat

gotin, êdî ew gotin, weke destûrekê, dikarî pêşketina civatê jî bide kifşkirin. ..

Rengê awayê pergalî î civatî ê li kurdistanê, di vê temenê de, divê ku mirov bibêje ku pirr bi teybetî li pêş bû. Civat, giringiyeka wan ya bêhempa hebû. Ew giringî jî herwusa ji mirovên ku lê di rûnişt û hizrên ku têde dihatina ser ziman ku jîyane civatê û rengê pêşketina wê hizrî û jîyanî dide kifşkirin. Di vê temenê de jî, di temenê wê de kevneşopî hebû. Mihemed, ev rewşên civatî û pêşketinî bi dîrokê û kevneşopîyê re dîtina û fahm kirina. Her wusa, li ser wê re jî, li gorî demê çawa dikarê li ser wê hizra xwe bêne ser ziman, di wê temenê de lê hizirîya û kiriya ku hizra xwe bêne ser ziman. Û hanîya ser ziman jî.

Mihemed, weke ku didît ku demeka nû bi serdemî li cihanê dest pê dike. Her wusa, weke ku kifş dikir ku êdî wê aqil derkeve li pêş. Di wê demê de gotinên li ser aqil, ku di temenê "aqil û an jî ku ol", ku di temenê weke dû aliyan de ku dihên ser ziman, wan dibîne. Li vir, ji dêla ku aliyekî red bike, wan dike fahm bike ku ya rast çi ya wê dêne li holê. Mihemed, oldarekî ku di asta pêxemberekî de jîya ya. Lê wî ti carî aqil red û înkar ne kirîya. Aqil, weke pêwîstîyekê dîtîya ku mirov divê ku wê pêş bixe û biwê re ´ya qanc´ û ´ ya xirab´ kifş bike û bi wê re êdî ya qanc hilbijêrê. Mihemed, di vê temenê de dîrok xwandîya. BI vê yekê re, êdî Mihaq, ku weke dagera ´xirabiyê´ navê ´Ehrîmen´ û hwd jî dihêne ser ziman. Bi wê re jî, wî xwestîya ku bi aqil ya xirab ûya rast û ne xirab bide li berçav.

Wek tê zanîn ku Ehrîmen, weke dagera xirabiyê ya. beremberê wî jî ´Ahûra mazda´ ya ku weke dagera qanciyê û rastiyê ya. herdû vajî hevdû na.

Mihemed, giringî dayîna mejûya berê û hewldane fahm kirina wê re, dixwezê ku bide nîşandin ku êdî demeka nû bi aqi dest pê kiriya. Dema ku wan nav û mînaqan dihêne ser ziman jî, ne bi rengê vebêjinî dihêne ser ziman. Her wusa, bi gotina aqil û bi têgihiştinî dihêne ser ziman. Di temenê ji nû ve bi watekirina û afirandina rengê têgihiştinî û di wê de ya qanc û xirab ku were dîtin ku ka çi ya, biwê re dixwezê ku werêne ser ziman.

Li vir, em tiştekî jî bi teybetî divê ku bibêjin ku wî pêşî li dîrokê nerîya û li ser wê re û her wusa di berdewama wê de hanîya ser ziman. Wî, nirxandin li ser dîtina dîrokê re kirîya. Ev, tişta ku bi me dide nîşandin, ew a ku wî bi hewldane fahmkirina mejûya berê re ku têgihiştina dema xwe ya dema pêşîya xwe bide afirandin. Em bi teybetî,

nêzîkatîya bi vî rengî û ankû nêzî vî rengî bi Kurê Rûşd re dibînin. Kûrê Rûşd, wî demên berî xwe û heta ku hizrên Arîsto û hwd, hizrên demên berê nirxandin û piştre ew nirxandinên wî bûna temenê dema ´ji nû ve bûnê´ û ankû bi gotinaka din temenê ´ronesans´ê jî. Wî dema xwe bi vî rengî bi temenî afirand. Wî demên berî xwe xwand û biwê xwandinê re li dema pêşîya xwe nerîya. Ankû temenê nerîn û nirxandina demên li pêş xwe bo yên ku bi nirxênin bi gotinên xwe re afirand.

Bi teybetî, li herêmê, dema ku Mihemed li pêşketin û pêşveçûnên wê dinerê, ew ji dêla ku beşekê bi serê xwe şîrove bike. Weke serokekî pêşî hemûyî dibîne û bi wê re şîrove dike û bi şîroveya xwe re refaransên nêzîkatîya demî dihêne li holê. Ya ku wî kirîya jî ev a. Ji xwe, piştî di dema Mihemed de û heta ku piştî wî re jî, zanyar û rewşenbîrên civatî ev yek weke ku bihîsî û hêstîyarî kifşkirina û di wê temenê bi refarans girtina wî re di rêya xwe dimeşîn û meşîna.

Mihemed, nêzîkatîya wî ya aqilane, wê li gorî demê bê. Li vir, giringiya wî bi teybetî, divê ku mirov bi nêzîkatîya wî re lê binerê. Wî dîrok, kifş kir û ji nû ve afirand. Hizrên wî, di temenê ku mirov pêşî xwe û mejûya xwe û civatîtîya xwe nas bike û bi wê re jî bêne ser ziman a. Di vê temenê de, di temenê hemdemîya xwe de, xwediyê nêzîkatîyaka aqilane û felsefîkî ya civaknasî, hizrî û ramanî ya.

Li Kurdistanê, heta wê demê, werze(metamatîk), astronomî, gaometrî û hwd jî pêşketineka wî ya bi astekê heya. Lê ewvan mijaran dihilde li dest û zimanê werzê dixwezê ku hinekî di nava zimanê xwe de bi zanebûnî bide pêş xistin. Wî di dema xwe de, di vê temenê de, hin şîroveyên werzî û gaometrikî kirina. Her wusa, hin nivîsar jî nivîsandina. Di dema ku wî perwerde dikir de jî, ev dide fahm kirin. Bi wê re jî, divê ku mirov bibêje ku wî piştî ku bi dest perwerdekirinê kir, wî pergaleka perwerde ya ku li medreseya sor ku dabû rûnandin, di wê dem hizratî(felsefe), werze û gaometrî, ol û olzanî û hwd, pêşxistîya. Yekî ku ji ber destê şadigirt û ankû şagirtê wî û medresaya sor bû, van nêzîkatîya bi serê xwe dikarê hilde li dest û dihilde li dest.

Divê ku em di farqê de bin ku dema ku em bahse Mihemed û ankû bi navê wî yê ku êdî pê tê nasîn seydeyê Cizîrî ku dikin, em bahse pergale perwerdekirinê ya ku li medreseya sor ku wî bi hizir û têgihiştina xwe re dabûbû rûnandin û ku dem bi dem ku berhem jî di nivîsand û li wê bicih dikir û bi wê re ew kûrtir dikir dikin.

Di vê temenê de, em vê jî dizanin, ku em dema ku bahse Mihemed dikin, em du tiştan divê ku bi sereke bibêjin ku hewl bidin ku fahm bikin.

Yek, serdem û dema wî ya ku êdî bi aqil pêş dikeve û wî ev kifşkiriya û dixwezê ku wê bi têgihiştin bike û di wê temenê de berhemên xwe binivîsêne û di nava civate bicih bike. Ya din jî, her wusa, ew a ku em bahse pergale perwerde ya ku li Medreseya Sor ku wî bicihkiriya û êdî ku bi demê re ji hemû medreseyên din ên li kurdistanê re bûya minaq dikin. Bi vê yekê re, dema ku em wî bênina ser ziman, em çiqasî jî bênina ser ziman, wê kêm were ser ziman lê zêde newê ser ziman.

Mihemed, piştî ku hat Cizîra bota û bi wê kare xwe yê ku wî xwe jê berpirsîyar dît û da berxwe ê perwerdekirina mirov, bi wê re serkevtin û pêşketina ku da çê kirin, wê temenê wê nasîn û navderketina wî bê.

Di wê demê de, Medreseya Sor, êdî hin bi hin pêş dikeve. Medreseya Sor, êdî weke zankoyeka demî pêş dikeve. Ji ber çi Mihemed çû li Medreseya Sor bidest perwerdekirinê kir? BI vê re, çi peyame xwest ku bide? An jî ku, divê ku em çi peyamnê bi demê û pêşketina demê ya bi aqil re jî derxin? Ez di wê bawerîyê de me ku Mihemed, xwestîya ku ev pirs werina pirsîn û bên bersivandin. Dema ku ez li pêşketina wî û li awayê hizrên wî û li serdema wî pêşketina wê dihizirim, ez vê yekê biawayekî vekirî bi wî re dibînim ku ew ji me dixwezê ku em vê bi pirsin û bi bersivênin.

Mihemed, di wê demê de, dît ku aqil pêş dikeve. Wî, bi wê re xwest ku bi tememî di wê temenê de bide fahm kirin. Hizrên xwe jî di wê temenê de hanîn ser ziman. Bi wê re jî, wî xwest ku li gorî wê hîzirîtî û aqilîtîya demê ramanên xwe şenberê bi aqilîtîyê bêne ser ziman. Ev kir jî, yekî ku di wê aqilî xwe ya ku dihizirê û ser 43 berheman dinivîsêne, em nikarin bêjin ku wî ev nekiriya.

Ku em bi serdemî li wê demê dinerîn, em divê ku li gorî xosletên wê demê pêşketina wê bênina ser ziman. Li gorî wê, wê Mihemed, hingî rasttir û baştir were fahm kirin.

Mihemed, di wê demê de weke ku mirov dibîne ku wî serdema aqil dît û xwest ku bi wê re û li gorî wê bêne ser ziman. BI vê rengê, ya ku wî kir pêşeng bi dem û têgihiştina wî re, êdî mirov wê rasttir dibîne û fahmtir dike.

Mihemed, di wê demê de, demeka Dirêj, wê bi faqa Evdûla re perwerde kirinê bike. Lê piştre ku Faqa Evdûla çû berdilovaniya xwe, êdî Mihemed, weke yê ku cihê wî girt û neberda bû. Mihemed, wê dergehtiyekê jî di wê medreseyê de bide bicihkirin. Bi vê yekê re, wê zanînên demê bikişêne wir. Piştre jî, êdî wê bi wê re perwerdekirinê kûrtir bike.

Li Cîzîra bota, ji dema Ebûlîzê Cizîrî û bi vir ve, li wir têgihiştinaka kûr bi werzê û ankû bi navê wê yê din matamatîkê pêşxistibû. Piştî wî re jî, heta ku dem hatibû dema Mihemed, wê li ser wê pêşketin û têgihiştina Ebûlîzê Cizîrî ya matamatik û gaometrî yê re wê pêşketineka hemdemî wê hin bi hin li wir pêş bikeve. Dema ku em bahse matamatik(werze)ê û geometrî´yê ya hemdem bikin, divê ku em bi awayekî şenber, li Cîzîra bota, Ebûlîzê Cizîrî destpêkekê bidina dest pê kirin.

Ebûlîzê Cizîrî, wê li ser werzê û gaometrîyê re, wê têgihiştineka şenber ya teknîkî bide afirandin û bêne ser ziman. Wî, di temenekî ku em dikarin di temenê hemdemîya dema aqil û bi aailzaniyê ku em bênina ser ziman, wî bi werzê û gaometrîyê ew kir. Ji aliyê Werzê û gaometriyê ve, wî destpêkek bi aqilene û giring dabû dest pê kirin û piştî wî re li ser wê destpêka wî re gav bi gav, wê êdî hanîna li ser ziman û pêşxistin bi demê re bibe. Êdî em dikarin bibêjin ku heta ku dem tê dema Mihemed, wê êdî pergale têgihiştin û bi aqil û aqilzaniyê ya perwerdekirinê derkeve li holê. Li ser hizrên werzê ên Ebûlîzê Cizîrî jî, hizrên xwe yên ku hanîna ser ziman hena. Wî, nivîsarna giring bi zanînê û aqilê zanînê ku di wan de hanîya ser ziman, nivîsandina. Di wê demê de, wî ew li medreseya sor, wan dide xwandin jî. Li wir jî, bi vê yekê û rengê, divê ku mirov bibêje ku wî êdî hizirvaniyaka demî ya bi aqilzanî kiriya.

Mihemed, di vê temenê de, di temenê aqil û aqilzaniyê de divê ku mirov wî hizrê wî û ramanên wî hildina li dest. Ev rast a. Lê bi vê re jî, wê bi tememî têre nekê ku em bi tememî Mihemed û hizrên wî fahm bikin. Mihemed, ne tenê yekî ku di temenê aqil û aqilzaniyê de hizrên xwe dihanî ser ziman. Wî, dema aqil kifşkiribû û mirovê wê demê wê çawa bê û pêdivî û pêwîstîyên wî ên hizrî û têgihiştinî bi ramanî çî na, li wan hizirîya û xwestîya wan bêne li cih. Hinekî jî, divê ku em bi pêşketina wî ya li Medreseya Sor û pêşketina ku wî li wir daye kirin, ji wê mirov divê ku vê yekê bi teybetî û sereka fahm bike û êdî hin bi hin wê kûr bike û bi wê re jî fahm bike.

Her wusa, li vir, sê aliyên giring ên Mihemed bi pêşketina wî ya li Medreseya sor der dihên dîtin. Yek, aqil û aqilzaniya wî û bi wê re pêşketina wî ya di temenê têgihiştina hemdemîya dema aqil de ya. Ya din jî, pêşketina wî ya bi pêşxistina pergale perwerde ya li medreseya sor a. Ya sêyemin jî, dibê navaroka wê pergale wê pergale perwerde ya ku li medreseya sor ku wî hewl dide ku bide pêşxistin bû.

Mihemed, wê li wir, hin bi hin bi aqil pêş bikeve. Lê wê bi perwerdekirinê re bisînor nemêne. Her wusa, wê di pergale perwerde û

wê rengê perwerde ku wî hizir dikir ku li gorî wê û pêdîvî û pêwîstîyên wê ku dihizirî û wî bi xwe êdî pirtûkên wê dinivîsand. Her wusa, bi rengê perwerdekirina wî re, ev heya. Yanî, wî tenê bi ya ku heya re, di perwerdekirinê de xwe bi sînor ne dikir. Hertimî, di hewldanaka ku ji wê bibuhurê û herê û bigihijê ast û radayaka hê ji wê maztir û bilindtir. Ya wî, rengê perwerdekirina wî bivî rengî bû. Di vê temenê de, em çendî ku jê re gotina mamostetiyê bikarbênin, wê çendî ku ne xelat bê, lê wê ewçendî jê têrê nekê ku wî bi tememî li gorî rastîya wî êdî wî bêne ser ziman. Mamosteyek, berhem û pirtûkên ku tên ber wî, wan dihilde li dest û li gorî wan perwerde dike. Ev salixkirina mamosta dihêne ser ziman. Lê wî, tenê ev ne dikir. Wî, bi xwe perwerde dikir, lê kêmesî ku didîtîin, wê çawa ew kêmesî werina buhurandin û valahiyên ku tên dîtin ku wê çawa wan dagirê û hwd, aliyekî wê yê ku mirov divê ku bi teybetî bêne ser ziman a. Her wusa,, wî hertimî hizir dikir û di perwerdekirinê çi pêwîsta û divê ku çawa were perwerdekirin, li ser wê dihizirê. Bi wê re jî, ya ku wî di perwerde kirinê kêm dît, wê êdî ew rûnihê û li ser wê bihizirê û wê xalê de êdî berheman bi nivîsêne û wê êdî ew bixwe êdî wê ew wê kêmesîyê bide buhurandin. BI vî rengî, weke ku herkesekî jî digot, û piştre jî herkesekî ji bo wî got, "wî dixwest ku bigihijê pergaleka perwerdekirinê ya ku kêmesîyên wê tûnebin."..

Ji wê dema ku ew hatibû û ankpû vegerîya bû li Cizîra bota, êdî ew piştre li Medrseya Sor bicih bûbû û wî li wir, mirov perwerde dikir. Wî, êdî hemû karê xwe kiribû ev. Li ser vê dihizirî û bi wê hizirkirina xwe dixwest ku bigihijê ya hê li pêştir.

Li Medreseya Sor, di demeka kin de wê li cem wî, pirr zane û alim jî cih bigir in. Wê, bi wan re, êdî perwerdekirinê bide kirin. Mirovên ku perwerde dikirin, di beşên civatî ên weke civaknasiya civate, werze û gaometrî, aqilzani û raman, têgihiştin û hiş, û hwd, wê di gelek beşên zanînê ên ku di wê demê de wî li wir bicihkirina û mirovan bi wan dide perwerdekirin, wê bide perwerdekirin û pêş bixe. Wî, bi vî rengî, aqil û aqilzani, kirîya weke pêpelokek ku li ser wê re mirovan di buhurînê li jîyanê bi zanî.

Medreseya Sor, di vê temenê de, weke zankoyeka hemdem ya bi aqil û aqilzani, perwerde dike û hin bi hin beşên zanînê ên perwerdekirinê lê afirîna û li ser wan perwerdekirin dibê ya. Bi vê rengê, ew di aqlê xwe de, zankoyeka hemdem ya dema aqil û aqilzaniyê ya. Mihemed, weke ancama wanqas salên xwe yên perwerdekirinê û ku li berdestê bi dehan mamostayan xwandibû û ji wan zanîna wan hildabû, medreseya sor,

weke zankoyeka hemdem pêşxistibû. Di aslê xwe medreseya Sor, berhema wî ya herî têgihiştinî ya ku mayînda ya ku wî nivîsandî ya.

Mihemed, weke zaneyekî civatî ê aqil û aqilzaniyê ya. Divê temenê de divê ku mirov wî hilde li dest û hewl bide ku wî fahm bike. Li Cizîra bota, di wê demê de, astaka pêşketinê heya û hin bi hin pêşketin xwe bi rengên nû bi têgihiştinî û aqil didine li der. Di wê temenê de, hinekî jî pêşevanî û serkêşvanîya vê dike. Yanî, wî aqiltîya aqilmendan kir.

Ew hê zêde ne demeka dirêj bû ku ew hatibû Cizîra bota. Lê ew bi kirin û têgihiştina xwe ya ku heta wê dema kin ku dayî fahm kirin, di serê mirovan de pirr mazin cih girtibû. Ew, weke alim û zanyarekî mazin hatîbû dîtin. Bi aqilî û zanyarîya wî, ew êdî di nava civatê de hatibû kifşkirin. Piştî ku ew hatibû kifşkirin, êdî ew bi navê seydeyê Cizîrî´ û ankû melayê Cizîrî´ hatibû bi navkirin û naskirin. Ev nav, navê wî yê zanyarî bû. Wî bi zanyarî û têgihiştina xwe ew navê xwe bi maf kiribû.
Di nava kurdan de di kevneşopîya wan de weke şopekê ya ku yekî ku jîr û bi aqil bû, li gorî wan teybetmendiyên wan bi navkirina wan bûya. Ji ber ku ji Faqa Evdûla re gotin "faqa Evdûla"? Ji ber ku wî di dema faqatîya xwe de, pêşketinaka mazin ku dikeve çavê mirovan û çavên wan didagirê û êdî ew bi wê derdikeve li pêş, êdî ew rewş, tê bi navkirin û weke navê wî tê û jê re mayînda dibe û jê re êdî tê gotin ´faqa evdûla´.

Mihemed jî, di wê dema xwe de bi perwerdekirin û wê zanîna xwe ya mazin derdikeve li pêş weke seydeyekî. De ne, seyde, hinekî bi teybetî bi pwerdekirinê re di nava civatê de tên naskirin. Ew jî, di wê rewşê de xwe pêş dixê û êdî bi wê re navê xwe bi zanyarîya xwe perwerdekirina xwe ya mirovan li medreseya li sor qizinç dike.

Mihemed, di wê demê de li medreseya sor, ku weke demek ma, piştre hat naskirin. Navê wî derket. Pêşketina ku wî bi medreseya Sor re li gorî demê biaqil û aqilzaniya wê re da çêkirin, wê aliyekî din ê ku wê temenê wê navderîya wî bê. Heta roja me jî, ku bahse Medreseya sor tê kirin, navê Mihemed û ankû seydeyê Cizîrî, û ku bahse Mihemed û ankû seydeyê Cizîrî tê kirin jî, navê medreseya sor di cih de dikeve bîra me de. Weke du navên ku cêwî bin bi hevdû re. ..

Mihemed, ew demek bû ku hatibû Cîzîra bota. Lê wi di wê dema xwe ya kin de ya ku ew hatibû de jî, wî navê xwe dabû. Li herêmê êdî ew hatibû naskirin. Hin bi hin jî, navê wî bêhtirî dihat naskirin. Li Medresaya Sor, piştî ku êdî bi tememî weke ku lê tevgerînek afirî bû û êdî ku zanîn û alim diçûn û dihatinê de, êdî ew jî li wir, derdikeve li Pêş. Mihemed, wê li Medreseya Sor, bi wê rewşê re were nasîn. Lê Mihemed,

bi wê re, di dema ku mirov dihatina wir û li wir bi xwûnkar û ankû zaneyên wir re ku lev dirûniştin û bi hevdû re diaxiftin û ku ast û rada zanîna wan dihat fahm kirin, êdî ew mazinatî bêhtirî dihat dîtin. Yanî, mazinatiyaka bi zanebûnê dihat pîvandin, weke asta Mihemed jî ku bi wê re dihat dîtin li Medreseya sor dihat dîtin û bi wê re jî, hem navê Mihemed û hem jî navê Medreseya sor derdikeve li pêş.

Ji xwe, Cîzîra bota, bi serê xwe weke dibistanaka ku lê zanîn bi xortî bicih bû. Her wusa, dema ku bahse navê wê dihat kirin, ji xwe ew zanebûn û rewş dihat bîra mirov. Lê bi wê re jî, êdî li gorî demê pêşketin û navderîyeka mazin derketibû li pêş. Mihemed, di wê demê de dîrok dinivîsand.

Li medreseya Sor, piştî Mihemed bi cih bû û piştre, êdî li wir jî, xwûndakar li wir zêdetir dibûn. Hin bi hin li wir civandinaka mazin bûbû. Li wir, bi teybetî, ciwanên ku levcîvîyabûn jî, bi teybetî, yên ku ji dema piçûkatîya xwe û heta dema balixbûna xwe ku hinekî xwe bi zanebûnî mazin kiribûn û salên bi xwandinê re buhurandibûn, êdî li wir levdigihiştin li hevdû. Li wir, bi vê rengê, di aslê xwe de, weke astaka bilind ku li ser hemû medreseyên din ên li kurdistanê re li wir bi dibistanî afirîbû û Medreseya sor bi demê re malavanîya wê dikir.

Mirov dikarê bibêje ku li gorî demê hin bi hin awa standin jî, weke rengekî ku xwe bi medreseya sor re dabûbû nîşandin dihat dîtin. Yê ku ji wê re pêşavanî dikir jî Mihemed bû. Bi wê re jî, êdî navê wî derketibû. Li wir, Medreseya sor, weke klasîkeka kurdistanê û bi teybetî ya Cîzîra bota bû.

Mihemed, di wê dema ku ew li wir mabû de, wî xwe dabûbû xwandin, perwerdekirin û nivîsandinê. Ev hersê kar, ji wî re êdî weke ku nebû nedibû bûn. Wusa, êdî jîyane wî bi wan ava bû bû.

Mihemed, di wê demê de, navê wî derketibû. Li herêmê, weke wî çend alimên din jî ên di wê demê de dijîyan lê ku hinekî berî wî dijîyan lê ku bi temenê xwe yê dirêj, newê hema bêja wê demê bi jîyane xwe hatibûn, Melayê Bateyî û hwd hebûn. Wan jî, gelek berhemên giranbûha nivîsandibûn û heya Mihemed ji wan berheman hebû. Ma heya ku kê wê ji Mewlûda Melayê Bateyî nema.

Lê Mihemed jî, hê di demên xwe yê ku nawserî xwe bûya de jî, çend berhemên wî yên bi vî rengî ên giring hebûna. Hê ku ew ne zêde pîr jî bû. Bi nûbahakê re `delîl-xêret´ek nivîsandîya. Ew jî, alim û xwûndakarên wî yên li cem wî, dayinî lê nerîn û jê sûd girtin. Mihemed, bi vê rengê, di wê demê de di destpêkê de, weke temen hin nivîsarên wî bûna.

Ev nivîsarên weke ´delîl-xêretê´ û hwd jî, bi teybetî dûa û hizrên olî û dîrokî di wê de hebûna. Bi wê jî, mirov dikarê weke di temenê tewsîrekê de jî bêne ser ziman. Lê wî, bi dîrokê re, pirtûkeka mazin li ser dîrokê nivîsandîya ku hemû alimên li cem wî jî û xwûnkarên wî jî jê sûdwergirtina.

Mihemed, li ser zanîna ji mejî, nivîsarên wî bûna. Bi wê re jî, wê kiriîya ku bide fahm kirin ku aqil çiya û çawa diafirê û çawa ku divê u mirov wê fahm bike. Di wê demê de, di vê temenê de, nîqaşên mazin hena. Bi teybetî li medreseya sor, gelek nîqaş û danûstandinên mazin di nava aliman de ku bi rojan domandina li wir bûna. Mihemed jî, di nava wan danûstandinan de cihgirtîya.

Li Medreseya Sor, di demeka kin de, Mihemed wê pirtûkxaneyaka mazin bide çê kirin. Li wir bo ku li wir werina xwandin û ji wan sûd were girtin wê bi hezaran pirtûk werina bicihkirin. Di her beşên hizirkirinê ên ku di wir de hatina çêkirin de, herwusa, wê gelek berhem werina bicihkirin. Beşeka bi vi rengî ya Mihemed bixwe hebû. Ku kê xwestiba ku di cih de xwe bigihanda wî, wê di cih de xwe bigihanda wir û wî li wir bidîta.

Mihemed, dema xwe fahm kiribû. Wî dizanî ku herî zêde wê aqil li pêş a. Wî jî, kirîya û xwestîya bi aqil û bi zanebûna were nerîn û fahm kirin. Bi nîqaş û danûstandinên li ser kifşkirina bi aqil, di wê demê de wê medreseya sor weke navende bû ku lê nîqaş dibûn. Wê aliman xwe li wêderê bide li hevdû. Weke Mihemed ku bi zane bû û weke seydeyê Zivingî ku di wê demê de pîr û kal bû, mela Yusif hebû. Wî, bi salan li Cîzîra bota salên xwe buhurandibû. Lê ne ji nava Cîzîra bota bixwe bû. Lê li wir, bi salan mabû. Bi wê re jî, ew jî, di wê dema ku Medreseya sor bi vî rengî êdî alim diherikêne de û êdî li wêderê bidest xwandinê û hevnasîna hevdû dikin, ew jî, li wir a. Di wê demê de, gelek caran bi derwşî, sofî û gelek alimên din re rûniştîya û bi wan re ketîya nîqaş û danûstandinan. Bawerîya ji hiş û aqilê wî jî di nava mirovan de pirr mazin bû. Wî, hizrna mazin dihanîna ser ziman. Li ser Vacê û ankû ´mantiqê´, berhemeka wî ya stûr jî hebû ku bi navê "aqîda û rêzên hiş" bû. Di wê de jî, gelek rêzên bi aqil û aqilzaniyê hebûn. Wî, li wir, bahse aqil kiribû. Rojekê, nîqaş û danûstandinên mazin di nava çend alimên ku Mihemed jî di nava wan de dibêt. Ew jî di wê demê de li wir a lê wusa zêde xwe nedaya li pêş û tevlî danûstandinan nebûya. Lê wî, bi aqilê xwe û mejiyê xwe, weke ku ji derve ve li nîqaş û danûstandinan dinerî û dixwest ku hizir û ramane di serê hemû mirovên ku di axiftin de bike. Di

rewşeka bi vî rengî de sekinî ya. Piştî ku nîqaşên wan heta deverê di nava wan de tên, êdî Mihemed, heya wî ti ser Mela Yusif. Hingî, êdî ew dixwezê ku Mela Yusif jê tevlî axiftinan bide kirin.

Mihemed jî, hem ji ber ku bi temen ew ji wî pirr maztir bû û hem jî weke zaneyekî ku ji wan kaltir û maztir bû, rêz û hûrmeta wan û herkesekî jê re pirr hebû.

Ku dema ku Bal hatina ser Mela Yusif, êdî mela Yusif bixwe jî, xwe ji wan dûr nekir û ew red nekir in. Piştre weke ku hinekî dî xwe bi ber wan ve da û hinekî xwe nêzî Mihemed kir û bi wan re ket danûstandinê.

De na, mela Yusif, li ser aqîda û rêbazên hizirkirinê, hizirîya û di serê wî de gelek hizir bi wê û li ser wê hena. Bi wê re jî, êdî ew li ser aqil xwediyê têgihiştinaka mazin a. Lê Mihemed bi xwe jî, berî hingî çav li berhemên wî gerandîya û hizrên wî dizanê. Dizanî ku çi di serê wî de heya. Di dema ku ew nêzî hevdû dibin û dikin bi hevdû re biaxivin, Mihemed di serî de gotina xwe nabêje. Lê Ku bi wan re bûya seydeyekî din ku navî wî Saîd bûya bi wan re bû û wî di destpêkê de çend gotin hanîn ser ziman û çend ji berhema wî jî bi levkir.

Gotinên ku Seyda hanîn ser ziman, di wê temenê de bûn ku li ser aqil û navaroka aqil bûn- De na, aliman bi zanebûna xwe, di wê demê de serî pirr li ser navaroka aqil diwastandin. Dixwestin ku wê navarokê fahm bikin. Pirranîya wan, weke ku di wir de bîreke bêbinî hebê û ew jî bixwezin ku xwe bigihênina wê, nêzî navaroka aqil dibûn.

Di wê demê de, di dema ku seyde bahse aqil kir û gotinak bi karhanî. Ew gotin jî, her wusa ew bû ku got ku "aqil di nava xwe de ka çi dihawêne, ji wê kûrbûna bi wê re ku mirov wê fahm bike .." Bi vî rengî got û weke ku gotina xwe dawî lê ne hanî. Lê hemû mirovên li dora wî jî gotina wî fahmkiribûn û fahm kiribûn ku wî qastî çi kir û xwest ku çi bibêje. Mihemed jî û Mela Yusif jî, ew yek fahm kir. Mela Yusif, farq û fahm kir ku nîqaş û danûstandin li ser navaroka aqil a. Ku gotin werek ser navaroka aqil, ku alim bê û zanyar bê, wê gotinaka wî hebê ku bibêje.

Di wê demê de, çend gotin wusa di nava wan çûn û hatin. Lê ku wusa zêde axiftin nebû bû, mela Yusif mafê gotinê girt û wusa axift ji mirovên li dora xwe re, "Aqil, navaroka wê zanîn a. Navaroka zanînê jî raman a û navaroka ramanê jî hiş a. Bi hiş jî, ku em hinekî din bi wir de herin, emê bigihijina jîyanê û tişta ku jê hiş bûya. Ew tişt jî, ne win dizanin ku tenê xwûdê çêkiriya û afirandîya. .." Mela Yusif, çend gotinên din jî, piştre biser van gotinên xwe ve dike û dihêne ser ziman. Gotinên wî hêja bûn û herkesekê guhê xwe bi hey dabûbûyê de û lê dihisand. Piştî ku Mela

Yusif gotinên xwe gotin, êdî piştî wî re weke ku hinekî bêdengbûn çêbû. Lê yê ku ew bêdengî xira kir ew bû ku wî got ku "zanîn, tişta navaroka aqil a. Lê ew xwe bi hiş dike. Hişê wê, bi wê re heya. Ew, bi wê re weke ku berpirsîyar bê ku wê bi me bide fahm kirin. Çendî ku em bijîn, wê ew xwe bigihêne me. Hinekî jî bi jîyandina me ve û heyîna me ve girêdanka wê ya hişî heya. .." Mihemed, dema ku ev gotin weke destpêkê gotin, piştre ew ket nav axiftinê de û weke dirêj axift û mirovên li dora wî tenê guhê xwe danê de û xwestinên ku gotinên wî yên ku li dûv hevdû ku ji devê wî derdikevin fahm bikin. Mihemed, pirr xwanda bû û di serê wî de ji pirr aliyanve ku dikarî bêne ser ziman, hizratîya wî ya kûr hebû.

Mihemed, nêzîkatîya xwezayê di hizrên wî de derdikeve li pêş. Lê ew hinekî dî jî bi hiş dihêne ser ziman. ku danûstandin dihê ser hizir, ew dihizirê ku di aqil de sedem û ancam bi hevdû re hatîya bicihkirin. Divê ku mirov di çerçova wan de lê bihizirê wan fahm bike. Lê çend ku Mihemed, di navaroka aqil de, li sedem û ancamakê lê digerîya jî, wê di asta giştî û ya bilind de, aqil bixwe jî weke ancamakê didît ku afirîya. Lê ew ancam bo sedemekê afirîya. Ew jî, emê bi lê bihizir in û wê bibînin û fahm bikin. Hinekî wê, di vir de, di wê lêgerînê de mirov herê bigihijê rastîya ku wê me bibe û bigihêje rastteqîniya giştî ya temen. Li gorî wî, ti tişte ne belesebep û bi serê xwe ya. Bi ancamê re, li gorî wî beşek ji wê sebebê tê dîtin û fahmkirin. Lê tememê wê nayê fahm kirin. Lê ku mirov ji ancamê gihişt sedemê, ew sedem jî wê hinekî dî me bi têgihiştin bike. Ev yek, weke xelekna ku li dûv hevdû û ku yek ya din temem dike û hertimî di rastiyê de mirov hinekî dîn nêzîktir dikin in.

Aqil, bi vê yekê, weke rêyekê ya. Divê ku mirov wê wusa bibînine û lê nêzîkatîyê bike. Wê rêyê, mirov bo ku têre herê û bimeşê, divê ku mirov têgihiştinê hin bi hin bi dest bike. Têgihiştin, wl tenê me di jîyanê de û her wusa bi sedem û ancamê û têkiliya di nava wan de me bi zanebûn bike. Her wusa, wê mirov bi fahmkirina wê giştîya aqil jî mirov bigihijêne têgihiştinekê. Li vir, têgihiştin, weke aliyekî bi serê xwe di serî wê de dihê dîtin û xuyakirin.

Çavên me çêbûna bo dîtin, guhê me bûya bi hiskirin û ankû bihîstinê. Lingê me çebûna bo meşînê. Destên me çêbûna bo girtin û rahiştinê û hwd. Ev hemû di dema ku afirîna de, sedemeka afirîna wan hebûya. Em dema ku wan bibîr bikin, divê ku em wan sedemên wan jî bi wan re bibîr bikin. Ji ber ku ew hevdû temem dikin.

Mela Yusif, li vir, hinekî vajî Mihemed dihizirîya û wî ji aliyê sedemê vê lê dinerî û digot ku "bo ku ew sedem hena ew pêwîsîtî jî afirîna."

Piştre Mela Yusif, wuha didomand, " xwûdê jîyan afirand bo ku têde jîyandin bibe. Yê ku wê têde bijî mirov jî û hemû beşerên din jî, wê êdî wê jîyandinê ji xwe re bi xwûdê weke sedemekê bibînin û li gorî wê bina xwedî ancam. .." Dema ku mela Yusif, ji aliyê ve dinerî, ancam jî, di rengekî têgihiştinî ê weke sedemê de dihanî ser ziman û herdû bi hev ve digirin. Li vir, li gorî wî, hemû tişt, sedem wê di hundurê wê de heya. Yanî, ancam jî dikarê xwe bi rengê sedemê bide nîşandin û sedem jî dikar bi heman rengî weke ancamê xwe bi wate û rengê bike. Herdû jî, di gorî wî dîtbar bûn û mirov ne dikarî bi tememî wan hi hevdû vaqatêne. ..

Li ser nîqaşa ancam û sedemê, mela Yusif, di navaroka hişê xwe de xwediyê wê têgihiştinê bû ku dikarê bide afirandin û li gorî xwe awa û şekl bidayê de û bihanîya ser ziman. Heyîn ancam a û yan jî ya ku ji heyînê bûya ancam a. Li gorî wî, herdû jî dikarin weke ancam jî werina dîtin û weke sedem jî. Ji ber ku herdû bi xwe mirov dikarê wan salix bike û bêne ser ziman.
Ji aliyê nêzîkatîyê ve, tenê cûdahîyeka wan hebû. Weke ku çawa ku rêyek li pêşîya mirov hebê û dawîya wê jî ji destpêka wê were dîtin, û yek wê aliyê dawîyê ji xwe bike destpêkê û ji wir were bialiyê ku weke destpêka û yê din jî aliyê destpêk ji xwe re bike destpêka bi ber aliyê dawiyê de herê. Lê herdû jî, wê di nîvê rêyê de di deverekê de bibigihijina li hevdû û ji hevdû bi buhur in. Di dawîyê de, ku herdû jî ji aliyê xwe ve çûn û gihiştina devera ku çûnê de, wê ancam bibe yek. Di vê temenê de Mela Yusif lê dinerî.

Mihemed, dihizirî û fahm dikir ku çend ku rê yek jî bê, di dema ku mirov têre çû, wê ancamên wê cuda bin. Ji ber ku Mihemed, digot ku dema ku "dema ku tû sibehê ketî rê de tê nîvro li wir bê. Lê ku tu nîvro ketî rê de tê êvarî li wir bê. Wî, farqîtîyek bi demê re di vir de didît û dixwest ku bide fahm bikirin. Dem, li gorî wê nabê yek û weke xwe namêne. Ya ku wî dide hizirandin jî hinekî jî ev bû. ..

Mihemed, û mela Yusif û alimên din ên li dora wan, wê demeka dirj bi hevdû re di wê temenê de biaqil û demê re biaxivin û danûstandin bikin. Li ser wê jî, wê hizrên xwe ji hevdû re bibêjin wû li ser cudahiyên di nava hizrên wan de ku ez ji hevdû fahm dikin jî, wê ji hevdû re bênina ser ziman û wate wê hewl bidin ku bînina ser ziman. Bi wê re jî, wê hewl bidin ku bigihijina xaleka hevbeş bihevdû re. Lê mejiyê mirov dihizirê û hertimî aliyekî ku mirov zêde û ankû cuda bihizirê wê hebê.
Mihemed, her wusa, gîyan û aqil û ankû zanîn jî ji hevdû cuda dikir. Bi hevdû re ne dihanî ser ziman. Li gorî wî, gîyan, çend ku di laşê me de

dijî, piştre jî dikarê bi heman rengî bijî û bihizirê. Her wusa, wî mînaqa Cinan li vir dide ku ew gîyan in di hizir in û dikarin biafirênin. Gotina "Rûh î tu ne cisma î cemale bi çi îsmî", hinekî jî di vê temenê de mirov dikarê wê bixwêne.

Mihemed, zimanê wî, zimanekê teorî û giran a. Wî, gotinên xwe li ser kirde û wateyê lev hûnandina. Bi wê re jî, wî hanîya ser ziman. Car bi car, dema ku em tenê li ser gotinan re herin û wî bixwênin jî, em dikarin hem xelat jî fahm bikin û hem jî em dikarin wî cûda û ne weke ku wî xwestîya ku bi me de bide fahm kirin ku em fahm bikin. Yê wî, rêbazeka wî ya teybet ya bi serê xwe ya hizirkirinê û biawa heya ku divê ku mirov wê bi teybetî bi wî hizirkirina wê re fahm bike. Ji bvê yekê jî ya ku dema ku em hewl didin ku wî û jîyane wî jî bênina ser ziman, em xwe nagrin û êdî dikevina nava hizirkirina wî û hizratîya wî de bi têgihiştin û zanîna wî re û em hewl didin ku wê bênina ser ziman.

Mihemed, di wê demê de weke demeka dirêj bi mela Yusif û alimên din re li hevdû rûniştî dimêne û bi wan re diaxivê û dide û distêne. Bi wê re jî Mihemd, fahm dike ku ew çawa dihizir in. Di wê demê de bi çî rengê hizirîn ku pêre dibêt fahm kirina zanyarekî weke aliyekî giring ê fahm kirinê jî dihat dîtin û ser ziman.

Mihemed, di dema ku di hizirî û piştre ku diaxift, digot ku "ti tişt, ne mayînda ya. Her tişt demeka wê ya jîyanê heya, weke ku çawa em mirov temenekî me yê jîyanî heya em wê dijîn û piştre dimirin." Lê wî mirin, weke dawîbûnê ne dîdît. Di wê de jî, û piştî wê re jî destpêkek heya ku divê ku mirov li wê bihizirê. Li gorî wî mirin, wate jîyanê jî bi xwe re dijî. Her wusa jîyan jî. Ew, hevdû, bi vî rengî temem dikin. Weke ku çawa li gorî wî şev bêroj nabê. ..

Mihemed, di wê dema nîqaş û danûstandinê de, bihizrên xwe yên ku wî hanîbûbûna ser ziman re bal kişandibû ser xwe. Mihemed, hizrên xwe yên ku hanîbû ser ziman, bi wan dabûbû nîşandinku ew zanyar û rewşenbîr, alim û bawermendekê pirr mazin bûya. Bi wê yekê, piştre jî, hemû zanyarên li dora wî careka din mazinatîya wî bi hiziratîya wî re herê kiribûn û şikûr û dilxweşî ji xwe jê re xwestibûn.

Mihemed, di wê demê de, nîqaşaka mazin bi Mela Yusif û alimên din ên li dora xwe re dabûbû kirin. Bi wê re jî, bi sînor nema bû, wî hizirna mazin hatibûbûna ser ziman. Mijarên têgihiştinî û zanînî ên ku wî hizrên xwe di temenê aqil û aqilzaniyekê de hanîbû ser ziman.

Aqilzaniya Mihemed, li pêş bû. Wî, di axiftinên xwe yên ku dikirin de di pirrên wan de hanîya ser ziman ki ´aqil, ji ber çi bûya û afirîya´. Bi wê

re jî, hanîya ser ziman ku ji ber çi xwûdê aqil kirîya serê mirov de. Di vê temenê de wî hanîya ser ziman. Aqil, êdî bi têgihiştinî diderket li pêş. Di fahmkirinê de, li pêş. Mihemed, ev yek her wusa bi awayekî vekirî didît û kifş dikir. Ji ber vê yekê, ev mijar, weke mijareka wî ya xeses bû ku wî dixwest ku mirov bi aqil bike ku karibê di rêya rast de bi rastteqîniyê bi meşê. Gotina rastteqniyê, li vir divê ku em hinekî bi teybetî li ser bisekin in û wê bênina ser ziman. Mihemed, vê gotinê, giring dibîne û di temenê hizrên xwe de weke rastî û temenekî giring dihêne ser ziman. Her tişta ku heya û afirîya, li gorî wî, heyîna rastteqîniyekê dihê dihêne ser ziman. Her afirîn û bûyîna ku heya li jîyanê, hinekî jî ne tenê weke heyînekê heya û afirîya, her wusa weke nîşanaka wê ya jî.

Rastteqînî, rastîya wê di jîyanê de bicih de. Lê jîyan bi xwe jî, hinekî jî, wê rastteqînîyê dijî û dihêne ser ziman. Dema ku em li jîyanê binerin û em hewl bidin û fahm bikin, emê bibênin ku jîyan, cewherê wê, her wusa, birastteqîniyekê heya. Ji xalekê, hertiştî destpêkiriya. Dema ku em bahse jîyanê bikin, emê ji wê xalê dest pê bikin û bi wê re di berdewama wê de afirîn û bûyîna jîyanê jî bênina ser ziman. Dema ku em vê rastiyê her wusa fahm nekin, emê nikaribin xwezaya xwe jî fahm bikin. Xweza ji ber çi afirîya û çawa afirîya û ji çi afirîya? Ev pirsên ku di temenê wan de rastteqîni bi têgihiştinî cih digirê. Mihemed, bawer dikir, ku çendî ku aqilê me mazin hebe û mazin bibe jî, divê ku em herê bikin, wê hertimî aqilek li ser aqilê me yê ku mazin bûya re jî wê hebe. Hemû aqilê me, piçek ji wî aqilê mazin a ku xwûdê di serê me de bi jîyanê re bicih kiriya.

Rastteqînî, her wusa, li gorî wê sê lingên wê yên ku divê ku mirov fahm bike hena. Yek, jîyan û rastîya ku jîyan jê çêbûya ya. Ya duyemin jî, pêşketina hundurîya wê ya bi jîyan û hemû benet, beşerî û jîyanîya wan û xwe domandina wan re ya. Ya sêyemin jî, pêşketina hizir û têgihiştina di derbarê wê de ya. Aqil, her wusa, di wê lingê wê yê sêyemin de ya. Lê aqil, wê bike ku me herdû lingên din jî fahm bikin û têbigihin. Têgihiştin jî, wê hin bi hin wê rastîya rastteqîniyê bi demê re bi me re bide fahm kirin û bi têgihiştin bide dîyarkirin û fahm kirin ku em êdî wê bi tememî fahm bikin. Li gorî wî, ji ber çi dem û dewran bûya? Li vir, hinekî jî, têkiliya wê, bi vê rastteqîniyê ve girêdayî ya. Hinekî jî, bi pêşketin û dirêj jîyandina me ve heya. Dem, dema ku em dijîn û demê di buhurênin, bi wê em wê fahm dikin. Her wusa bi wê re jî, dema ku têdigihin ku gerdûn, feze û dunya pêşketina û hena, bi wê re, êdî mirov wê baştir fahm bike.

Gerdûn, rastîyeka rastteqîniyê ya giştî ya. Mirov, rastîyaka rastteqîni ya di hundurê wê rastteqîniyê de ku dijî û heya ya. Dema ku em li wê heyîna wan binerin jî, em hinekî biwê heyîna wan re hizrekê di derbarê rastteqîniyê de tê bigihin û fahm bikin. Ji ber vê yekê, giringa ku mirov xwe bixwe jî fahm bike. Ku mirov rastîya mirov fahm kir, mirov wê êdî hinekî û ankû beşek ji wê rastîya têgihiştina rastteqîniyê fahm bike. Li vir, êdî mirov wê fahm bike ku hemû heyîn û hebûn, rastîyeka rastîya rastteqîniyê dihênin ser ziman bi xwe re.

Di vê temenê de, li gorî wê hertişt bi armanc û sedem bûya. Mirov, nikarê tiştekî bê wate şîrove bike û bêne ser ziman. Ji ber vê yekê, di serî de divê ku mirov hewl bide ku wan bi wan re fahm bike. Lê ew bi wan re fahm kirin jî, wê mirov bigihêne rastîya ku divê ku mirov wê fahm bike jî. Rastî bixwe jî, temenê wê li ser heyîn û hebûnê ya. Dema ku me li heyîn û hebûna nerî, emê hinekî jî ji rastiyê fahm bikin. Ji ber vê yekê, ew jî, wate û giringiya wan ya bi rastîya wan re heya. Rastî bi xwe jî, hinekî jî, rastteqîniya. Lê rastî, di jîyanê de bûna gelek. Ev jî tê çi wate yê? Ev jî, tê wê wateyê ku gelek rastî hena ku bi wan re rastteqîniyek dihê ser ziman û heya.

Aqil, li vir, dema ku em cihê wê bi vê gotinê re weke ku Mihemed dibînê ku em bixwezin bibînin, divê ku em wê afirînaka ji rastteqîniyê lê ku armanca wê di jîyanê de ku rastîyan bi me bide fahm kirin a. Lê di asta giştî de, armancaka aqil ya giştî heya ku hemû armancên wê yên ku bi dîtina rastiyên jîyanê ku kifş dike bi wan re yek bi yek bi demê re li dûv hevdû rêz dike û dike pêpelok û bi wê re jîyan li çûna li rastteqîniyê dide afirandin.

Her wusa, divê ku mirov rastiyê mazin fahm bikin. Her rastiyeka ku me kifşkir, ne tenê weke rastiyekê divê ku mirov bibîne, her wusa, divê ku mirov bi wê re hin peyamên ku di wan de hena ku divê ku em fahm bikin û di jîyane xwe de li gorî wan bi rê ve herîn jî na. Bi vê yekê, ew jî, wê li ser wan re êdî rewîsta jîyanê û ya mirov, û hwd wê biafir in û werina li holê ku mirov divê ku wan jî bibînine fahm bike û wan jî bide jîyankirin.

Divê ku mirov fahm bike ku rewîst, temenê pêşketina mirov ya olî jî ya. Ol ji ber çi hatina. Ji ber ku di nava mirovan de wê rewîstî pêş bixin û bidina domandin. Biwê re jî, rêya rast ya mirov bidina afirandin û pêşxistin û domandin. Ol, ne ew a ku tenê wê fahm bike ya. Divê ku mirov wê bijî ya. Dema ku mirov ew jîya hingî mirov wê rastîya wê fahm bike û bijî.

Li vir, di vê xalê de li gorî Mihemed, rastî ku çendî piçûk bê û mazin bê, farq nakê, lê dû aliyên wê hena. Aliyê, bi jîyankirinê re dihê fahm kirin. Aliyê din jî bi aqil dihê dîtin. Aqil, pêşketîya ku em wê aliyê ku bi aqil were dîtin bi wê bibînin û aliyê din ê ku wê bi wê were jîyandin jî bibînin û wê bijîn. Bi vê yekê re, aqil, karekî wê yê giring heya ku wê ahangê li vir di nava herdû aliyan de jî bi jîra xwe bide çê kirin.

Li gorî Mihemed, ´aqilê baş´ heya û ´aqilê xirab´ ku mirov ji rê derdixe heya. Li vir, ew jî bi çi tên û dibînin? Ew jî, dema ku em hemû aliyên rastîyê di dema ku em wê fahm bikin ku fahm nekin, dibê. Bi wê re jî, êdî mirov hemûyî fahm nekê û êdî mirov wê pêşî bikeve kêmesîyê de. Piştre jî, ku me ew jîya wê bibê xelatî. Yanî, lingekî kêmesî ku li pêşîya wê ya û xelatî û şaşî ya. Di vê temenê de, divê ku mirov êdî hewce pê bibîne ku divê ku mirov bi aqil fahm bike û ji hemû aliyan ve hewl bide ku fahm bike. Ku me ji hemû aliyan ve fahm bikir, hingî, emê xwe kirina kêmesîya û piştre xelatîyan dûr bikin.

Aqil, li gorî wî, nadê kifşkirin ku kîjan rast û kîjan ne rast a. Li gorî wî, aqil bêalî ya. Ya ku alîtîyê û ankû darazatîyê di aqil de diafirênê rengên aqil ku di hundurê wê weke raman pêş dikevin in.

Mihemed, di vê temenê de divê ku em bibêje ku pirr giringî dide fahmkirin û ´rast fahmkirin´ê. Ji bo wî, ya ku wê mirov ji hemû xirabiyan xilas bikira û di rêya rast de bide meşandin jî ev bû. Bi vê yekê, wî bixwe jî, di dema ku diaxift û di dema ku diket perwerdekirinê de, bi xwandavanên xwe re diket nîqaşan û danûstandinan de. Li ser gotinên wan re, ya rast û ankû ya xirab kifş dikir û bi wan re dide hizirkirin. Li ser wê re dixwest ku ew ´rastiyê rewa bikin´. Rewakirinê rastiyê´, weke gotinaka ku divê ku mirov li vir biteybetî bicih bike û hewl de ku wê fahm bike. Ji ber ku giringa û wate wê heya. Wate wê jî, her wusa di temenê rast û tam fahm kirinê de bi rastî û başî fahmkirinê dihê ser ziman.

Mihemed, ev yek, weke rêbazeka perwerdekirinê jî bikarhanîya di medreseya sor de. Wî li wir, di vê temenê de rêbaza danûstandinê bikarhanîya û bi wê re xwestya ku bide fahm kirin. Wî kiriya ku bide fahm bikirin. Li ser wê re jî, êdî daye fahm kirin. Wî, weke rêbazeka perwerdekirinê, wê pêşî, bide xwandin, piştre çi ji wê xwandinê hatîya fahm kirin wê êdî wê bipirsê. Li ser wê re jî, êdî wê hewl bide ku fahm bike ku çiqasî baş hatîya fahm kirin. Piştre jî, wê bi wê re li ser wê bisekinîya. Ku rast hatiba fahm kirin, êdî wê bigota ku rast hatîya fahm

kirin û êdî wê ji xwendavan bixwesta ku bi buhura asta din ya rewakirinê. Rewakirinê piştî fahmkirinê re dihat. ..

Fahm kirin û rewa kirin, du bêjeyên cuda bûn. Ya ku mirov fahm kiriî nayê wê wate ku me rewa kirîya. Lê ya ku mirov ew rewa kirî, mirov êdî ew hem fahm kiriya û hem jî rewa kiriya.

Li vir, dema ku em vê yekê hewl didin fahm bikin, em dizanin ku em hewl didin ku pergale perwerde ya ku Mihemed li Medreseya sor dabûbû rûnandin jî fahm dikin. ya rastî, ew a ku ev rêbaz, berî Mihemed jî di medreseyan û dergahên şêxan de bicihbûya. Lê mihemed, ev rêbaz bi aqil şiştîya û di medreseya Sor de bicih kiriya. Giringiyeka wê ya bi aqil li vir bi medreseya sor û Mihemed re heya.

Mihemed, di wê demê de li medreseya sor, di vê temenê de, wê perwerdekirinê bide kirin. Wê, bi salan êdî bi vê yekê û rêbazê bide fahm kirin. Lê ber jî, wê êdî binivîsêne. Wî, li medreseya sor, gelek berhemên giran bûha bicih kirina ku mirov wan hildina dest û bixwênin û ji wan aqilekî baş û rast fêr bibin.

Mihemed, yekî ku wê xwe di nava aqil û bi aqil xawr kiribû bû. Wî, xwe bixwe kiribû weke têgihiştinekê. Dema ku mirov li navê wî bixwe jî dihizirî, weke ku li têgihiştinekê û ankû li rastteqîniyekê bihizirê li mirov dihat. Di nava kurdan de, gotinaka ku bi navê wî re bûya yek heya. Ew gotin jî, gotinaka ku di nava xalkê de ya û li herêmî ya li herêmê botanê ya. Jin, dema ku ardê xwe kirina teştê û hevîrtin, piştre dibirina devê tanûran û li tanûrê pêve didan. Piştre wê nanê xwe bi wê pêvedanê bidest bixistan. Di wê demê de, dihat gotin ku "Hingî, ocaxa melayê Cizîrî xort a, ku jinekê hevîrê xwe biriba û ji dêla tanûrê li kêla wî bixista, wê ew hevîrê bipijaha ba û nanê wê çêbûba." Ev gotin, piştî wî re dihat gotin.

Ev, di gelek wateyanên giring û ên pîroz ku li navê wî dihat kirin de dihat gotin. Lê wateyek ji wan wateyan jî ew bû ku ew çendî bi zanebûn bû. Di temenê mazinbûna zanebûna wî de dihat gotin. Bi wê rengê, bahse wî û zanebûna wî dihat kirin.
Mihemed, di vê temenê de weke giringiyeka wî ya mazin, bi navê wî, bi têgihiştina wî re dinava xalkê de bi wê hatîya nasîn û bi cih bûya. Wî, di temenê dema nû de, aqil û têgihiştin afirand û di nava xalkê de bicih kir ku êdî mirov bi wî aqilî li gorî dema nû bi hizirê û rêya xwe pê bibîne. Ev yek, weke pêşketinaka wî ya mazin ya ku wî li gorî demê di nava civate xwe û bi giştî ku li herêmê daye rûnandin.

Mihemed, divê ku mirov bibêje ku wî dema aqil, da destpêkirin. Piştî wî re, kî weke zanist, zanyar û rewşenbîrên civatî hatin û ankû kî derket û

alîmtî kir di nava civate xwe de, ew aqilzani û aqilmendiya wî esas girt û li gorî wan refaransên wî di rêya xwe ya rast de meşî. Wî, refaransên dema aqil bi zanînê û têgihiştinê kifşkirin û danî ber mirovan. Bi wê yekê re, wî dem dabû bû dest pê kirin. Divê ku mirov bibêje ku ew destpêkeka giring di wê dema xwe de li kurdistanê û herêmê. ..
Ku mirov bi dema wî û pêşketina dema wî ya ku hatîyê de ku em wê bi rastî fahm nekin, emê bi tememî û bi rastî nikarin wî bixwe jî bi aqilîya wî re fahm bikin. Li vir, berî hertiştî, divê ku em demê kifş bikin. Piştî wî, re Feqiyê teyran, Ahmedê Xanî û hwd tên. Weke van, wê gelek zanist û zanyar û alim û rewşenbîrên civatê wê werin û herîn, wê hemû jî weke zanist, zanyar, alim û rewşenbîrên wê dema ku wî daye dest pêkirin bin.

Rewşenbîr, zanîna civate xwe diafirêne. Lê wê tenê nakê. Bi wê re jî, wê bi têgihiştinî rêya wê ya ku têre herê wê bide dîyar kirin. Ziman û têgihiştina ku wî pêşxistîya wê li ser civate wî, weke ku wê farz bibe. Ev ji bo her demê û her zanist, alim û rewşênbîrî jî wusa ya. Mihemed, di dema xwe de weke ku di têgihiştina vê yekê de bê, wî aqil pêşxistîya û bidemê re hanîya ser ziman.

Dema ku em bahse wî bikin, divê ku em bi teybetî bibêjê ku Mihemed, ev rastî bi civatê re kifş kiribûn. Wî civat, fahm kiribû. Li gorî wê tevdigerîya di hanî ser ziman. Dîroka civatê dizanî. Bi wê yekê re, wî xwestîya hiş û aqil bide afirandin bi mejûya wê re ji bo civatê.

Mejû, weke aliyekî giring ê civatî ya. Dema ku em wê nebînin û ne hênina ser ziman, emê nikaribin bi tememî civatê jî fahmbikin û bênina ser ziman. Bi wê yekê re, êdî divê ku mirov bibêje ku zanyarên ku dikarin civate xwe ji hemû aliyan ve fahm bikin û bênina ser ziman, ew in ku dîroka civate xwe û pêşketina civate xwe ya demên berê wê pirr baş ku dizanîn in. Li ser wê re êdî bi rastî dihênin ser ziman û dikarin gotinên ku ji pêşketina wê re bibina refarans êdî bênina ser ziman.
Mihemed, di wê demê de, di berhemên xwe yên ku wî bixwe û bi destê xwe nivîsandina, wî di wan de dîrok û demîn berê ên civatê bi zanîna wê hanîna ser ziman. Wî dîtîyaku heta ku van aliyan nebînî û fahm nekê, wê nikaribê, zanînê jî pêş bixe. Bi wê re dîtiya ku di temenê pêşketina zanînê de jî ev hena. Bi wê re jî, êdî heta ku jê hatîya wî kirîya di nava dîrokê û têgihiştina wê û zanîna wê de herêû fahm bike û bêne ser ziman û bide **fahm kirin**.

Mihemed, dema ku em i wateyekê bo wî lê bigerihin, divê ku mirov di serî de, bahse wê demî û bi wê re wî bike. Wl hingî, ew bi rastî were dîtin û li Ber me.

Mihemed, di wê demê de, li ser pewerdekirina wî ya li Mereseya sor re, divê ku mirov bibpirsê ku ka ji ber çi ew wilqasî hat nasîn û navê wê li herêmê derket li pêş? Du sedemên vê hebûn. Yek bi pêşketina demê re bû ku wê di temenê aqil û aqilzaniyê de ku li wir bicih kiribû û ewder yanî Medreseya sor, weke zankoyeka hemdem ya perwerdekirinê pêşxistibû. Sedema dûyam jî her wusa ew mêla ku bi demê re li aqil û pêşketina wê derdikeve bû. Mihemed, ev yek dîtîbû. Di dema ku ew li li Heskîfê, Amedm Sirrba û hwd jî bû, wî li wir, ne tenê kurdistanê her wusa, herêm jî bi gelek rengên wê yên din nas kiribû. Wî hemû cûreyên aqil û pêşketina wê bi rengên wê yên di jîyanê de dihatina ser ziman dîtibû û kifş kiribû.

De ne, divê ku ez bibêjim ku Li herema Reha ku ji sadsale 12´min ve bû, Şêx Teymîyê Herranî, hinek xwestibû ku derkeve dervî demê û xwestibû ku bêne ser ziman. Ew jî kurdekî ku ji wê herêmê bû. Wî bi dehan pirtûkên mazin ên stûr jî nivîsand. Wî hemû mijarên ku di demê de weke ên olî ku di nava "cîhad", "şarîat" û hwd jî di nav de xwestibû ku wan şîrove bike. Wî, Xwestibû ku şîroveyekê demî ji wan re pêş bixe. Lê ew zêde pêde neçûbû bû. Mihemed, li wê herêmê mabû bû û ew jî kifş kiribû. Ji ber çi ew pêde neçûbû bû û li çi aliqî bû, Mihemed ew didît. Ew jî, fahm kiribû.

Bi demê re Mihemed, xwestibû êdî derkeve ser hemûyan re. Wî, piştî hemû dît û xwand, piştre ya ew asta berê çibû, asta wê demê çi bû, wî ew dîtibû. Wî xwe derxistibû astaka ku dikarî li ser wê re lê dinerê. Êdî ji wê dera ku lê disekinî û dinerî, ji wir bidest hanîna li ser ziman. Di wê temenê de, dema ku wî hanî ser ziman êdî her ya ku wî hanî ser ziman, gav bi gav li pêşîya yên berî xwe û ên dema xwe bû. Wî, dibêt ku di dema xwe de xwestibû ku tenê bêne ser ziman. Lê ji devera ku wî lê dinerî, ya ku wî derxista ser hemûyan û mazintir kir jî ew bû.

Bi wê yekê re, divê demê de, êdî wî mazin hanî ser ziman. Piştî ku Vegerîya li Cizîra bota bixwe jî, êdî wî xwest ku wê asta xwe dêne li holê. Di serî de, wî xwest ku çi dizanê bi rêya perwerde kirinê bicih bike. Di vê temenê de, wî du rê weke xwe hanîna li ser ziman. Yek bi serekeyî nivîsandin a. Ya din jî, her wusa bi rêya perwerde kirinê ya. Di wê temenê de, êdî ew derket li pêş. Hizirkiirina wî û awayê, li gorî demê li pêş bû. Divê ku mirov bibêje ku li pêşîya dema xwe bû. Bi wê re jî, di wê temenê de, wî zankoyeka hizirkirina xwe û têgihiştina xwe ya ku di temenê aqil û aqilzaniyê de ku dihanî ser ziman afirand. Medreseya sor, bû zankoya wê têgihiştina wî ya ku di serê wî de. Wî, êdî li wir, xwe baş

dihanî ser ziman. Ji ber ku wî dît û fahm kir ku xwe baş dihanî ser ziman, êdî ew li wir bicih bû. Li wir, hem di nivîsand û hem jî perwerde dikir. Dem bi dem gerênên wî yên li herêmê dibûn. Lê ne li dûr dibûn û ne jî zêde dirêj dikirin. Heta ku ew çûya Medreseya miksê ya Mîr Hisêne welî jî dîtîya. Medreseya Werezûzê jî dîtîya. Ev herdû Medreseya giringiyeka wan ya pirr mazin hebû li herêmê. Bi teybetî, ya Werezûzê, ku pirr deman mela Hisêne bateyî lê maya û mirov perwerde kirina bûya. Medreseya Mîr Hisêne welî, JI aliyê Mîr Hisênê wel ve hatîya çêkirin ku bi xêra xwe û bavê û ku navê wan mayinda bibe bi wê. Mela Hisêne Bateyî, li wir jî maya û li wir jî, perwerde ya.

De ne, divê ku mirov bibêje ku Mela Hisêne bateyî, pirr hij perwerdekirinê dikir. BI aşqa xwûdê tişî bû. Wî, gelek pirtûk nivîsandina. Tenê di wê demê de dihat zanîn ku ser pênc berhemên wî yên ku pirr stûr bûna hebû. Li wir, bicih bûn. Ji van herdû medreseyan jî pirr alimên mazin derketin.

Mihemed, evder jî dîtîina. Wî, ew derên ku navê Mela Hisêne bateyî dihatina nasîn dîtina. Mela hisêne bateyî, li herêmê pirr gerîya bû. Wî, lingê xwe avêtibû pirr cih û warên ku bi teybetî li dora botanê bûn.

Lê Mêla Hisêne bateyî, tê gotin ku weke Mihemed û ankû seydeyê cizîrî û feqîyê teyran dirêj ne gerîya ya. Feqiyê Teyran, heta başûr û rojhilatê kurdistanê çûya û li wanderan jî demna xwe yên dirêj buhurandina. Piştre jî, ew vegerîya ya.

Lê Mihemed, piştî ku Hat û vegerîya li Cizîra bota, ew zêde êdî neçû geran, gerên ku ew çûyê de jî kin û ne zêde dirêj li herêmên li dorê bûn. Wî, li Medreseya sor, perwerde dide û bisadan û ji gotinan bi hezaran faqa û xwendavanên ku li ber destê wî dixwandin hebûn ku dixwendin. Mihemed, wê demê li medreseya sor, demek dabûbû destpê kirin. Ew dema aqil li kurdistan û bigiştî li herêmê bû. Li herêmê, weke du cihên ku weke dibistanên mazin li herêmê navdabûn hebû. Yek ´Azhar´ bû ya din jî her wusa medreseya sor bû.

Di dema Mihemed de, wê li herêmê û bi teybetî li Kurdistanê, wê medreseya sor bibe cihekî ku lê hertimî nîqaş û danûstandinên aqil û feslefe û her wusa olê ku lê dihat kirin bû. Bi vê yekê, divê ku mirov bibêje ku hemû têgihiştin ku li vir hatina ser ziman, wê ne tenê di pêşketina hizir û têgihiştina li kurdistanê rol û weyn bileyizin, her wusa wê li herêmê jî bandûra wan hebê. Wê bandûra wan di pêşketinên di îslemiyetê bixwe de jî wê hebin. Di kifşkirina îslemiyeta herêmê û ya kurdistanê û pêşketin û pêşxistina wê de, wê medreseya sor, roleka mazin

di pêşketina wê ya di dema aqil de bileyizê. Bi vê yekê û rengê, divê ku em vê jî bibêjin ku ji ya ku em dizanîn bêhtirî jî rol û weyneka medreseya sor heya û wê ew rol û weyn leyistîya.

Li vir, dema ku bahse medreseya sor bikin, divê ku em bi teybetî bahse wê rol û weyna wê bikin. Li kurdistanê, ew rol û weyna wê ya ku lêeyistiya, wê kifşkar bê. Wê piştre jî, bi hizrên ku têde hatina ser ziman û her wusa ên ku wê têde werina ser ziman, wê ew kifşkarî zêdetir û maztir bibe. Ew kifşkarî, di temenê aqilzanî û têgihiştina wê de, wê ne tenê li kurdistanê, her wusa bigiştî di cihane îslamê de li herêmê xwe bide dîyar kirin.

Mihemed, giringiya wî, di dema wî de tê dîtin û kifşkirin. Lê di aslê xwe de, piştî wî re, wê ew giringiya wî û bandûra wî bêhtirî were dîtin û hîskirin.

Mihemed, weke ku wî hanîya ser ziman, hizrên wî, wî piştre jî, bandûra wan bi pêşketinê re xwe bidina dîyar kirin. Divê ku ez vê gotinê binxatkim û bi teybetî bibêjim ku piştî Mihemed re her alim û zanyarê ku li herêmê derketiya, ya bi pirtûkekê û yan jî bi nivîsareka dirêj li ser vacê hizrên xwe bi hizrên xwe yên din re jî hanîna ser ziman. Li kurdistanê, piştî wî re, her zanistê ku piştre derketîya li holê, di vê temenê de aliyekî wan pêşketîya. Ya bi fîzîkê û gaometriyê re hin hizrên wî hatina ser ziman, yan bi vacê re hin hizrên wî û ankû berhemên wî yên ku wî nivîsandina bûna û yan jî di vê temenê de hin beşna din de bi vê rengê hanîna wan ya li ser ziman bûya.

Ev, bi teybetî, bandûra wê dema wî û hizrên wî yên biaqilzanî ku di wan de vac û têgihiştina wê ya jîyanî pirr li pêş bû, hebû. Bi vê yekê û rengê, divê ku mirov bibêje ku wî bi medreseya sor re, pergalek têgihiştinê ku heta roja me jî li gorî wê mazin û baş ne hatîya fahm kirin, wê afirandîya.

Dema aqil, çawa ku Mihemed fahmkiribû û bi hizratîya wê hizirî û aqilzaniya wê hanî ser ziman û xwest ku bide fahm kirin, bi wê re jî sazîtîya wê ya demî ku wê bi perwerdekirinê û hwd re ku wê çawa bê, bi medreseya sor re hanî û danî li holê. Bi vê yekê, dema ku em hizrên wî hildina li dest, divê ku em medreseya sor jî, weke aliyek û ankp şiqekî wan hizrên wî û aqilzaniya û aqilmendiya aqilîya wî jî bibîr bikin û bihasibênin. ..

Mihemed, di wê rojê de jî ew mazinatîya xw ebi aqilîya xwe û aqilzaniya xwe danîbû li holê. Di dema ku Bi mela Yusif û alimên din re ketibû danûstandinê û axiftinê de, ji wan re hizirna mazin ên ku ew

têgihiştîyê wan a, ji wan re hanîbû ser ziman. BI vê yekê û rengê, wî di wê demê de jî, hizrên xwe mazin hanîbû ser ziman. Piştî ku wan danûstandina xwe kir û piştre ku weke qadarekê di nava wan de ew danûstandin bi axiftinê doma bû, piştre jî, êdî weke ku navberek di nava xwe de dabûbûnê de. Êdî, weke ji jî dihat ku ew rabûbûna ser xwe û bi hin kirinna din ve jî çûbûban. ..

Di wê demê de, li dora wan jî, pirr xwendawan û faqiyên ku hebûn dihatin dîtin. Hinek jî li dora wan bi wan re rûniştî bûn. Lê di dema ku axiftin di nava wan de germ bûbû, ti kesek ne diçû û ne dihat. Herkesek, li cihê rûniştîbû û mirirî bû û bi wî mirirîbûnê êdî li wan dihisand. Bi wê mirirîbûnê, êdî weke ku ji xwe herê lê hatibû. Ji xwe wate gotina Mirirîbûnê jî, ew a ku di dema hisandinê bê û hwd, ku bi keve bin bandûreê de û hwd de bê û êdî ji xwe herê di hisandinê de. Lê ev rengê hisandinê, di temenê zanyarîya mirov de dihat ser ziman.

Mihemed û alimên din, bi hevdû re, di wê demê de weke demekê bi hevdû re diaxivin û didin û distênin û danûstandinên wan ddibin. Piştre jî, ku weke demekê axiftibûn bi hevdû re, ewê bi hevdû re rabin û êdî bi hevdû re herin û kare xwe bikin. di wê demê de, êdî dem dihat ber êvarî, di wê demê de êdî dema xwe karkirinê bû bi mêjê û dema wê. Piştre jî, wê çûbûban qasre mîrê bota. Ji ber ku wê li wir civate li dar ketiba weke her car û şevê. Di herdemê de jî, zanist rewşenbîr û alimên mazin li wê civatê lev dicivîyan. BI hevdû re diaxiftin û hizrên xwe ji hevdû re dihanîn ser ziman bi wê re jî didan berhevdû. Di nava zanistên civatê de, hertimî dayînaka wan ya li berhevdû hebû. BI hevdû re ku diaxiftin, wê hizrên xwe ji hevdû re bibêjin û devere ku tevlî nedibûn ji wê hizrê, êdî wê li ser hizrên xwe bihanîyan ser ziman û wê êdî bi wê re di nava axiftin, danûstandin û nîqaş bûba. Bi wê yekê, carna bi kêlîkan wê daban ber hevdû û axiftinên wan doma ba.

Mihemed, yekî ku ji nîqaşan xwe ti carî ne dide bi şûn ve. Ew zanebûna wî hebû û çi mijar jî dihat li holê ku li ser were axiftin, wî dikarê li ser wê hizrên xwe bênê ser ziman. Ew, xwediyê zanebûnaka mazin bû.

Li Cizîra bota, hertimî, nîqaşên bi aqil û zanebûnê dibin di nava alim, rewşenbîr û zanyarên civatê de. Car bi car, ji deverên dûr gelek alim û zanyar dihatin û dibûn mêhvan. Dema ku li wan civat ava dibû, wê êdî hem tişta ku wan ji xwe hanî ser ziman û hem jî tişta ku wan bihîstî ku dihanîn ser ziman û hwd, wê li ser axiftin û nîqaşna pirr germ wê di civatê de bi wan bûba. Ev jî, weke rewşeka ku dayimî ku di her civatê ku dibû bû.

Di civate de jî, mirovên weke Mihemed, hertimî cihê gotinê ê pêşî yê wan bû. Ji ber ku dema ku mijarek û ankû hizrek hat ser ziman hizra mirovên weke Mihemed dihat pirsîn. Heta ku ew pirsîna hizra wan û gotina wan jî, dibû sedema hizrekê ku êdî were pejirendin û ankû newê pejirendin. Her wusa, bandûra gotina wan hebû.

Di wê demê de jî, û di her demên berê de jî, Li cizîrê bota, dayimî mirovên alim û zanyar ên ku ji deverên dihatin hebûn û ew jî, bi pirranî li civate mirov dihatin mêhvan kirin. Êdî dema ku mêhvan hat, ji aliyê zanyar û alimên wir ve jî ku ne hatiban dîtin, weke ku ne dibû. Rast jî ne dihat dîtin.

Mihemed, Mela Yusif û alimên din ên li dora wan, êdî piştre ku rabûn, piştre berê xwe dane bi ber aliyê mizgevtê de. Li wir jî, hertimî dema kju mêj dihat kirin, ku mîr jî di nav de wê hema bêja pirranîya mirovan wê li wir ba. Kêm carna mîr ne dibû li wir. Ku gelek mêhvanên wî hatiban, rast ne dihat dîtin ku ew rabûba û çûba û civate xwe bitenê bihişta.

Mihemed, di wê demê de, bi serê xwe û bi aqilê xwe pirr diafirand. Piştî ku ew li medreseyê icih bûbû, êdî wî li wir heta wê dema ku ew nûha li wir bû, gelek berhemên nivîskî amede kiribûn. Hemû jî, li ser hizir û aqil û aqilzaniyê bûn. Wî, di wê warê de, zanîna pirr mazin ku di serê wî de hebû dirijand ser rûpel û didanî ber mirovan ku lê binerin û bixwênin.

Ew dema ku nû ku weke ku li Cizîra bota Mihemed û Medreseya sor pêşengtîya wê dikir, demeka aqil bû. Ew dem, êdî weke demeka bingihîn ku temenên xwe ku wê werin bû. Mihemed, Li ser navaroka aqil û zanînê dihizirî û jê ramanên ku diafirandin, bi wê êdî pêşketinek nû di nava civatê de li medreseya sor zankoya dema aqil a hemdem didanî li holê. Êdî di wê dema ku di her mijar û gotinê de aqil û aqilzani li pêşî bû, Mihemed weke zanyarê wê yê hemdem ku wê temenê wê pêşdixist bû.

Mihemed, mijarên aqil û hişmendiyê ên ku di demên berê de bûna mijare nakokî û dijberîyê, wî hewldida ku wan jî fahm bike. Bo vê yekê, wî pêşî weke ku di xwest ku hemû rastî û tiştên ku bi hizirkî hatina ser ziman, werina fahm kirin û li ser wê re êdî hizrên xwe bêne ser ziman. ..

----- ------

Civate kurd, êdî weke ku demek nû destpêkiribû û temenê wê jî bi pêşketinên weke ên li Medreseya sor re dihat avêtin. Ên ku diavêtin jî zanyarên weke Mihemed bûn. Wan jî, hizrên xwe êdî di temenê hizirkirinê de û di serî de bi lêgerînê û di temenê levkirina bi aqilzanî de dihanî ser ziman. Medreseya sor, ne medreseyeka ji rêzê weke yên berî

xwe bû.Teybetmendiya wê ya sereka ku ew dibistan û zankoya dema nû ya ku têde hiş diafirî û dihat ser ziman bû. Di wê de, hizrên nû dimeyîn. Bi wan hizran, êdî i pêşaroja xwe dihat nerîn.

Civatê ku em bahse wê û aqilmendîya wê bike, divê ku em pêşî dîroka wê hildina li dest û bi wê re awayê pêşketina wê ya civatê li berçav bigrin û hizrên wê yên ramanî û têgihiştinî bi jîrî bêne ser ziman. Ku mirov ev kir, mirov wê hingî, karibê ku di her demê de li gorî demê hizrekê biafirêne û bêne ser ziman.

Mihemed, ev yek dikir. Wî dîrok û civatîtîya civate xwe dîtibû û fahm kiribû û biwê re têgihiştinek li ser deme û civatîya demê re diafirand û dihanî ser ziman. Ku em bahse destpêka nû ya di temenê dema hemdemîyê de bikin, divê ku em weke dema pêşî ku temen bi wan re tê avêtin, divê ku em bahse mirovên weke Êlî Herîrî û Ebûlîzê Cizîrî bikin. Piştre jî, weke dema nû ku em bahse bikin ku li ser wê re pêş dikeve, divê ku em bahse dema Mihemed bikin ku wî temenê wê yê hizrî û ramanî avêt û afirand û piştre pêşketina wê bi zanyarên civatî û alimên civatî ên weke Feqîyê teyran û Ahmedê Xanî û hwd ku xwe da domandin.

Ev xate ku em bahse wê dikin, bi teybetî li ser mejî û hiş û raman û zanînê re dimeşêt. Yanî, êdî ne demeka ku hê ji nû ve hizir tê afirandin a. Hizrên ku berê hatina ser ziman jî, li gorî demê hatina şîrove kirin. Mihemed, bi gotinan her wusa, hertimî di berhemên xwe bal kişandîya ser hizrên berê ku daraza xwe ya têgihiştinî bi wê re hanîya ser ziman. Ev çi dide nîşandin? Û ankû, divê ku em çi ji vê fahm bikin? Yanî, xate pêşketinê bi aqil û hişmendiyê afirîya û di wê temenê de, êdî meşîn heya. Li ser wê re jî, ya rast û ya ne rast ku tê dîtin çi ya, ew jî dihê ser ziman. Li ser wê re êdî daraza xwe dihêne ser ziman. Dema ku li ser hizrekê daraz hat hanîn li ser ziman, ev tê wê wateyê ku serdestîya wî li wê hizrê û ankû têgihiştina ku hatî ser ziman û heya êdî heya û wî fahm kiriya û êdî li ser wê fahmkirinê re êdî ew hizra xwe dihêne ser ziman.

Mihemed, hata ku fahm nekê, ew daraza xwe nayêne ser ziman. Piştî ku fahm kir, ew daraza xwe dihêne ser ziman. Bi vê yekê, êdî wî tişta ku fahm kiriya bi gotinekê bê, wî hanîya ser ziman û daye nîşandin ku wî çi jê fahm kiriya û çiya ew. ..

Bi vê yekê û rengê, dema ku em bahse wî hizra wî dikin, divê ku em bênina ser ziman, em di çerçoveyekê de hizreka ku bi tememî hatî ser ziman û êdî dikarê refaransên jîyanê ku mirov bo pêşarojê jê derxe û bi

wê re bibe xwediyê nerînê wî afirandîya. Wî, pêşavanîya demekê bi aqil kir û ew dem temenê wê afirand û bi têgihiştin kir û da dest pê kirin.

Mihemed, wê li Medreseya sor bê. Wê hê gelek salên din wî li wir bê û wê bi dehan berhemên wî yên ku wê binivîsêne wê hebin. Wê wan li medreseya sor binivîsêne û wê wan li wir bicih bike. Medreseya sor zankoya dema hemdem a. Êdî, wl dem bi dem, ew pêşketina bi medreseya sor re ku wî dabû dest pê kirin, wê pêşketina xwe bi pêşveçûna xwe re bijîya û wê dem bi dem xwe ji nû ve bi afiranda. Dema aqil ku Mihemed lê dihizirî jî ev bû.

Mihemed, wê bi tememî, ji xaynî nivîsarê û helbestên wî yên ku wî nivîsandin û di aqilan de mana û ji wê hizra wî na, wê ne bin 43 berheman û ankû pirtûkan re wê binivîsêne û wê bike temenê pêşketina dema xwe de. Mihemed û ankû bi navê wî yê ku êdî wî bi zanyarîya xwe bidest xistîya seydeyê Cizîrî, wê bi hizrên xwe re bê destpêkek li kurdistanê û li herêmê jî li demên piştî xwe re jî.

Divê ku em vê jî bibêjin ku wê hê jî were ser ziman bi Mihemed û navê Mihemed re. Wê bi Wî û jîyangerî û zanist û zanyarî û rewşenbîrî û alimîya wî ya mazin re wê were ser ser ziman. ..

.

**Kurdistan,, cizirabota, Abdusamet yigit,**

**Pirtûk di sale 2002an de hatiya bi navî kirin ji aliyê nivîskar ve**

.